

navero

SERGOTAR

Editor.....2

SEYDAYÊ CEGERXWÎN: XANÎ

Arjen ARÎ.....3

HER ZIMANEK ÎNSANEK E

Evdile KOÇER.....5

QEDERA DERENG MAYÎ

Amed Ç. JIYAN.....6

DI GOTINÊN PÊŞIYAN DE AGIR

Kovara W.....7

MEYMANÊ XWEDIYÊ MALÊ

Dilawer ZERAQ.....8

CEGERXWÎN TARÎXÊK E

Hevpeyvîn: Enîse ŞÎRÎN - Azad ZAL.....10

HELBEST MAR E, DEVÊ WÎ LI BER DILÊ MIN E

Hevpeyvîn: Fatma SAVCI.....49

MÊRIKÊ LAL

Sherwood ANDERSON.....51

PISÎKÊN ADARÊ

Şêxmûs SEFER.....52

AGOS

Arjen ARÎ.....53

SIRGÛNA ÇAVA

Muslum ASLAN.....55

VEQETÎN

Rûheya.....56

HIN RÊZIKÊN EVÎNIYÊ

Gernas RODERÎN.....58

GULDESTEYÊK JI HELBESTÊN FEDWA GÊLANÎ

Fedwa GÊLANÎ.....59

DILNAZ

Sîpan XIZAN.....63

OSMAN ESAD EFENDÎ Û MEWLIDÊ CIYO DIMILÎ

Prz. Mehmet GUZELER.....64

dosye

DOSYE – EREBÊ ŞEMO

Amadekar: Enîse ŞÎRÎN - Azad ZAL.....15

HÎMDARÊ EDEBIYATA KURDÎ YÊ EWILÎN NIVÎSKARÊ EYAN BAVÊ ROMANA KURDÎ

Eskerê BOYÎK.....17

MILETEK DI HEYRA WÎ DE BÛ

Xelîlê ÇAÇAN.....27

EREBÊ ŞEMO RÛSPÎTIYA GELÊ KURD

Têmûrê XELÎL.....29

HEVPEYVÎNA BI EREBÊ ŞEMO RE YA BERÎ 25 SALAN

Bavê NAZÊ.....31

NIVÎSKARÊ KURD, KEDKAR Û SUXRE-VANÊ WÊJEYA KURDÎ EREBÊ ŞEMO

Zeynel Abidin ZINAR.....33

JI ALIYÊ TEKNÎKA ROMANÊ VE ‘DİMDİM’ Û EREBÊ ŞEMO

Edîp POLAT.....37

PIRÊN ŞKESTÎ Û ÎZOLASYONA GEWR

Cihan ROJ.....39

KESAYETIYA EDEBÎ YA EREBÊ ŞEMO

Ayhan MERETOWAR.....41

HER EW HESRET Û EW XWEZÎ

Serwet DENÎZ.....43

JI ŞIVANTIYÊ BER BI ZANYARIYÊ VE

Abdurahman BAQIR.....47



Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê
Kovara Dumehane
Hejmar 15
Tîrmeh-Gelawêj 2007

Xwedî & Berpirsiyariya Nivîsaran:

Semra OZBEY

Editor:

Enîse ŞÎRÎN - Azad ZAL

Sereraştîkirin:

Semra OZBEY - Serwet DENÎZ

Mizanpaj & Berg

Azad ZAL - Miran JANBAR

Şewirmendê Hiqûqê:

Av. Muharrem Erbey

Çapxane:

Berdan

Navnîşan:

Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri

DIYARBAKIR

Tîf:

(0412) 237 43 16

E-Mail:

kovaraw@yahoo.com

kovarawe@hotmail.com

WEB:

www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 20 YTL

Welatên Dereke, salek: 60 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:

Semra OZBEY

Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir

YTL: 8300 195 27 89

EURO: 8300 071 16 47

USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:

Semra Ozbey - 5426215

Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li wxediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji Edîtor...

Xwendevanên Hêja,

Em bextewar in ku bi hejmareke nû derketine pêşberî we. Me ev hejmar di pêvajoyeke ku pêkutiyên li ser zimanê kurdî zêde dibin de weşand. Em ji niha ve dibêjin, rewş çiqas giran be û hîna jî ji qumaşî re xerîdar tune be jî em ê kar û xebata wêje û zimanê kurdî her bimeşînin.

Dîsa em careke din hem wek kovara Wyê hem jî wek Enstîtuya Kurdî ya Amedê piştgiiriya xwe ya bi rêzdar Abdullah Demîrbaş re diyar dikin. Û jî ber xebatên ku kiriye wî pîroz dikin. Bi baweriya me piştgirîdayîn tenê bi daxuyanî û çepikan pêk nayê. Piştgiiriya herî mezin domandina heman karî ye.

Xwendevanên Hêja,

Wek ku hûn jî dizanin di wêje û wêjevanîyê de kes û berhemên ku li hember demê li ber xwe didin û bi tu awayî jî hêjayiya xwe tiştêkî wînda nakin; kes û kom ji vanan re dibêjin klasîk. Ew her dijîn û xwînê didin rehên dîroka li ber windabûnê. Loma jî kes û berhemên bi vî rengî bi herikîna demê re kevn nabin û her tim nûjeniya xwe diparêz in. Ew kesên ku bi kesayetî û berhemên xwe afirînerên nûjeniya dema xwe bûn her û her pêşengiyê ji nûjeniya li dû xwe re jî dikin. Êm kurd jî xwediyê berhem û kesên bi vî rengî ne. Lê li gorî girîngiya wan me rûmeta wan hîna jî bilind nekiriye. Tevî vê yekê jî ew roniyê didin rêya me.

Afirîneriya pêşîn her wext xweser e û xwediyê xwenûkirinê ye. Bi hejmara 15'emîn me xwest ku em dîsa afirînerêkî ku li hember heyaman têk neçûye û her dem ji bo pêşveçûna romana kurdî bûye rêber, bi bîr binin. Romanûsê yekem û bêhempa ku wek 'Bavê Romana Kurdî' tê nasîn Erebe Şemo, di vê hejmarê de wê bibe mêvanê we. Erêbê Şemo ne tenê bi Romanûsiya xwe bi kesayetîya xwe ya têkoşer jî balê dikişîne ser xwe. Me di vê dosyaya ku em ê pêşkêşî we bikin de romanûsê qedirbilind Erebe Şemo ji gelek alîyan ve girtiye dest. Bê guman der heqê jiyan û kesayetîya romanûsekî wek Erebe Şemo de ne dosyayek, ne kovarek û ne jî pirtûkekê têr dike. Lê me jî bi alîkariya wêjehez û nivîskarên delal bi qasî ku me bi dest xist, agahî û romanûsiya wî ji hev veçirand û pêşkêşî we kir. Em bawer in ku ji bo wêjevanên kurd ên ku nûnerên heyama xwe ne divê di nav rûpelên dîrokê de nemînin, bîr bibîranîn û ji nîfşên nû re bîr ragihandin. Jiyan û romanûsiya pêşevanê romana kurdî Erebe Şemo ji aliyê Eskerê Boyîk, Xelîlê Çaçan, Tîmûrê Xelîl, Bavê Nazê, Zeynel Abidîn Zinar, Ayhan Mere-towar, Serwet Denîz, Edîp Polat, Cîhan Roj û Abdurahman Bakir ve ji gelek alîyan ve hatiye veçirandin. Hêviya me ew e ku me bi vê dosyayê afirînerê bêhempa, romanûsê pêşeng Erebe Şemo baş bi we dabe nasîn. Ji bilî dosyayê, Wyê derî ji helbest, hevpeyvîn, pexşan, wergêr û çîrokên rengîn re jî vekiriye. Em bawer in ku wê her beşek ji aliyekî ve we têr bike.

Ji bo hejmara 16'emîn jî wekî dosye em ê Seydayê Tîrêj û ciyê wî di wêjeya kurdî de bigirin dest. Kesên ku bixwazin dikarin nêrîn, nirxandin û lêkolînên xwe yên der barê Seydayê Tîrêj de ji me re bişînin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de...

Seydayê Cegerxwîn: Xanî

Arjen ARÎ

Malik bi malik duaya serê sibehê; xurînşikêniya min î spêde spêde, firavîna navrojê; dojecha ku pêti bi pêti min disoje, bihuştta ku bi kurmancî fermanê li dil radike; ji “estefxara” min a berî razanê:

*Ger dê hebûya me jî xwedanek
Alîkeremek, latîfedanek
Îlm û huner û kemal û îzan
Şêr û xezel û kîtab û dîwan
Ev cîns bibûya li ba wî mamûl
Ev neqd-î biba li nik vî meqbûl
Min dê a’lema kelamê mewzûn(1)
Alî bikira li banê gerdûn!*

.....
.....
*Çi’bkim ku qewî kesade bazar
Nîn in jî qumaşê ra xerîdar
Ger ilmê temam bidî bi polek
Bîfroşî tu hikmetê bi solek
Sifrê xweyê xef me eşkere kir
Qirtasiye bû me li lê dua kir*

.....
.....
*Kurmancî ye sifr e, bê guman e
Zêr nîn e, bibên sipîde mane
Neqdê me bêje kêmbuha ye
Bê sîkkeyê şahê şehrewa ye(2)*

Li bazara ku ‘hîkmet’ bi solek; û ilm lê bi ‘polek’ê; û ‘xelaya’ kirîne rabibe li ‘muşteriyên’ qumaşê/cawê kurmancî ; xwediyekî xwedanferaset û kerem-bala, ku zanîn û huner û şîr û xezel li ber dilê wî meqbûl/hêja peyda bibûya; me yê ala kelama/peyva mewzûn (ya bi vî zimanî) li ser banê gerdûn li cihê herî berz biçikanda...

Lê... ka?!

Di ‘sûk’ û bazara’ îro de jî gilî û gazincên 312 sal berî niha ku Xanî kirine, heman gilî û gazincên şair û niviskarên kurdî yên hemdem in.

Îro jî - ji bilî çend kesên ku bi navê pêşdebirin û geşkirina ziman û wêjeya kurdî destek û alîkariya diravî ji saziyên dewletên Rojavayî werdigirin- şair û nûser û ehlê huner bi helwesteke Xanî’yane, ji ‘sifrê’ kurmanciya sor bi hosteyî û hunera zêringerekî; dixwazin neqdê kêmbuha yê berhemên bi vî zimanî bikin bi “buhayê sîkkeyê şahê şehrewa”.

Şahên Şehrewa; ku duh mîr bûn paşe û beg bûn û ne bûn siltan, ne bûn şah; û nekarîn xawêntî/xwedîtiyê li peyva mewzûn bikin, îro jî di nava sînorên heman helwest û ferasetê de ne: Di qorê pêş de siyaseta kurd, li rex siyasetê serkêşên bizavên sîvil, komeleyên çandî û hunerî, ku serok û rêveberî bi xwe nikare xwe ‘baş’ îfade bike bi zimanê ku temsîl dîkin; û... bi wan re sîk û sikak û gund û bajar... û kit kit mal û malbatên kurd.

Zimanê ku demekê yê ‘a’mê/xelkê bû, di gel bêxawentiya ‘sahibkerem û suxen-nuwazan’ bi destê afirîneriya behremend xet bi xet, çarîn bi çarîn dîwan bi dîwan di qada wêjeyê de hate hildan:

Bi destê Uryanê uryan, Feqiyê feqiyar, Melayê melayan û Koyiyê xakkohistan û Hejar û Hemîn û Mukriyan...û Telebaniyê Şêxê şêxan...

Lê; ji nava ev qas û ev çend rûmetdaran kî hêjatir e? Nîqaş ne heddê min e, lê belê; Ehmed Huseynî bi navê Mela re bi cizbê dikeve! Qutba Rênas Jiyan kî ye, hêj ne eyan e. Îrfan Amîda ta niha mukir nehatiye li xwe. Lal Laleş, jixwe dibêje ez lal im, heyran! Kawa Nemir her Goran digorîne! Ez dibêjim, hebe nebe Cegerxwîn- baş e ku ne Hesarî me-

Her helbestkar bi qasî xwe -ne hinekî; tîberekî- ji “kutika/şecereya” yên berî xwe ye. Û her helbestkar heta ku qeyd û merbedên hesinî yên helbestkariya helbestkarên berî xwe nikaribe biqurifîne û birizîne, nikare bibe

xwediyê nasnameya helbesta xwe! Jixwe, helbestkariya ku di destpêkê de bo helbestkarê “naşî” hêsa û ji rêzê dixuye, her ku diçe cih li helbestkariya wî teng dike.

Ev cihtengayî roj bi roj dibe tengijandina bi destxistina nasnemaya helbest û helbestkariyê. Di şîira Dîwanê de her helbestkar bi sînorên şêwazî, têngînên hevbeş, qalibên yekpîvan dorpêçkirî ye.

Lê di ya serbixwe de?

Wek nimûne ji helbestên Hesarî em tê derdixin;

*Miletê kurd tu şiyar nabî heta kengê ne bes
Ê nexweş wa li dinê her tu tenê maye ne bes*

.....

*Şûrê Şêrgoh gurzê Ristem ger li meydan bêne der
Dê di bin lingên te dijmin, her bîmînî wek teres
Ey Cegerxwîn Ehmedê Xanî bi naqosa mezin
Kurd nekir hişyar, bo çi wer dinalî wek ceres⁽²⁾*

Ku bi her delîveya Xanî yad dike û tîne bîra xwendevanê xwe jî.

Ceres: zingilê devê derî ye. Bi qasî ku xwestiye kit kit li deriyê her kurdî bide bi ristên helbesta xwe, Seyda banga xwe li gel “naqosa mezin” ya Xanî dişibîne “ceres”ê devê derî.

Çendî bihna “poşmaniyekê” bifûre jî ji nava malikên xezela li jor; Seydayê “evîn” û “birînê” Cegerxwîn, di helbesteke xwe de dîsa Mem û Zîn û Xanî dixê nava malikan:

.....

*Bê leşker û top û ceng û lêdan
Bê şah û sera û tac û eywan
Bê zor û dirav û bext û xame
Ev bûk e bi her kesî heram e
Kengê ji dîbaceya Mem û Zîn
Xweştir tu dibêjî, bes Cegerxwîn⁽³⁾*

Seyda der barê hişyarkirina kurd de ‘lomeyê’ jî xwe û xwendevan dike, ku dibêje, “Tu çendî bibêjî bibêj, tu yê ji ‘dîbace’ ya di Mem û Zîn de ji banga Xanî spehîtir û xweştir nikaribî bibêjî.”

Di gel vê “dudilîtî” û bêemeliya ku li Seyda

peyda dibe, ew dîsa bi gir û înadeke bi xwe bawer, weke ku bixwaze bi ‘erka’ xwe rabe, di benedê helbesteke din de li gel Hejar û Mela û Feqî... navê Xanî derdixe pêş:

.....

*Yekî di heye rêberê kurd e Xanî
Di xoşxwanê de Fîrdewsê sanî
Ma ne bes e Nûbar û Mem û Zîn
Gazî dikî bi zarê şêrîn û qîrîn⁽⁴⁾*

.....

Digel ku di ristên li jor de dengê xwe li gel yê Xanî mîna “ceresê” ditibû; êdî gaziya Xanî wek ‘qîrîna bi zimanê şîrîn’ dibîne. Ji rist û malik û çarînên Xanî û Cegerxwîn, ku berawerdkirinek pêwîst be:

Kela dengê Xanî, keleke ji bin ve ye; ji xemgîniya bêxweditiyê dertê û bi xwe bawer berê xwe dide geliyên dewr û zemanan...

Ev dengê ku hê jî bêrawestan bi her malikê re digihe guh û bi guh re hest û hîzr û bîra mirov “dixulxulîne” û di rihê mirov de olan dide; kêl bi kêl -lê ne bi şêlên gir; di hev de, qunderz-hişmendiya neteweyî bo îro/sibe/û dahatûyê bi hestên kes ve didirû.

Cegerxwîn ligel ku ji navên pir-rûmetdar yê berî berî xwe xwe haydar e; ji nava wê ‘komê’ Xanî ji xwe re dike rêber û xwe wekî suxteyê wî dibîne:

.....

*Ne pêxemberên me ne Mezdek û Manî
Yek rêberê me heye Seydayê Xanî
Seyda ye, suxteyê wî her Cegerxwîn
Li nav kurda ye, lê wek cihayê bê dîn!⁽³⁾*

Cihayê/gihayê/geyayê bê dîn? “Her geya li ser koka şîn tê” dihat, dê bê. Geyayê hewşê tehl bû! Zelindar be jî; bila li ‘hewşê’ û ji ‘hewşê’ be.

Têbînî:

(1) Di vê ristê a’lem/al/bayreq ‘elem’ e, min sererast kir.

(2) Ehmedê Xanî, Wş.Hasat, rp.62

(3) Agir û Prisk, Cegerxwîn, Wş.Avesta, rp.60, 30, 59

(4) Sewra Azadî, Wş.Avesta, rp.151

e-mail: arjenari99@yahoo.com

“Her Zimanek Însanek e!”

Evdile KOÇER

Dema ku kurdekî me yê dilşêrînok pozê xwe piçekî hildide û wekî fîlozofekî rojhilatî dibêje, “Her zimanek insanek e!” kêfa min tê û ez ji xwe re dibêjim qey camêr li ber koxikê zimanzanan kon vedaye: ji milekî ve fêrî sê çar zimanan dibe, li aliyê din ve jî hemû zimanên dinyayê mîna bîbokên xwe diparêze!

Lê gava ku ez dibînim wê gotinê bi xwe jî nikare bi zimanê xwe vebêje, ew çîroka kewê tê ber çavê min ku jê re dibêjin, “me te li jor jî dîtîye û li jêr jî!”

Ez vê gotinê ne bi tenê ji kesên ‘gundî’ her wiha gelek caran bi wê teorî-badana xwe ve ji devê kesên ‘xwende’ jî seh dikim.

Vêca ez ji xwe re dimînim heyîrî: Heke meriv dev ji zimanê xwe berde û xwedêgiravî bixwaze zimanekî din biparêze (!), gelo meriv dibe insanekî/e baştir?!

An jî heke ‘her zimanek insanek’ be, gelo yên ku dibin Ezraîlê zimanê xwe haşayî ji birakên min heywanan nexwe dibin ‘heywan’?!

Bi xêra hin fikrên jakoben û pînekirî yên ku wekî bayê payîzê di kulekê re dikevin hundir, gelek gotin û têgehên gilover û qelew ketine devê civaka me; serê her danê mîna sloganeke germ tînin dikevin ser sifreya me.

Civak bêyî ku li ser kûrahiya wan gotinan bifikire, bêyî ku sloganên li ser wan gotinan biterişîne wekî benîştên biharê serê her kêliyê di devê xwe re dipeqîne.

Ew gotinên qelew ên ku serdestan qibleya wan a rast di hişê me de guherandine dihêle ku em

hem ji ‘dêr û mizgeft’ a xwe bibin û hem jî terka dîwana gotinên xwe yên dilbijok bikin.

Di civakekê de dema ku her kes behsa ‘çeçqeçok’ê bike; helbet gelek zor e ku meriv jî bikaribe qala aşê gotin û têgehên xweşik bike.

Çaxê ku meriv dêna xwe bidê, dê bête dîtînin kesên ku dibêjin; “Her zimanek insanek e!” yan zimanê xwe di devê xwe de mirandine yan jî zimanekî din li ber wê kêliya kêfa xwe qedexe kirine; -dibe ku ev ziman tirkî û tirkmenî be jî, an jî wekî zaravayekê zazakî û soranî be!- ev ‘demokrasî’ya xwebixwe hema bibêje li ber hewşa gelek rojhilatîyan bûye fenomenek!

Min bi xwe bi gelek zimanzan û kesên ku bi du sê zimanan dizanin re sohbet kiriye, me bi hev re aşê zimanên dilciwan gerandine; min nedîtîye ku hema bi henekî jî gotine; “Her zimanek insanek e!” Her çiqas ku felsefeya vê gotinê gelekî kûr be jî, lê bêyî ku ji xwe re bixin sloganeke pûç pê re dijîn.

Lê ev gotin li ba me kurdan dibe pêkenokeke pîr ecêb: Tu dibêji qey her kurdê/a ku asîmîle dibe bi xêra gotineke wisa xwe li dereweke bêreng dipêçe; tu dibêji qey hema her kesê/a ku zimanê xwe ji bîr dike, weke karekî insanî diçe vê gotinê ji ber dike; “Her zimanek insanek e!”

Ya Rebî bê lome!!!

Gotinên wisa, dema ku wekî şeht û lalan bikeve devê civakekê, hingê dibe “elametê qiyamet” a çand û hunera wê jî.

Ji ber ku civaka me ji ‘ta û derzî’ya xwe bigire heta ‘henek û genek’ên xwe ji her tiştê xwe bûye; rih û hebûna wê mîna miriyên şilftazî di şiveriyên serdestan re li qedera xwe digere.

Heke em vegerin ser kaniya serdestên xwe, dê bête dîtînin ku her tiştê me -heta gotinên ku dikevin devê me jî!- bi destê wan têtê şelokirin.

Şelokirina serdestan di devê me de dibe ‘çeçqeçok’ û em ji bîr dikin ku behsa ‘aşê bikin; ji ber vê yekê ye ku ‘şam û mişar’ a kurdî jî nayê bîra me!

Loma, “Her zimanek insanek e!” ji rihê civaka me re dibe nanekî germ.

evdilekocer@yahoo.com

Qedera Derengmayî

Amed Ç. JIYAN

Dema ku çavên xwe vekirin, li daristanekê, di bin darekê de, di nava hêşînahiyê de, serpiştîkirî dirêj kirî bû. Çavên wî li ezmên bûn. Di jiyana xwe de gelek cî û war dîtibûn lê heya niha tu carî nebûbû şahidê ezmanekî ew çend rengbedew. Ne li Stenbola zaroktiya xwe ne jî li Midyada bav û kalên xwe, li tu bajarekî din ezmanekî ew çend rengbedew nedîtibû. Ezmanê bêsînor li hin ciyan di rengê şîneke tarî de bû û tarîtiya şîna wê ber bi rojhilatê ve tevî sorekî di rengê sorê şeraba Midyadî dibû. Ronahî û tarî di nava şerekî ku encama wê diyar bû de bûn. Piştî çend deqîqeyan tarî dê tîk biçûya û ronahî bibûya serdest heya ku berê êvarê hêza xwe winda bike.

Wekî ku bi şevan û rojan kevir kilandibe, xwe gelek bêhêz his dikir. Rojên stareyê hatin bîra wî. Carinan wî û hevalên xwe, piştî ku li hewşa paşîya qesra pêncqat a bi fersên spî hatibû lêkirin bi boneya di dahatûyê de bi hêz bin dixebitîn û tîr diwestiyan, li nêzî dîwarê rojhilatê hewşê, wekî niha, xwe li bin darên hewşê dirêj dikirin. “Rabin!” Bi dengê mamoste Meqsî her yek bi derekî ve dibezîya û xwe ji mamosteyê xwe yê kal vedişartin. Çend caran di bin dara ku xwe lê vedişart de ketibû xewê û bi bayê hênîk ê destê sibehê ji xew hişyar bûbû.

Ji hêla çemê Dîcleyê bayekî hênîk di navbera spîndaran de dihat û xuşîni bi giya û pelên daran dixist. Xuşîniya giya û pelên daran tevî ya çem dibû û wekî ku serkeftina ronahiyê pîroz bikin, giya û kulîlkan bêhnên xwe yên xweşik, di bin rengê bedew ê ezmên de radestî bayê dikirin û bê, bêhna giya û kulîlkan tevî hewayeke sar, li der û dorê belav dikir. Çûkên

li ser çiqilên daran jî xwe ji pîrozkirina serkeftina ronahiyê bêpar nedihîştin; çûk li ser çiqilên daran wekî leşkerên li benda serfermandarê xwe, rêz bûbûn û bi serxweşiya rengê bedew ê ezmên û bêhna giya û kulîlkan, pirtikên xwe tev didan û dest bi strana xwe ya destê sibê dikirin. Ji çar aliyê ve çiçekîka çûkan dihat. Çiçekîka çûkan a ku guhên wî tije dikirin, mêjiyê wî wekî dengê kemanê xerabe diwerimand.

Hewşa ku bi darên xwe yên hewrê dişibiya daristanekê, bi riyeke ku wekî tîlên kemanê rast bû, bûbû du par. Li her du aliyên rê, seranser lale hatibûn çandin. Rê ji deriyê tîketinê yê hewşê dest pê dikir û li ber hewza mermerîn a rayên wê şîn a li ber derenceyên fireh ên qesrê, bi dawî dibû. Her roj piştî firavîniyê bi gurîniyekê ji derenceyan ber bi hewzê ve dibezîyan û li wir li dora mamosteyê xwe dicivîyan. Digel şîrîniya ava hewzê, xuşîniya pelên daran û çiçekîka çûkên li ser daran ên ji bêhna laleyan serxweş bûbûn, bi yekdengî lawîj dixwendin. Ma senfoniya herî xweşik a cîhanê ne çiçekîka çûkan, xuşîniya pelên daran û xuşexuşa avê ye?

Her ku çûk wekî ku li ber newaya senfoniye dans bikin, xwe ji çiqilekî ber bi çiqilekî din ve çeng dikirin, xunava li ser pelan wekî dilopên ji ava hewzê dipekiyan, bi ser rû û laşê wî de dibariyan. Dilopên xunavê wekî gezên moriyan tevzîni bi rû û destên wî dixistin. Kir ku bi destê xwe yê tevîzî rûyê xwe ji xunavê paqij bike, lê nebû. Milê wî yê tevîzî wekî milê peykerekî ji betonê, giran bûbû û nikaribû xwe tev bide. Dema ku hêz da xwe da ku rabe ser piyan, êşeke dijwar, wekî xencereke ko, xwe di pişta wî de da hiskirin. Bi êşa pişta xwe ji bandora sêra rengê bedew a ezmên û serxweşiya bêhna xweş a giya û kulîlkan derket; rojên zarokatiyê yên ku wekî filimekî di mêjiyê wî de zindî dibûn, mîna giloka heriya ku bikeve nava avê ji hev pelişîn û ji ber çavan winda bûn. Li der û dora xwe nihêrî. Mêjiyê wî bi pirsên bê bersiv tije bû. Di nava mêjiyê wî de zingilan lê dixist. Di her çirkeyeke ku derbas dibû de êşa pişta wî dijiwartir dibû û roja ku hinekî din bilind dibû, zêdetir ronahî dida ser rûyê erdê. Rojê ji lingên wî dest pê dikir û hêdî hêdî ronahî dida ser laşê wî. Her ku roj bi ser laşê wî de belav dibû, diqefilî. Tîrêjên rojê, di nava pelên daran de xwe gihandin laşê wî yê şil û çavên wî yên ku êdî nema rengên cîhanê arasteyî

mêjiyê wî dikirin, bi şewqa rojê, mîna ronahiya findan a di neynikê de, dibiriqîn.

Piştî du rojan ev hevok di nava nûçeyêke biçûk a rûpeleke navîn a rojnameyê de digel wêneyekî ku tê de tenê beşeke rûyê wî ji ber ronahiya lempeyan xuya dibû, ji xwe re cî girt:

“....On gündür kayıp olan Dicle Üniversitesi Öğrencisi Yusuf Türkkan Dicle nehri yakınlarındaki Heysel

bahçelerinde ölü bulundu. Vücudunda işkence izleri görülen Türkkan....”(*)

Amed, 2007

Têbînî: _____

(*)Xwendekarê Zanîngeha Dicleyê Yusuf Türkkan ku ev deh roj in wînda bû, li nêzî çemê Dicleyê, li baxçeyên Heyselê mîrî hate dîtin. Türkkanê ku di laşê wî de şopên işkenceyê hatin dîtin...”

e-mail: amedcj@hotmail.com

DI GOTINÊN PÊŞIYAN DE AGIR

YÊN DINYAYÊ

*Vêxistina agir sanahî ye, lê vemirandina wî zehmet e.

YEWNANÎ

*Ji xweliya li ser agir, xeyal neke ku vemirê ye.

FRENSÎ

*Çirûskeke biçûk, agirekî cîhan-soj diafirîne.

FRENSÎ

*Agir û pembû bi hev re nasazin.

HINDÎ

*Yê dîn agir vêdixe, aqil wî vedimirîne.

ÎNGLÎZÎ

*Agirê kêr, ziyana wî zêde ye.

ÎTALÎ

*Dijmin agir xweş dike û dost avê lê dike.

YEWNAN

*Agir bi kulûvîla ve dimîne.

YÊN KURDÎ

*Agir bi çîyan dikeve ter û hişk tev dişewite.

*Agirê xweş agirê darê hişk e.

*Agirê gur di qurman de ye.

*Divê mirov di agirê mezin de bişewite.

*Agir girte mala derewînan kesî bawer nekir.

*Agir û pîşo li cem hev nabin.

*Agirê sor kesî naşewitîne.

*Agir xweş e lê xwelî jî jê çêdibe

*Agir bi erdê dikeve hişk û ter bi hev re dişewitin

*Daweta mîran agirê feqîran

*Kes ji agirê germ nareve

*Mezin kir bi nanê xwe, kir agir berda canê xwe.

*Ne sora ber agira, ne rinda ber çira.

*Xwedê kor kiriye, pêl agir e sor kiriye.

*Darê xwe bike şes da agir bibit xweş.

Meymanê Xwediyê Malê

Dilawer ZERAQ

Di wan rojan de; ku êdî peyv û gotin û nivîsa kurdî jî bi awayekî birêkûpêk li ser rûpelên kovar û rojnameyan çav li me dişikandin û min jî bi çavên hûrnêr bala xwe dida nivîsarên di rojnameyan de û bûm şînasê wî⁽¹⁾

Wî, car caran tekstên wek ceribandî û nameyê, car caran jî çîrokên kurt dinivîsandî. Wê hingê herî zêde peyvên ku wî bi kar dianîn bala min biribû ser xwe. Heta tu bibêjî fireh bûn û dişîbiya peyv û gotinên karkerên serhedî ku; gava di serê havînan de ji bo xebat û lebatê berê xwe didan Çukurovayê û riya wan di zîkê Farqînê⁽²⁾ re derbas dibû û her çiqas di nav demeke kurt de be jî, me deng û peyvên wan dibihîst.

Erê, min di derba ewil de fêhm kiribû, ew camêr, Cîhan Roj ji Serhedê ye, lê wî yê jî ji demekê şûnde êdî wek pîranî nivîskarên kurdî, tûrê peyvên herêma xwe li piştî xwe bikira, dê dest pê bikira peyv û gotinên xwe bikira hevalbendên peyvên herêmên din, ferhenga xwe qerase bikira û bibûya nivîskarekî welatî.

Wî bi weşandina pirtûka helbestan (Ratîka, Weşanên Sî, Stenbol, 2002) -belkî jî herî zêde- ez heyirandibûm. Lewre, hem min ew wek pexşan-nûs û çîroknûs nas kiribû, hem jî ez di wê baweriyê de bûm ku dê çîrok û nivîsarên pexşanî bikaribin ber û pêşîya zimanê kurdî fireh bikin.

Û piştî çend salan, a niha pirtûka wî ya çîrokan Meyman li ber destê me ye.⁽³⁾

Gava min pirtûk hilda destê xwe, serê ewil ev hest bi min re çêbû: mîna ku Cîhan Roj bi helbestan wek Meymanekî li deriyê wêjeya

kurdî xistibû û îcar dixwest wek Xwediyê Malê têkeve hundir.

Cîhan Roj, wek ferdekî vê civakê, hay ji şert û merc û awayên jiyana heyî heye û di pirtûka xwe Meymanê de jî hewl dide ku beş û demên ji kitekita jiyana mirovên asayî û reşexelkî bîne zimên.

Helbet bextewarî parek ji jiyana mirovan e; her kes dixwaze wê nas bike û hema bêje hemû kes jî, an ji zûqedîna wê, an ji nebûna wê, an jî ji derewbûna wê gilîkar e. Û êş jî tu dibê qey hêmana diyarker a vê jîyanê (û bi giştî jiyana kurdan) ye ku di ciyê herî jor de rûniştîye û hefsarê ken û bişîrîn û dilşadiya mirovan xistiye destê xwe. Û bi ya min êş, bi pîranî xwe di canê jinan de heyî dike û ancax dikare di ruhê jinan de jî xwe veşêre...

Belê, ez dibêjim qey Cîhan Roj jî hay ji vê yekê heye ku dixwaze em bi çar çîrokên jinan (ku navê çîrokan jî ji navên jinan hatiye lêkirin), dest bi xwendina berhema wî bikin.

Di çîroka bi navê Meyman de, rexneyeke giran heye ji feodalî û rewşenbîriya kurdan ku tevî hev bûye û mirov nizane kî feodal û kî rewşenbîr e. Di çîrokê de diya leheng Meyman, wek jinekê bi doxînsistîya mîrê xwe dihise û piştî demekê gelaciyan xelkê û şarezabûna dixtoriyê wek sedema vê doxînsistîyê dibîne. Yanê dixwaze ji me re bibêje, gelacî (ku ji feşartin û îsrafkirina peyvên pêvtir ne tiştêk e) û xwendewarî (wek sîmge; dixtorî, dermangerî) nayên ber hev û ev yek ancax; di wê civakê de ku nexwestîye dev ji adet û kevneşopên xwe yê bîyom berde û nikaribûye têkeve qada rewşenî û şarezatiya gelên din û mîna ku hem ji karê, hem ji yarê bûbe, wisan bi awayekî sosretî bijî, xwe dide der.

Çîroka Meyman, çîrokeke li ser pêjnîkariya jinan e, ku hewl dide ku hin tiştan bi devê jinan û bi riya hest û tevlîvînên jinan bîne zimên. Ez di wê fikrê de me ku; mirov ne bi baldayîna li tîkiliya jinan a bi mêran re, lê belê bi nêrîn û baldayîna li tîkiliya jinan a bi jinan re bêhtir dikare ji hest û xuset û karakterên jinan fêhm bike. Belê ev yek di çîrokê de heye, lê belê, ev tîkilî xurt nehatiye dayîn û vê jî kiriye ku em cardin di ser mêran re ji hest û tevgerên jinan fêhm bikin.

Her wiha di çîroka Arîna de jî, leheng di du qonaxan re derbas bûye û her du qonaxan

dide ber hev (belkî jî ev yek her du qonaxên nivîskêr in ku tê re derbas bûye-dibe: helbestvanî-çîroknûsî). Û pê re jî hewl dide ku tîkiliya di navbera nivîskaran de ku ji bêtîkiliyê pêk tê, darî çavan bike û dixwaze bibêje; gava di civakekê de kesên rewşen û xwende nikaribin tîkiliyeke durist û şareza deynin, dê civak jî çavek li adetên heyî yên kevn be çavê din jî li rewşeniyê be.

Helbet çîrok çêla kitekitên jiyane û demên fireh ên ku di nav kêliyan de asê mane, dike û ne pêkan e ku her tiştê heyî di çîrokekê de bê dayîn.

Û;

Hêma, rasterast stûna esasî ya helbestê ye. Bi awayekî şilfûtazî di helbestê de cihê xwe digire û gazî dike dibêje; ez hêma me û ji çîroka kakilîn a helbestê z a m e - a f i r î m e - h a t i m e afirandin. Helbet hêma dikare di çîrokê de jî hebe. Lê belê ne wekî ku di helbestê de ye. Çîrok wek bingeh û cureya nivîsandinê, vegotinek e (wekî ku navê wê jî li ser e) û rasterast çîrok e. Helbet, helbest û çîrok xwişk in û bi tenê di cihên ku sînora vegotina wêjeyî destûrê dide de dest didin hev. Lewma jî, hêma; ji bo ku vegotina çîrokî ya nûjen xwe ji tiştên ne hewce dîr bixîne, digihîje hawara çîrokê û di nav hevokan de wek ristehevokê cih digire û çêj û tehmeke dîtir didê.

Lewma jî, nivîskêr di vegotina xwe de nekariye xwe ji qonaxa xwe ya berê bîr û xelas bike û zêde zêde (belkî jî bêhemdî xwe) di qada çîrokê de hespê helbestê bezandiye: ji ber vê sedemê herikbariya vegotinê kêma maye.

Her wiha, wek tê zanîn, ji bo ku çîrok ji riya xwe averê nebe û rengê ceribandînegire, carinan bi hin 'hevokên kilîlî' û rasterast liv û tevger li çîrok (û vegotina çîrokê) tê xistin. Lê belê di hin hevokên vê pirtûkê de vê yekê wek

kêmasiyekê di hin hevokên di pirtûkê de xwe dide der. Wekî mînak:

'Cemîl hû kir her du destên li ber devê xwe (Çîroka 'Berf ne dermanê şevêkê bû' Rûp:42)'

Ji bo aktîviya vegotinê, wek alternatîf "<Cemîl her du destên xwe birin ber devê xwe û hû kir.> (Ger ku em bala xwe bidin beşên reşkirî û binê wan xêzkirî em ê baştir ji radeya aktîviya hevokan fêma bikin.)"

Wek vegotina li gorî sentaksa bi kurdî jî (ku ez di gelek pirtûkan de rastî vê yekê tîm û bi ya min hê vê form û qalibê di kurdî de cî nedaye xwe), dikarim vê hevokê wekî mînak nîşan bidim:

"Xort wextê ji wan dîr diket neviya Kalo, Malîvan, silavê min li kekê xwe bike, digot bi devlikenî."

(Hevoka li gorî sentaksa kurdî: "Xort wexta ji wan dîr diket neviya Kalo, Malîvan, bi devlikenî digot, <silavê min li kekê xwe bike.>")

Ez, bêtî ku çend tiştên ne hewce lê zêde bikim û berê nivîsarê bidim aliyekî din û tîxim nav qalibê danîşana kêmasiyan, dibêjim;

Cihan Roj, bi peyvên ku tev li wêje û ferhenga kurdî dike yek ji wan kesan e ku ji nîfşê piştî salên 1990'î û ji nîfşê Kovara Rewşenê ye û bi pirtûka xwe ya çîrokan li deriyê mala xwe xistiye; tu bi Meymana xwe bi xêr hatî mala xwe.

Têbînî:

(1) Wekî em pê dizanin Cihan Roj pêşî bi navê Jêhat Gîmgîm dest bi nivîsandinê kiriye û paşê ev nav li xwe kiriye.

(2) Ev gotin taybetiyeke axaftina Farqîniyan e ku bes ji bo vê yekê dibêjin.

(3) Meyman (Cihan Roj), Çîrok, Weşanên Lîs, Amed, 2006.

e-mail: dzeraq@hotmail.com





Di çarçoveya
Bernameya Rojên
Wêjeyê ya li Amedê
de lawê Cegerxwîn
Keyo û hevsera wî
Zekiya hatibûn
Amedê. Me jî li ser
Hozanê Nemir
Seydayê Cegerxwîn û
jiyana malbata wî ya
taybet hevpeyvînek
kir. Keyo û hevsera
wî di der barê Seyda
de tiştên balkêş gotin.
Em vê hevpeyvînê
pêşkêşî xwendevanên
Kovara Wyê dikin.

“Cegerxwîn Tarîxek e...”

Hevpeyvîn: Enîse ŞÎRÎN-Azad ZAL

W- Hûn bi xêr hatine Amedê. Em pêşî bi seydayê Cegerxwîn dest pê bikin. Cegerxwîn kî ye? Ji du aliyan ve em dipirsin; ku tu bibêjî “Cegerxwîn” tu yê vê pîrsê çawa bibersivînî û ku tu bibêjî “Bavê min” tu yê çawa bibersivînî?

Keyo: Berî her tiştî spas ji bo hatina we. Cegerxwîn ne malê malbata xwe bû. Milkê mîletê xwe bû. Her kes dikare wî şîrove bike. Li ser wî binivîsîne, çi dixwazin bibêjin. Malê mîletê kurd e. Em gelekî serbilind in pê. Di nav mîlet de Cegerxwîn her hatiye naskirin bi demokratiya xwe, bi dilovaniya xwe, însanekî pir dilovan bû, însanekî pir pêşketî bû. Însanekî mafê jina kurd, mafê hemû jinên ku li dinyayê hebûn diparast. Her wiha Cegerxwîn wek me got malê mîletê xwe bû. Ferqa keç û kur li ba wî tune bû. Belkî zêdetir ji keçên xwe hez dikir. Meyla wî bêtir li ser pîrekê bû. Di mala

xwe de demokrat bû. Di kar û xebata xwe ya siyasî de gelek kes dihatin mala me. Gelek însanên siyasî, nivîskar dihatin. Gelek însanên wekî din jî dihatin. Dostên Cegerxwîn bûn. Dixwestin ji Cegerxwîn hîn bibin. Ji ber vê yekê jî ji ber ku demokrat bû dema ku di malê de pîrsgirêkek derdiket em tev li hev kom dikirin û ji me tevan dipirsî. Digot; ‘Ka em çawa bikin, em çawa vê pîrsgirêkê çareser bikin?’ Bi me tevan dişêwirî. Digot em dikarin çawa hel bikin.

Mala Cegerxwîn medreseyek bû. Mîrov dikare bibêje em ji wê derê derketin.

W- Te got mala me wek medreseyekê bû. Di nava malê de zimanê dan û stendinên we çi bû?

Keyo: Demokratiyeta di nava malê de bi zimanê kurdî bû. Bêtir çavên me vebû li ser zimanê kurdî. Li ser kar û xebata

kurdîtiyê. Ji ber ku em diçûn medreseyên erebî jî lê dîsa kar û xebatên me ji bo mîletê me bû. Bavê me ji mîletê xwe pir hez dikir. Me jî ji mîletê xwe gelekî hez kiriyê. Heya em bimirin jî em ê ji mîletê xwe hez bikin û em ê xizmeta vî mîletî bikin. Ji ber ku vî mîletî em anîne jiyanê, gava mîlet yekîtiya jiyanê tîne divê mirov hurmetê jê re zêdetirîn bigire. Cegerxwîn çima bi erebî ne nivisandiye? Cegerxwîn ne şairekî ereb e. Şairekî kurd e. Gelek caran hewl daye ku hin helbestên erebî binivîsîne. Û hin helbestên erebî nivîsandin. Belkî ji şu’erayên ereban çêtir nivîsandin. Lê li xwe vedigeriya digot; ‘Çima ez ê ji kurdan re nenivîsînim, ji ereban re binivîsînim. Şairên ereban têra wan dikin. Têra wan hene, ne muhtacê me ne ku ez bi erebî binivîsim.’ Ji ber vê yekê berê xwe da helbesta kurdî û bi zimanê kurdî pirtûkên wî hatin weşandin. Demokratiya ku Cegerxwîn dabû malbata xwe û

zarokên xwe belkî di wê wextê de li tu malên kurdan tune bû. Ji ber vê jî tim digotin Cegerxwîn însanekî kafir e. Însanên me yên ku cahil û kevnare bûn hişê wan nedigihîşt demokratiyê, mudaxale dikirin û digotin zarokên xwe di riya dîn re derbas bike, bielimîne ilmî. Serê wan bigire, serçavgirtî û tişt miştên wisa...

Bi rastî Cegerxwîn medreseyek bû. Ne ji bo me tenê ji bo gelek malbatan. Heya niha jî kesên ku ez wan dinasim, dibêjin “Em ji medreseya Cegerxwîn derketine, em li riya wî dimeşin û em ê her bimeşin...” Ez naxwazim pesnê wî bidim ... Ji ber ku lawê wî pesnê wî bide ne xweş e. Wek malbatî, malbata Cegerxwîn malbateke berfireh e. 27 neviyên wî hene....

W- Ji xwe me got tu wek lawekî û wek kesekî Cegerxwîn çawa dinirxînî? Kar û xebatên wî yên siyasî û wêjeyî li ser jiyana te bandroke çawa dikir?

Keyo: Cegerxwîn pir ji min hes dikir. Di gelek tiştan de... Niha mesele gelek xetdestên wî hene. Xetên dest bi herfên erebî hatine nivîsandin. Niha kes ji wan xetên erebî fam nake. Ez tenê fam dikim. Gelek caran jî min alîkariya wî di arşîva wî de kiriye. Min gelek alîkariya wî di nivîsandinê de kiriye. Alîkariya wî ya daktîloyê kiriye. Lê mixabin demekê ez jê qut bûm. Wextê ew li Qamişloyê bû ez li Şamê bûm. Çend salan ez jê qut bûm. Ên ku alîkariyê bikin hebûn, lê ne wek ku ez bikim.

Bandora siyasî ya Cegerxwîn li



W- Em dixwazin we nas bikin. Wek malbat, wek kes hûn dikarin xwe bi xwendevanên Kovara Wyê bidin naskirin?

Keyo: Navê min Keyo Cegerxwîn e. Ez di sala 1936'an de li gundê Çêlekê ji dayika xwe bûme. Di sala 1946'an de ez çûme xwendegehê. Heta 1952'yan jî min xwendiyê. Piştî xwendinê ji ber astengiya aboriyê di nav malbatê de pêwîst bû ku ez dev ji xwendina xwe berdim û kar bikim. Li gelek ciyan min kar kiriye. Li ciyê ku mirov lê kar nake jî min kar kiriye ji bo aboriya malbatê. Min gelek demên reş û tarî ditine.

Di sala 1965'an de bi hevala xwe Zekiya re zewicim. Piştî wê bi 15 rojan em koçberî Şamê bûn. Li Şamê di nav malbatê de bûm. Malek perişan hebû. Xwişkên min li wê bûn, kar dikirin. Paşê min li cem camêrekî kurd li ciyê dermanan kar kir. Bi destmizêke hindik; ji ber ku nasnameya min tune bû. Di sala 1962'yan de nasnameya me ji me stendibûn. Ji ber zewaca xwe min mehkeme vekir û di sala 1968'an de me nasnameya xwe vegehand.

Zaroka me ya pêşîn ku çêbû navê wê Midya ye. Li bajarê Qamişlo navên kurdî qedexa bûn ku mirov li zarokên xwe bikira. Lê li Şamê gava ku biryar hat stendin li mehkemê kaxiz dan me da ku em nasnameyên xwe bistînin û ji ber vê mecbûr man navê Midya li wir binivîsin. Piştî wê zarokêkî me yî din çêbû; Salar. Nasnameya Salar jî li Şamê hat çekirin. Zarokên me hemû li Şamê çêbûn. Ji ber vê yekê jî navê wan bi kurdî ne. Camêrê ku di daîreya gelheyê de dixebitî ji kurd bû, kurdê Şamê bû. Ji min re got ‘pismam’, min jî got ku em pismamê hev in hema binivîsîne, kî dibêje çi bila bibêje.

W- We navê Midya û Salar ji diwana Seyda girtiye ne wisa?

Keyo: Midya û Salar navên dirokî ne. Diwana bavê min a Salar û Midya ji navên van zarokan hatiye. Zaroka me ya sêyemîn Siliva ye. Ji Deştê Siliva hatiye. Ew jî navekî kurdî ye. Piştî wê kurekî me çêbû, navê wî Deysem bû. Ew jî di 13 saliya xwe de li Stockholmê çû ser dilovaniya xwe. Piştî wî Arya çêbû. Ew jî navekî kurdî ye, ji Ariyan tê, dirokî ye. Ew jî aniha li Stockholmê diji. Salar û Midya ji niha li Stockholmê dijîn. Siliva jî niha li başûrê Kurdistanê diji. Di encumena wezîran de kar dike.

Malbata me bi giştî, xuşkên min hinek li Swêdê hinek jî li Sûriyeyê ne. Yek li Dêrikê, yek li Qamişlo dimîne. Carna tê Swêdê carna vedigere. Xuşka min a din Gulperî wextê xwe bi zêdeyî bi diya min û bavê min re derbas kiriye. Niha li Qamişlo ye.

Bavê Zekiya zaf dîndar û gelek pêşketî bû. Vekirî bû, demokrat bû. Ji her tiştê ku şêx û mela digot re nedigot rast e. Tim şerê wan dikir, digot; “hûn vê ya şaş dibêjin, rêya rast bidin ber gel. Derewan li wan nekin. Tişt rast ji xelkê re bibêjin.” Ji ber vê yekê jî xelkê pê re şer dikir. Digotin te keça xwe çawa daye lawê Cegerxwîn. Ew mirovekî kafir e.

ser me hebû, gelekî balkêş bû. Tim digot siyasî û edebî ji hev ne cuda ne. Ew ê siyasî bike dibe helbestvan be û dibe siyasî jî bike. Hinekan digot na!... Tu

şa'irî şîran binivîsîne, eleqeya xwe bi siyasî neyne! Ewî digot na tu xilaf di nava siyasî û helbestê de tune ye ku bi hev re nemeşin. Ji ber vê yekê bandora

wî ya siyasî li ser me gelek xurt bû. Aniha weke xwişka min hem helbestan dinivîsîne hem siyasîyê dike. Bandora wî ya siyasî ji bo me gelekî girîng bû.

W- Di malbatê de yên ku li ser rêça wî diçin hene an na?

Keyo: Xwişkek min heye, niha li Qamişloyê ye. Navê wê Beniyê ye. Di aliyên wêjeyî de gelek maqaleyên wê hene. Nivîsên wê hene. Hinek helbestên wê bi erebî hene. Hinek jî bi kurdî nivîsandiye. Keçeke xweha min heye. Li Dêrikê dimîne. Wê jî felsefe xwendiyê, bi kurdî helbestan dinivîsîne. Wekî din kesên ku meyla wan li ser edeba kurdî be tune ye.

W- Pêşî ew seyda bû, mele bû, lê şûnde bi Komunîstan re danûstandin çêkir. Ji aliyê fikrî ve çu ser fikra sosyalîzm û komunîzmî... Dema ev guherîn tê de çêbû tu hebûyî an na em nizanin, lê ev guherîna fikrî li ser malbatê bandoreke çawa hişt. Têkiliya sosyalîzmê û netewperestiya kurdî di Cegerxwîn de çawa derdiket holê. Di helbestan de ji xwe em dibînin. Lê di malbatê de têkiliya wî û hevala wî, ya zarokên wî û ya bûka wî, ya bi ên din re çî bandor dikir?

Keyo: Bandora wî ya siyasî ya li ser malbatê û zarokên wî cuda bû. Pir wextê xwe li derve bû. Li malê gelek nedima. Ya li Helebê bû, ya li Şamê, ya li Qamişloyê bû ya jî girtî bû. Mirovê veşartî bû. Ji ber vê yekê dema dihat malê, têkiliyên me û wî gelek xweş bûn. Dema ku dûrî me bû jî em bi ber nediketin, me ew jiyan teqdîr dikir. Me digot ew dizane, ew karekî dike ji bo miletê xwe. Em çiqas perîşaniyê bibînin jî, divê em ji bo miletê xwe karekî


bikin, wî jî dikir.... Têkiliya wî û kesên malbatê yên din, mesela bila bûka wî bibêje.... Bi rastî ew ê bikaribe hisên xwe bibêje.

Zekiya: Ez dikarim bibêjim ku Cegerxwîn gelek însanekî rehet bû, gelek însanekî dilovan bû, gelek însanekî... yanî mirov çiqas bibêje mirov nikare bi tevahî bibêje... Wî jî min û zarokên min hez dikir. Yanî bi taybetî ji Keyo û zarokên Keyo hez dikir. Digot Keyo ew qas ji bo min ked daye, ji bo min ji xwendina xwe bûye. Ji ber wî gelek jê hez dikir. Lê mixabin me gelek wî nedidît. Van salên dawî piştî ku nexweş ket hate Swêdê. Yanî me pir wextekî kin ew dît. Timî li derve bû. Digot ez milkê miletê kurd im, ez ne milkê we me. Dema dihat malê hefteyekê ya jî çend rojan dima. Ew jî mêvan diçûn û dihatin... Lê belê gelek diwestiya, ew jî gelek ked da. Pir jî min û ji zarokên min hez dikir. Ji min re digot ez çî bikim, tu jî gihayî me, te jî gelek feqîrî û zorî kişand...

W- Ji bo parastina mîrata wî hûn xebateke bi çî awayî dimeşînin. Ji bo vê yekê projeyên we, yan jî xebatên

we hene?

Keyo: Projeyek me ya pir mezin heye. Li Başûr di 22'yê meha 10'an de ew ê festîwalek pir mezin ji bo wî çêbibe. Ez bawer im ew ê 3, 4 rojan dewam bike. Niha ji bo wan pirtûkên wî ku wek mîrat mane, ên destxet, yên çapkirî û yên neçapkirî dixwazin muzeyekê ava bikin. Wana bixin muzeyê. Heta çapkirina kitêban jî wek projeyê heye. Niha dest pê kirine. Heykelekî wî ew ê li Parka Samî Evdirehman bê danîn. Û şeveke hunerê wek stranbêjiyê wê bê lidarxistin. Dîsa wê navendeke bi navê Cegerxwîn li Hewlêrê bê avakirin. Ew ê cil û bergên wî, tiştên wî tev bêne peşkêşkirin. Ev projeyê mezin e. Kar û xebateke mezin jê re divê. Niha jî dokumentereke (belgesel) gelek mezin li her çar perçeyan tê çêkirin. Ew bi kê re rûniştiye, bi kê re xeber daye û hwd. ew ê wekî film bê çêkirin. Di şeva pêşîn de 8 lêkolîn û axaftin û mudaxele ew ê li ser wî bêne peşkêşkirin. Heya yekê meha 8'an kesên ku dixwazin mudaxeleya xwe binivîsin divê bigihîjin Wezareta



Cegerxwîn li xwe vedigeriya digot; 'Çima ez ê ji kurdan re nenivîsînim, ji ereban re binivîsînim, şairên ereban, têra wan hene, muhtacê me nîn in.' Ji ber vê yekê berê xwe da helbesta kurdî...

“Heyfa Kurê Bavan e Ku Dîn Dibin”

Çirokên wî yên kesayeti hebûn. Mesela çirok ji me re digotin. Dema ku li Amedê bû, digotin Cegerxwîn derketiye ser dikeki sekiniye û çimê wî tazî heya vê derê ne, destê wî tazî heya vê derê, dev ji şaşik û cubeyê jî berdabû wê çaxê. Rih jî qusandibû avêtibû, tiştêk nemabû. Û helbest digotin û qelebalix û alema bajêr lê kom bûbûn. Yekî Omerî di wê re derbas bû, (Xwedê bikim hûn ne Omerî bin) û got; “weehhh, law heyfa kurê bavan e ku dîn dibin lawool!”

Tiştên wiha jî hebûn di jiyana wî de. Têkiliya wî bi gelek kesan re hebû, lê mixabin gelek ji wan wefat kirine. Têkiliya wî bi Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Rewşen Bedirxan, Qedrî Can, Dr. Ehmed Ramiz, Osman Sebrî û bi mala Haco re hebû. Têkiliya wan gelek xweş bû. Niha çend heb mane ew jî li ser riya mirinê ne... Lê dostên wî gelek hene hê mayî ne, li ser riya wî dimeşin.

Rewşenbîriyê. Ev proje li ser navê Wezareta Rewşenbîriyê ye û ew ê li Kurdistanê Azad pêk bê. Keça me Silîva li Encumena Kurdistanê kar dike. Wê ev proje pêşkêş kiriye. Gerek ew jî bihata vê derê. Lê ne gihîştîye. Niha em ê herin gundê Hesarê, gundê ku Cegerxwîn li wê çêbûye. Malbatên wî, dost û nasên wî yên ku li wê hene em ê herin bi wan re ji bo dokumenterê dan û standinan çê bikin. Sûretên gund bigirin, li Batmanê, peykerekî wî heye em ê herin wênayê wî bikişînin. Li bakur tiştê ku li ser Cegerxwîn dizanin, ciyê ku lê xwendîye, bajarê ku lê maye, weke Dêrika Çiyayê Mazî li gelek ciyan maye...

Bi qasî 32 pirtukên wî nehatine çapkirin. 21 pirtûk jî hatine çapkirin. Niha jî wekî ku hûn dizanin li Amedê jî aliyê Weşanên Lîsê ve 2 pirtûkên wî hatine çapkirin. Yek jê Cim û Gulperî ye, yek jê jî Reşoyê Darî ye.

Li Dihokê medreseyek bi navê wî heye. Ez dikarim bibêjim telebeyê wê medreseyê medreseya xwe ew bi xwe diparêzin. Ji bo 3 tabiqe ye. Her sê tabiq jî ew bi xwe amade dikin. Ew paqij dikin.

Em hêvîdar in ku ew projeya me jî here serî.

W- Bi baweriya we sazî û dezgehên kurdî baş lê xwedî

derdikevin an na?

Keyo: Bi rastî ew dezgehên xwedî li Cegerxwîn derkevin gelek kêr in. Yanî mixabin ew dezgehên ku li Cegerxwîn xwedî derneketine em dikarin bibêjin hinekî bi enanîyetî (kevneşopî) ye. Ew dixwazin ku ew bi ser bikevin. Ya nivîskarek e, ya şairek e, ya edîbek e dixwaze tim dengê wî/ê hebe, ji bo çî wê dengê Cegerxwîn derxîne; ji bo çî ew ê pîrsgirêka Cegerxwîn bide pêşîya xwe? Çima wê projeya xwe bi pêş nexe? Gelek kesên wilo hene. Lê rexneyên me jî hene. Gelek mafê Cegerxwîn jî hatiye xwarin. Ji aliyekî ve gelek pirtûkên wî jî çap kirine, lê mixabin destûr jî nexwestine. Ji xwe re çap kirine, difiroşin, pereyên wan jî dixin berîka xwe. Mesele ji bo me ne pere ye. Bes

tiştêkî remzî (sembolî) ye û edebî ye gava ku mirov destûr jî malbatê bistîne. Ku pirtûkeke wî bê çapkirin divê destûr bê xwestin. Gava destûr tune be ev tiştêkî bêexlaqî ye. Bi baweriya min gava ku ez nebêjim û pirtûkekê çap bikim ev bêexlaqî ye. Yên ku bixwazin çap bikin ser seran, ser çavan bila bikin. Lê bes bila destûrê bistînin.

W- Yên ku ji we destûr nestendibin hûn der barê wan de tiştêkî difikirin an na?

Keyo: Em der barê wan de tiştêkî nafikirin. Weşanxane hene ne li Amedê, li welatên din in. Li Sûriyeyê, li Ewropayê hene. Li Ewropayê gelek tişt çap kirine jixwe haya me jê tune ye. Li Sûriyeyê gelek çap kirine, tercumeyî erebî jî kirine, destûr jî nestandine... Mixabin anîha jî min “Tarîxa Kurdistan” perçeyê sisiyan aniye lê ez ê vê gavê bi xwe re bibim Sûriyeyê, ji bo tercumeyî erebî bê kirin. Li wê derê kesek wê tercume bike. Lê divê bi destûr be. Bêdestûr ez nahêlim çap bike.

W- Yên ku mîrata wî diparêzin hûn in. Ji aliyê

Li Amedê Rewşa Wêjeyê Paş De Ma Ye

W- Tu wêjeya kurdî ya niha çawa dinirxîni? Bi baweriya te ji bo pêşvebirina ziman divê çî bê kirin? Ku bala te kişandibe bi taybetî li Amedê li gorî salên berê bi kurdî axaftin gelek kêr e. Hewldanên me hene, lê mixabin ev ne bes in. Bi ya te divê mirov çî bike?

Keyo: Rast e berî her tiştî ez dibînim ku li Amedê wêjeya kurdî paş de maye. Çima? Ji ber ku xelkê me li vê derê bêtir li ser tirkî kar û xebata xwe dike. Lê mirov dikare bibêje îsal ji salên çûyî çêtir bû. Bêtir kar û xebatên li ser ziman hebûn.

Rewşa giştî ya li Kurdistanê jî; li nav Kurdên Sûriyeyê rewş pir xirab e. Hem ji aliyê ziman ve, hem ji aliyê mêjû ve,

ji aliyê her tiştî ve; aliyê civakî, aliyê siyasî, aliyê wêjeyî gelek xirab e. Pirtûk têne çapkirin, dibêjin me li Beyrûdê çap kiriye. Li Sûriyeyê çapkirin qedexe ye. Ji ber vê yekê astengîyeke mezin heye ji bo ku ziman pêş ve here. Lê di sa rêxistinên kurdî hewl didin ku qursên zimanê kurdî bidin. Ev tişt bi dizî çêdibin. Rewşa me li Sûriyeyê ev e. Wêje ketiye cihekî gelek teng. Li Sûriyeyê tu nikarî li daîrekî biaxivî, tu nikarî pirtûkekê çap bikî, nikarî stranekî bibêjî, carna ew jî qedexe dikin.

Li Başûrê Mezin rewş ez bawer im ji her sê perçeyên din çêtir e. Di van salên dawîn de bêtir pirtûk û kitêbên kurdî hatine çapkirin. Ji ber ku ew bêtir azad in, dikarin bi zimanê xwe çap jî bikin û dikarin belav jî bikin.



zagonî ve tiştek di destê we de heye yan na? Mesela em bibêjin yek rabû çap kir, hûn ê bikaribin ji aliye hiqûqî ve dozê lê vebikin?

Keyo: Hûn rastiye bixwazin gelek caran çap bûye me tu doz li kesî venekiriye. Me peyama di internetê de belav kiriye û me gotiye kesên ku bixwazin çap bikin bila destûrê bixwazin. Pere ji bo me ne muhîm e. Ev meseleyeke exlaqî û edebî ye.

Kuleke wî ya mezin hebû ku dixwest Welatê Azad bibîne. Wî Welatê Azad nedît lê camerêk çû ser tirba wî û got “Cegerxwîno rabe rabe! Ha waye Welatê Azad jî çêbû. Bila tu bizanibî...”

Gava ku werin destûrê bixwazin em nabêjin na. Bîr û bawerî di nava kes û dezgehane de hebe problem tune ye. Kesên ku destûr xwestin û me bi wan re kontrat çêkir û ji bo vê çî jî destê me hat me kir. Mafê wî gelek hatiye xwarin. Gava ku tu dozê jî dikî hinek hene dibêjin ku ‘Malê mîletê kurd e ma ya we çî ye? Ma

malê mîletê Kurd e, em ê pirtûkên wî çap bikin û bifiroşin ji we re çî? Ne heqê we ye hûn biştexilin, malê mîlet e!’ Bavê min malê mîletê ye, mafê wî yê exlaqî jî bidinê, mafê wî yê qanûnî jî bidinê. Gava ku hûn mafê wî bixwin hûn wî dikujin. Tabî vîna bêtir wî diêşîne, pê re me jî diêşîne. Gava destûrê bixwazin em ê jî pê kefxweş bibin.

W- Em dixwazin vê pirsê ji Xanim Zekiya bipirsin. Ku bi çavên jinekê em li Cegerxwîn binihêrin. Nêzikatiya Cegerxwîn ya li ser jinê çawa bû? Ku hebe wekî mînak ji bo nirxdayina jinê û nêzikatiya wî ya li hember we hûn dikarin bînin ziman?

Zekiya: Piştî ku ez bi Keyo re zewicîm, min zêde Cegerxwîn nedît. Gelek jî jinê hez dikir. Tîm jî keçên ciwan, jin, xwendevan dihatin li dora wî rûdiniştin, wî hemêz dikirin û pir kêfa wî jî dihat. Ji jinê pir hez dikir. Gelek helbestên wî li ser jinê hene.

Yek ji wan ya li ser Leyla Qasim bû jî ku gelek tê zanîn. Û wekî stran jî tê gotin.

Belê, gava diçû malan, hinek mal hebûn pîrekên wan nedihatin

civata wî. Wan pîrekan dixwestin wî bibînin. Ka Cegerxwîn yekî çawa ye?

W. - Navbera wî û hevsera wî çawa bû?

Gelek jê hez dikir. Heta li ser jî helbest dinivîsand. Hevsera wî carna aciz dibû. Malûm e, gelek eziyet dîtibûn, Cegerxwîn li mal nedima... Min digot “Jinapê gereke tu bêhna xwe fereh bikî. Ew ne însanekî jî rêzê ye. Ew însanekî malê gel e. Bi viya mirov serbilind dibe...” Lê însan bû. Carna ku xanima wî aciz dibû, ew nerm, hêdî bersiva wê dida. Kêm însan wekî wî li ser jinê kûr bûbin. Ji zarokên min pir hez dikir. Zarokên min dida ser milê xwe û ji wan re çîrok û helbest digotin.

W. - Demên xwe yên dawî li cem we derbas kir. Bi taybetî daxwazek wî hebû yan na? Ango daxwaza wî ya dawîn çî bû?

Keyo : Wesiyeta wî ya nivîskî tune bû. Lê tim digot ku ez bimirim min li hewşa min veşêrin. Me ev wesiyeta wî bi cih anî. Lê kuleke wî ya mezin hebû ku dixwest Welatê Azad bibîne. Wî Welatê Azad nedît. Lê camerêk çû ser tirba wî û got “Cegerxwîno rabe rabe! Ha waye Welatê Azad jî çêbû. Bila tu bizanibî...” Berî ku wefat bike, ji me re digot ez dixwazim vegerim welat. Ez nema dikarim li vir, li xerîbiyê sebir bikim...

W. - Em spas dikin ji bo ku we dema xwe ji bo me veqetand.

Keyo û Zekiya: Em jî spas dikin.

EREBÊ ŞEMO



Amadekar:

Enîse ŞÎRÎN-Azad ZAL

Hîmdarê Edebiyata Kurdî Yê Ewîlîn Nivîskarê
Eyan Bavê Romana Kurdî

Erebê Şemo (1897-1978)

Eskerê BOYÎK

Miletêk Di Heyra Wî De Bû

Xelîlê ÇAÇAN

Erebê Şemo Rûspîtiya Gelê Kurd

Têmûrê XELÎL

Hevpeyvîna Bi Erebe Şemo Re Ya Berî 25 Salan

Bavê NAZÊ

Nivîskarê Kurd, Suxreva û Kedkarê Wêjeya
Kurdî Erebe Şemo

Zeynel Abidîn ZINAR

Ji Aliyê Teknîka Romanê Ve “Dimdim” û

Erebê Şemo

Edîp POLAT

Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr

Cihan ROJ

Kesayetiya Edebî ya Erebe Şemo

Ayhan MERETOWAR

Her Ew Hesret û Ew Xwezî

Serwet DENÎZ

Ji Şivantiyê Ber Bi Zanyariyê Ve

Abdurahman BAQIR

Dosye: Erebe Şemo

Amadekar: Enise ŞÎRÎN - Azad ZAL

Ji her gavê bêtir pêwistiya me kurdan bi nasandina pêşevanên wêje û çand û hunerê û bandora wan ya li ser civakê heye. Lewre ew pêşevan di navbera raborî û dahatûyê de wek pîrekê ne. Nîfş û demên diyardê bi van pêşevanan tene ziman. Ev pêşevan bi rengê berhemên wêjeyî, yên çandî û hunerî hemû taybetmendiyên weseh û sekteyên dîrokî û nîfşên raboriyê dinixumînin û pêşkêşî civakê dikin. Bi vî rengî dibin pîra navbera nîfşan û deman. Di dîroka kurdî de pêşevanên bi vî rengî 'hindik in lê rindik in'. Di wêjeya klasîk de Melayê Cezîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran; di çîrokê de Nûredîn Zaza; di romanê de Erebe Şemo her wekî vana mirov dikare yek bi yek bijimêre. Di nava van pêşevanan de yê ku pêşevanî ji romana kurdî re kiriye Erebe Şemo ye.

Me wekî dosye romanûsiya Erebe Şemo û jiyana wî girte dest. Me dixwest ji aliyê heval û hempayên wî yên ku pê re û di dema wî de jiyane bi biranîn û serboriyên wê demê (bi taybetî jî ji aliyê kurdên Qafqasyayê ve) ev dosye bê xurtkirin. Lê mixabin ji ber bêderfetiyan me zêde xwe negihand kes û çavkanî û berhemên wiha. Ji aliyê rêzdar Eskerê Boyîk, Xelîlê Çaçan, Têmurê Xelîl, Bavê Nazê, Zeynel Abidin Zinar, Ayhan Meretowar, Serwet Denîz, Edîp Polat, Cihan Roj, Abdurahman Baqir û gelek kesên din ve nivîs û şîrove hatin nivîsandin û ji me re hatin şandin. Her çiqas ji gelek alîyan ve hatibe veçirandin jî ev dosyeya me li ber dilê me qels maye. Em hêvî dikin ku ev wekî pêşek bê qebûlîrîn û ji bo xebatên li ser Erebe Şemo bibe destpêk.

Erebe Şemo (1897-1978)

Pêşevanê romana kurdî û nivîskarê kurd Erebe Şemo di 23'yê Kewçêra 1897'an de li gundê Sûsîzê li navçeya Qersê hatiye dinyayê. Wê demê Qers di bin desthilatdariya Rûsyayê de bû. Erebe di malbateke xizan de mezin dibe û ew jî wekî bavê xwe şivani û gavaniyê dike. Erebe Şemo di mercên zor û zehmet de xwendina xwe ya dibistana seretayî kuta kiriye. Di sala 1913'an de di 16 saliya xwe de dest bi paleyiyê kiriye.

Erebe Şemo bi 7 zimanên biyan baş dizanibû. Bi ûrîsî, tirkî, yewnanî, azerî, almanî, gürçî û ermenî dizanibû. Ji ber ku bi van zimanan dizanibû demekê jî bo artêşa Êrîs tercûmanî kiriye.

Demeke dirêj di Komîteya Navendî ya Partiya Komünist a Ermenistanê de cih girtiye. Ew di sala 1937'an de dikeve ber bayê sirgûnê yê Stalîn. Di dema Stalîn de sirgûnî Sibîryayê dibe û 19 salan li wê dimîne. Di sala 1956'an de piştî ku Stalîn dimire azad dibe û ji sirgûnê vedigere Ermenistanê.

*Erebe Şemo di sala 1978'an de li Yêrîvanê diçe ser dîlovanîya xwe. "Li Sêntora Yêrîvanê li ser diwarê Makke ku Erebe Şemo salên xwe yên dawiyê li wê derê derbas kiriye, wiha hatiye nivîsandin: **Rewşenbîrê Kurd û karkerê mixulqeyê Erebe Şemo Şamîlov li vê malê ji sala 1963'yan heta sala 1978'an jiyaye.**"*

Berhemên Erebe Şemo:

Ew bi xwe di hevpeyvîna bi Bavê Nazê re de dibêje ku 'wî 7 roman, çend kurteçîrok û hin şano nivîsandîye'. Li gorî agahiyên ku me berhev kirine berhemên wî ev in: 1929- Elfabeya Xwe Xwe Hînkirina Zimanê Kurdî (Ew û Maragûlov bi hev re amade dikin). 1930- 1) Emrê Lênin, 2) Riya Şoreşa Oktobîrê, 3) Kolxoz û Kara Wê Ya Ji Gundîyan Re (Ev wekî broşor û nivîsar hatine amadekirin). 1930- Koçekê Derewîn (Ji nivîskarê şanoyê yê ermen Aleksandr Araratyan wergerandîye zimanê kurdî). 1930-Şivanê Kurd (Wekî otobiyografi ye û romana yekemîn a kurdî tê zanîn) 1936-1) Li Ser Pêwendiyên Fêodalî di Nav Kurdan De (Ev wekî nivîsar hatiye amadekirin) 2) Kurdên Elegezê. 1959- Jiyana Bextewar. 1969- Hopo. 1972- 1) Çirûskên Şoreşa Oktobîrê. 2) Şerê Tarîlka. 1988- Berbang.

Kronolojîya Romanên Erebe Şemo

1- Kurdîskî Pastûx (bi Rûsî), Lénîngîrad, weşanên Moloday Grandya, 1931, 64 rûpel. **2- Kurdên Elegezê**, Rewan, 1932, 56 rûpel. **3- Şivanê Kurd**, Rewan, weş. Dewletê, 1935, 155 r. **4- Kurdîskî Pastûx, Kurdî Elegûza**, (bi rûsî) (Şivanê Kurd û Kurdên Elegezê), Tîflîs, weş. Haypethrat, 1935, 143 r. **5- Berbang** weş. Heypethrat, Rewan, 1959, 280 r. **6- Jîna Bextewar** (bi Ermenî), Rewan, çapa yekemîn, 1961, 359 rûpel. ; çapa duyemîn, 1664, 335 rûpel. **7- Dorogo Şçosiyo** (bi Rûsî) (Jîna Bextewar) wergerîna rûsî ji aliyê wî û M. Demikovoy û M. Çaçanovskogo weş. Sevenskî Pîsatel, Rewan çapa yekemîn 1965, 464 r. ; çapa duyemîn 1971, 454 r. **8- Dimdim**, weş. Heypethrat, Rewan, 1969, 572 r. **9- Krêpost Dimdim** (bi Rûsî) (Kela Dimdimê), wergêr: wî û N. Gorskay, weş. Sovetîskî Pîsatel, Mosko, 1969, 207 r. **10- Kurdîskî Pastûx**, bi Rûsî, wergêr: wî û L. Ostogorskay, weş. Destkay Lîteratûra, Mosko, çapa yekemîn 1972, çapa duyemîn 1976, 208 r. **11- Krêpost Dimdim**, (bi Rûsî) (Kela Dimdimê), wergêr: wî û N. Gorskay, weş. Destkay Lîteratûra Mosko, 1974, 208 r. **12- Dimdim**, (bi Ermenî), Rewan, 1978, 218 rûpel. **13- Dimdim**, (bi tîpên Latînî), weş Roja Nû, Stockholm, 1983. **14- Dimdim**, (bi zaravayê Kurmancîya Jêrîn) werger: Şukur Mustefa, weş. Korî Zanyarî Kurd, Bexdad, çapa duyemîn 1984, 316 r. **15-Jiyana Bextewar**, Weşanên Roja Nû, 1990 Stockholm **16- Hopo**, Weşanên Roja Nû 1990 Stockholm **17-Jiyana Bextewar**, Weşanên Deng 1994 Stenbol **18- Şivanê Kurd**, Weşanên Ozgurluk Yolu, 1977, Stenbol **19- Şivanê Kurd**, Weşanên Riya Azadî, 1990 Koln **20- Şivanê Kurd**, Weşanên Deng 1994 Stenbol **21- Şivanê Kurd**, Weşanên Aram 2005 Stenbol **22- Hopo**, Weşanên Lîs, 2007 Amed **23- Dimdim**, Weşanên Lîs 2007 Amed

Hîmdarê Edebiyata Kurdî Yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî(*) Erebê Şemo (1897-1978)

Eskerê BOYÎK


Destpêka salên 60'î bû. Ez ji gund hatibûm û min li bajarê Yêrîvanê di xwendina bilind de dixwend. Êvarê, ez saetekê dudayan derdiketim nava bajêr, ji bo pey xwendinê hêsa bibim. Dawiya havînê bû. Di pey roja germ re hewa êvara Yêrîvanê pir xweş e. Hewake hênîk dilîze û dewsa hulma germa rojê, hênkayîke xweşik laşê meriv dipêçe. Riya min di kuçeya ser navê X. Abovyan re derbaz dibû. Wan salan êvarê ew kuçe timî tije meriv bû. Rewşenbirên Ermenya yê herî bi nav û deng êvaran di wê kuçeyê de digeriyan. Ew kuçe te yê bigota dilê bajêr bû; evdên bi eyan hîmlî li wir dijîtin.

Li nav gelean de rîspiyekî maqûl, bi bejna nîvçe bala min dikişand. Qaz qudreta Xwedê dema ez derdiketim gerê, ew jî wî wedeyî derdikete seyrangê. Porê spî, dêmê bedewî rem, cil û rihalên qibraxe bê qisûr, kewazê dêstî bedew hewasa meriv dianîn.

Min tê derdixist ku ew evdên di wê kuçeyê de derdiketin seyrangêha êvarê, payê pirê hev nas dikirin, silav didane hev. Çavên min miqîm li kalê bû. Payê xelqê, yê pirê li ber kalê disekinîn, kumê xwe derdixistin, silav didanê, derbaz dibûn.

Kêfa min ji rîspî, maqûltiya wî, rêvaçûna wî re dihat û her êvar min dixwest kalê xwe bibînim û bizanibim kî ye.

Rojekê jî di kuçeyê de min ji merivekî pirsî:



-Biborîne, ew rîspî kî ye ?

-Çi ye, tu ji Yêrîvanê nîn î ? (Camêrê ermenî ecêvmayî li min dinihêrî) ew nivîskarê kurd Ereş Şamîlov e...

Min nav û dengê Ereş Şemo di zarotiyê de bihîstibû, hinek nivîsarên wî xwendibûn, lê ew bi xwe nû didît.

Wê êvarê ez pir kubar bûm, ku ew rîspiyê maqûl nivîskarê gelê min Ereş Şemo ye.

Paşê me ji nêzik ve hev nas kir û weke 15, 16 salan, di riya edebiyata kurdî de, ez bi wî mirovê mezin re meşiyam...

Hîmdarekî edebiyata kurdên welatê Sovyetê yê ewilîn, nivîskarê eyan, bavê romana kurdî Ereş Şemo.

Ereş Şamîlov, di sala 1897'an de li gundê Sûsîzê, li qeza Qersê ji dayika xwe bûye. Wê demê ew qeza di bin desthilatdariya Împeratoriya Rûsan de bû. Sûsîz gundekî kurdên êzîdî bû. Mala bavê wî şêx bûn. Lê wek hinek malbetên dîndar ên din ne xweyî milk û mal bûn. Kesîb bûn. "Şemo kurmançekî kesîb bû, ji

êla Hesenîyan bû, -gelek sal paşê, nivîskar di der heqa bavê xwe de dinivîse- ... diçû ber dewarên xelkê". Wî li wê qeza kurdan, li gundên molokanan, adirbêcanan, huruman û ermenîyan rênçerî dikir. Salekî şivan bû, sala din gavan û bi teherekî ebûra zarokê xwe dikir.

Ereb lawê Şemo yê sisiyan bû, zarokêkî bi aqil î çav-vekirî bû. Di zaroktiya xwe de Erebe biçûk dijiwarîyên jiyanê dîtî, di malên zengînan de xulamî kir, bû berxvan, golikvan, dûajoyê bavê xwe.

Di emrê wî de bûyereke nebîrkirî bû, dema ew di xwendinxaşeya molokanan a Alêksandrovkiyê ya zimanê rûsî de bû berdestî. "Gerekê min heyat paqij bikira ji kaxazan, tozê, lê zivistanê: ji berfê, otaxên dersxaneyan gêzî bikira, toza li ser textê û pencereyan hilda, av bianiya têtîra boçikan, bona vexwerina şagirtan, sibê û êvarê semawera wê bikelanda, biçûma nava gund û dikanê, çî jê re lazim bûya, bistenda, carna biçûma bajêr temyê wê biqedanda, lê wextê berf diket, gerekê her sibe zû sobê li dersxaneyê û otaxa wê dada".



Şerê Rûs û Tirkî dest pê dike, tabûrên leşkerên rûsan li kêleka gundê wan çadirên xwe lê dixin, pê dihesin ku di wî gundî de xulamekî kurd heye ku rind bi zimanê kurdî, tirkî, rûsî, ermenî dizane, gazî wî dikin û di ordiya leşkerên Rûs de kîvş dikin çawa werger

Bi saya milûkî, çav-vekirî, xebatheziyê dersdar hiş li Erebe biçûk dike. Keça dersdara mektebê; Marûsya biçûk ELFEBA zimanê rûsî pêşkêşî Erebe dike û bi alîkariya wê, Erebe, dema xwe ye vala de, dest pê dike û xwe bi xwe hînê xwendina rûsî dibe. Wextê mamosta bi rehm wê yekê dibîne, Erebe bê heq hildide xwendexaneyê...

Wisan ew dibe şagirtê wê mekteba dundersxaneyî ya bi zimanê rûsî. Di demeke kin de dibe xwendevanekî herî li pêş. Di pey qedandina xwendinê re Erebe dîsa xulamtiya malên dewletîyan; yên tirk, ermenî, rûs, hurum dike. Xulamtiya wan salan wî bêtir di nava emir de qal dike. Ew li ber çavên xwe halê gelê xwe yê bindest û evdên kesîb dibîne. Xelqê kurd jî aliyê axa, beg û dîndarên desthitladar ve jî tîrêrandin, pelçiqandin. Ew malên dewletî ku li cem kîjanan xulamî dikir kurmançî nizanibûn. Erebe zîrek mecbûr dibe zimanê wan fêr bibe, ku bikaribe bi wan re bi zimanê wan biaxive.

Wisan bû ku hê 14, 15 salî jî tune bû, êdî bi serbestî tevî zimanê dê wisa jî yê rûsî, ermenî, tirkî, hurumî diaxivî, rind hay ji erf û edet, rabûn û rûniştandin û xeysetên wan ên mîletî hebû.

Ji ber wê yekê jî di efirandinên nivîskar de ew qas kûr û rast, bi rêalîstî deb, rabûn û rûniştin û xeysiyetên wan ên mîletî bi bedewî hatine nîşandan...

Zanebûna zimanan roleke mezin di emrê wî de lîst.

Şerê Rûs û Tirkî dest pê dike. Tabûrên leşkerên rûsan li kêleka gundê wan çadirên xwe lê dixin. Pê dihesin ku di wî gundî de xulamekî kurd heye ku rind bi zimanê kurdî, tirkî, rûsî, ermenî dizane. Wê demê merivê wisan pir kêr bûn. Di dest xwe de gazî wî

dikin û di ordiya leşkerên Rûs de kîvş dikin çawa werger. Tevî ordiya Rûs ew du salan (1914-1916) li dijî tirkên şer dike. Wan her du salan ew bi gelek evdên rûs ên xwendî, yên xweyê bîr û bawerî û fikirên şoreşger re dibe nas, hevaltiyê tev wan dike, kitêban dixwîne, dinya zanebûn û fikirandina wî fireh dibe.

Hê bîst salî jî tune bûye ew zîlamê xweyşûret, çawa gel dibêje; êdî digihîje giliyan, tê derdixê, ku ew nerastiyên jiyane, kul û derdên bê hesav ji evdên bindest re ji ku tên.

Sala 1916'an Erebe Şemo diçe Sarîqamîşê û di çêkirina rîya hesinî de wek pale dikeve ser kar. Li wê derê ew bi bolşevîkan re dibe nas, tevî karê wan ên dizî dibe. Spartînên wan yê gelekî bi qezya û dizî bi serfînyazî diqedîne.

Bîr û baweriyên bolşevîkan nêzikî ruhê wî bûn. Ew di mîtingên karkir û leşkeran de bi xeberdan pêş de tê, wan dide serwestkirin ku azaya wan tenê bi qewlê dêmokratîyê, komunîstîyê dikare bê miyaserkirin. Gerekê hukmê axa, beg û milkdaran bêne hedimandin. Mirovê xebatkar gerek bibe xweyê bextê xwe, welatê xwe, xebata xwe û bi xwe pîrsgirêkên xwe çareser bike. Gundî gerek bibin xweyê erd û axê. Ji bo wan xebatên wî jî, wî digirin û davêjin hebsê.

Ew pir di hebsê de namîne. Çînovnîkên dewletê, dema kare wî lêkolîn dikin pê dihesin, ku Erebe kurdekî êzîdî ye. Bi fikra wan kurd giva ew qas ji siyasîyê fêhm nakin û nikarin bibine bolşevîk. Berdidin.

Di pey ji hebsê derketinê re demeke kin li gundê xwe: Sûsîzê dimîne, paşê bi dizî derbazî Rûsyayê dibe, diçe bajarê Stavropolê... Wê demê di Rûsyayê de şoreşa Oktobirê pêk hatibû. Hukim ketibû destê bolşevîkan. Erebe dikeve nava ordiya Sovyetê ya nûavakirî, ku jê re digotin Givardîya Sor. Sala 1918'an ew êdî endamê Partiya Komunîstên Rûsyayê (Bolşevîkiyê) bû.

Xortê şoreşger ê serwest texmîn dike ku bêtî xwendina bingeîn nikare kêrî gel û partiye bê, bîr û baweriyên xwe bine serî, di sala 1920'î de diçe bajarê Moskovayê û di zanîngeha Lazaryan de çar salan, (heta sala 1924'an) dixwîne.

Sala 1924'an vedigere Ermenîstanê. Wê demê di Ermenîstanê de jî êdî qeydê Sovyetê alt kiribû. Ew Kom-merkeziya Partiya Komunîst (Bolşevîk) a Ermenîstanê de dikeve xebatê.

Hikûmata Ermenîstanê ya nû, hema di salên xwe yên ewilîn de mecalên anegor saz kir ji bo pêşdaçûyîna wê para gelê kurd, yên li Ermenîstanê dijîtin. Ku wan ji halê şûndamayîna kulturî û aboriyê derxe di her aliyên de alîkariya wan kir. Gel di halê koçerî û nivkoçeriyê de bû. Merivên kurd ên xwende pîr kêmbûn. Erf û edetên kevneziyandar qewlê nû nedimeşîyan, li ser rîya pêşketinê dibûn asteng û ziyana mezin didan civakê.

Di wî warî de ewladên gelê ermenî pîr alîkarî dan dostên xwe yên kurd, ji wan gelek zîmanê kurdî zanibûn û bi hizkirin diçûne gundên kurdan, ku nav wan de nexwendîtîyê bidine hildan, kurdan re kadroyên mîletê hazir dikirin. Mektebên gundên kurdan yên nûvekirî de çawa mamoste dixebitîn.

Erebê Şemo kete nava kurma wê xebatê. Ewî di nav gelê xwe de karê kulturê, perwerdeyê, ronakbîriyê dikir, pîrsgirêkên wan digihand hikûmatê, li dijî edetên bêkêr û peymayên hikûmdariya berê yê fêodal şer dikir. Der heqa jiyana kurdan de di rojname û kovarên komarê de dinivîsî.

Sala 1924'an, 5'ê heyva Hezîranê li zozanê Elegezê civîna kurdên nepartîvan hate derbazkirin. Di civînê de axaftina hîmlî ya însturktorê Kom-merkeziya Partiya Komunîstên Ermenîstanê Erebe Şemo bû. Navê tîmayê axaftina wî "V.Î. LÊNÎN û mîletên biçûk" bû.

Sala 1927'an hikûmata Ermenîstanê (Komîsariyata Ronkayî û Perwerdeyê) ji bo hazirkirina elfebeya kurdî ya nû qîrar qebûl kir. Elfebeya nû gotî li ser hîmê herfê latînî bihata damezirandin. Sala 1928'an karê hazirkirina ELFEBÊ bi serfînyazî hate qedandin. Xudanê wê bûn kurdzan Îsahak Maragûlov* û Erebe Şemo. (*Îsahak Maragûlov ji gunde Vêrîn Divînê bû, Komara Ermenîstanê. Bi eslê xwe mexîn (Aşûrî) bû)

Xwendina bi zîmanê rûsî, helaqetiyên wî tevî rewşenbîrên eyan û rêvebirên hikûmatê, mecal didan ku ew pîrsgirêkên gelê xwe bigihîne ciyên bilind. Bi însiyatîfa wî sala 1928'an komek xortên kurd ji Gurcîstanê û Ermenîstanê şandine Lenîngradê xwendinê. Di pey kutakirina xwendinê de bawerkî teva jî karne berbiçev kirin ji bo gelê xwe. Ji wan Qanatê Kurdo paşwestiyê bû zanyarekî kurdzaniyê yê bi nav û deng, Semend Siyabendov di şerê li dijî Almanya

Hîtlêrî de bi mêranî şer kir û navê Mêrxasê welatê Sovyetê stend.

Erebê Şemo xebata berbiçav kir ji bo sazûna rojnemeya kurdî ya RIYA TEZE. Sala 1930'î li bajarê Yêrîvanê dest bi weşena rojnameyê kir. Ew rêveberê berpirsariya rojnameyê yê herî aktîv bû. Wê salê dîsa li Yêrîvanê xwendinxa neya dersdarhazîrkirinê ya kurdî vebû. Berpirsiyarê xwendinxa neyê yê ewilîn ew bû. Lê dirêj wê wezîfeyê nake. Zûtîrêkê wî dişînin bajarê Lenîngradê xwendinê. Ew di aspirantûra Înstîtûta Dîroka Kulturê de qebûl dibe. Wê çaxê ew wisa jî di înstîtûta Felsefe, Edebiyet û dîrokê de dersên zimanê kurdî dide.

Dawîya salên siyî di welatê Sovyetê de dest bi diwariyên dîktatoriya stalînîzmê dibin. Bi milyonan evdên wî welatî yên bê sûc, am û tam bûn qurbanên wan diwariyan.

Kurdên Sovyetê jî ziyana mezin dîtîn. Sala 1937'an Erebe Şemo li Pêtrogradê (Lenîngrad) girtin û sirgûnî Sibîryayê kirin.

Dema jiyana xwe ya herî aktîv û gulvedanê, di dema efrandariya gur de ew kete devê sue, serma û diwariyên sirgûniya zalim. Di bin giraniya siyasiya neheq, ew jî warekî xwezewî mîna Sibîryayê de, ku qewlê hewayê û jiyane wisan in ku degme evd, ew jî evdên welatên germ, dikarin lê teyax bikin, mayîn pir çetin bû. Mecalên jiyane, yên herî sade jî dewletê ji evdên sirgûnkirî re hazîr nekîribû. Yanê wisa, kî çû, kî ma... Êdî der heqê nivîsar û efrandariyê de gilî nikaribû hebûya, dima ber xwe bide jî sermê, birçîbûn û zordariyên siyasî xwe xweyî bikira, jiyana xwe biparasta.

Sibîrya jî bi milyonan evdên wek Erebe re bû goristan... Erebe di zaroktî û xortaniya xwe de pir diwariyên wisa dîtîbû, qal bûbû.

Di pey bîst salên zehmet ên dûr û dirêj re, (pey mirina Stalîn) sala 1956'an, wî wiha gotî "e' fû" dîkin, dibêjinê ku tu sûcê wî tune bûye, neheqî lê hatiye kirin.

Ji wê derê vedigere Ermenistanê, Yêrîvanê. Dîsa dest bi jiyana wî ya siyasî, civakî û efrandariyê dibe. Çi ku salên sirgûniyê wînda kirîbû, bi şev û roj dixebitî ku wê valahiyê tije bike.

Mala wî li nava bajarê Yêrîvanê, li ciyê herî rind, li kuçeya ser navê Ronakbîrê ermenîyan Xaçatûr

Abovyan bû. Heta niha jî li ser diwarê wî tamî, ji bo hurmeta nivîskarê mezin kevîrê mermerî guroverî bedew lê xistine û li ser bi zimanê rûsî nivîsiye: "Di vê malê de ji sala 1963'yan heta 1978'an nivîskarê kurd û xebatkarê civakî Erebe Şemo Şamîlov jiyaye."

Di salên qeydê Sovyetê yê ewilîn de, li Ermenistanê, ji bo kurdên wê deverê jî mecalên pêşdaçûyîne hatin sazîkin. Civaka kurdan şûndamayî û nexwendî bû. Di halê fêodalîyê de jiyana koçeriyê û nîvkoçeriyê derbas dikir. Dewletê her tişt dikir ku mîletên mîna kurdan ji halê şûndamayîne derxe. Ji wan re himê medeniyeteke mîletî dihate danîn. Kadroyên xwendî, zane bawerkî tune bûn. Wezîfeyên pir cawdar û giran diketin ser milê yê wek Erebe Şemo.

Wan salan jî dest bi emrê wî yê efrandariyê dibe.

Sala 1929'an ew tevî Îsahak Maragûlov elfebeya "Xwe xwe hînkirina zimanê kurdî" diweşîne. Ev kitêb ya kurdan a ewilîn e ku bi herfên latînî çap bûye. Ev elfebeya dîrokî bû him, ku wê demê, di welatê Sovyetê de nivîsara kurdî jî tîpên ermenî bîn guhestin bi herfê latînî.

Sala 1930'î pirtûkên wî yê bi navên "Emîrê Lênîn", "Terîqa Rêvolûsiya Oktobîrê", "Kolxoz û kara wê gundiya re" tên weşandin.

Wan salan ew di rojnameyên rûsî û ermenî de bi gotarên berfireh pêş de tê, siyasiya dewleta nû xweyî dike, xelkê nexwendî, şûndamayî dide serwestîkirin ku dewleta nû ya xebatkar û belengazan pale û gundiyan e, dixwaze çavê gel veke, ku ew zilimkar û kedxwarên xwe, yê rastî nas bikin, bi meniya hejarî û feqîriya xwe bihesin û bisekinin li aliyê welatê Sovyetê, li dijî erf û edetên kevne, seva pêşdaçûyîna gel ziyankar şer dike, efrandinên bedewtiyê dinivîse.

Di sala 1936'an de nivîsara wî ya bi navê "Li Ser Pêwendiyên Fêodalî di Nav Kurdan de" derket seva tiyatroyên gundên kurdan şanoya nivîskarê ermenî Alêksandîr Araratyan a bi navê "Koçekê Derewîn" werdigerîne zimanê kurdî (1930 s.)

Sala 1935'an efrandinên wî: ŞIVANÊ KURD, lê salekê pey re jî KURDÊ ELEGEZÊ tê weşandin.

Bi weşendina van efrandinan, îlahî ya "Şivanê

Kurd” Erebe Şemo çawa nivîskarekî kurdî bi şûret hat naskirin û nav û dengê wî çawa li nava welatê Sovyetê wisan jî li nava rewşenbîrên kurd ên wê demê de belav dibe.

Ev romana biçûk bi gelek zimanan; rûsî, ermenî, gürçîkî, adirbêcanî, firansî, almanî, tirkî, erebî û gelek zimanên din hatiye wergerandin û weşasandin. Ciyê gotinê ye ku salên siyî dema rewşenbîrên kurd li bajarê Bêrûtê berhevoka pêşkêşî efirandinên nivîskarên kurdên Sovyetê diweşînin her du efirandinên nivîskar, yê jorgotî jî ciyê xwe di wê derê de digirin. Berhevok jî bi navê romana ŞIVANÊ KURD tê binavkirin.

Nivîskar êdî rind hay ji edebiyata rûsan û ermeniyana hebû. Jiyana, deb, rabûn û rûniştin, ziman, pîrsgirêk û xeysiyetên çawa gelê xwe wisan jî yê gelên wê heremê dizanibû. Hemin li nav gelê xwe derketibû. Bi bîr û baweriyên şoreşgeriyê jî êdî gihîştibû... Ev hemû bûbûn hîm ku nivîskar efirandinên berfireh binivîse û jiyana gelê xwe (wisa jî gelên cînar) bi zaravayê kurmancî yê xweş, bi réalîstî raxe ber çavên xwendevanan.

Ew bi gelek rewşenbîr û nivîskarên dema xwe, yên mezin re nas bûye û dostanî kiriye. Îlahî hukmê edebiyata rûsî ya wê demê li ser wî pir xuya dike.

Nivîskar der heqa rasthatina xwe tevî nivîskarê rûsê mezin Maksîm Gorkî timê bi kêfxweşî gilî dikir.

Gorkî hatibûye Ermenistanê, Yêrîvanê. Erebe Şemo destnivîsara romana “Şivanê Kurd” di dest de rastî Gorkî tê. Gorkî destnivîsarê hildide, lê dinihêre û dibêje: “Gelê kurd bi zimanê nivîskarê xwe: Erebe Şamîlov qise dike...”

Romanoka “Şivanê Kurd” serhatiya jiyana nivîskar e, çîroka zaroktî û xortaniya wî ye. Li nav nerastî û diwariyên emir de, di nav kar û bar, neheqî û zordestiya milkdar, axa û began de zaroka kurd ya malbata belengaz, mezin dibe, qal dibe, digihîje fêdariya sosyalîstiyê, dikeve nava refên şoreşvanan, şer dike ji bo azaya evdên bindest ê zêrandî. Di romanê de bi nîgarkirina dîdem, bûyer û xeysiyetên şexsiyetan, nivîskar bi şarezatî û hûrgilî jiyana xulam û karkirên li cem kedxwaran tîne li ber çavan. Ew ne ku tenê der heqa jiyana kurdan, lê wisa jî der heqa gelên wê heremê yê din de gilî dike... Dide kivşê ku hejarî û zordarî miletiyê nas

nake... Zalimê her gelî weke hev in, hejar jî weke hev in.

Dîdemekî pir balkêş e, dema gur dikeve nav keriyê pêz, şerê şivanê zarok, seyê wî: Çavreş û gur... Bi zehmetî ew gur ji pêz dûr dixin, nahêlin ew ziyana mezin bide kêrî... Lê gur bizina keşê Molokan kuştibû. Ew goştê bizinê dibe dide xweyî... Dewsa ku keşe êgînayî û culetiya şivanê biçûk qîmet bike: “Xezebeke dijwar ew girt, (nivîskar dinivîse) ez birim axorê û li wê, ew qas li min xist ku min nedikarî xwe ji erdê rakim. Ez bêhiş li wê mam. Bavê min hat û ez li wê dîtîm û bi zehmet ez kişandim mal.”

“Adet wiha ye ku şivan ji xisaran re ji aliyê guran nayêne berpirsiyarkirin. Her wekî şivan bê çek in, ev tiştêkî maqûl e. Lê kûlak Sêliverston, mezinê Molokana guh neda adet û qanûnan. Ji bo bizina birandî, ji saliya min çend rûble û çend kopêk ji min birî.”

Eva rastiya jiyana wê demê bû. Di romanê de, ciyekî din hatiye nîşandan çawa ji kêrî 3 pez winda dibin. Bi şaşî davêjin ser merivekî. Mûsa Beg bi zorê 3 peza ji wî distîne. Dema pezê windabûyi dibînin, beg pezê mêrik ji xwe re hildide, paşde nadê...

Bûyerên wiha di romanê de pir in.

Hewaskar in parên romanokê yên der heqa “dizîna” çetelan, xwendina wî di dibistana rûsî ya dwisanle de, barodan û beranberdan, derketina zozanan, xwezaya wê deverê ya delal û hwd.

Nivîskar der heqa bûyerên wan salan ên di wê heremê de qewimîne gilî dike, serkariya pale û gundiyan û tevgera agirê şoreşgerî ku di nav leşkerên rûs de gur bûbû nîşan dide.

Gelekî bi balkêşî tînin xwendin ew perên romanê yên dema qeremanê wî bi zehmetî derbazî Rûsyayê dibe, dikeve nav kûrma şerkariya şorişvaniyê û şerê bajarvaniyê. Li vira wisa jî ew der heqa rasthatina xwe tevî hîmdarekî dewleta Sovyetê yê civakî yê ewilîn, serokekî şerê bajarvaniyê yê efsaneyî S.M.Kîrov. (Erebe Şemo wisan jî rastî hîmdarê dewleta Sovyetê Vladîmîr Îlyîç LÊNÎN hatiye û tev axiviye).

Di pey altindariya şoreşê re qehremanê romanê vedigere Ermenistanê, li vira jî di nav kurdan de dest bi xebata siyasî, civakî û çandî dike.

Di romanokê de nivîskar gelekî delal jiyana

kurdan ya koçeriyê, deba wan, erf û edetên wan dide kivşê. Gelek cî daye pismamtî û hogirtiya pale û gundiyên bindest ên gelên cînar.

Romanoka wî ya wê salê ya din: “Kurdên Elegezê” peyhatiya romana jorgotî ye. Ew jî çîroka jiyana wî ye di pey damezirandina qeydê Sovyetê re. Qehremanê romanokê Erebi xwe ye, di vir de bi navê Misto derdikeve ber xwendevanan. Li vê derê êdî Misto xebata perwerdeyî, kulturî û çandî di nav gundiyên feqîr, belengaz de dike, derdikeve dijî wiha gotî “dijminê sinifê” kurdên zengîn, kûlak, axa, beg û desthilatdarên berê, edetên kevne ziyandar, xebata perwerdeyî, çandî û civakî dike.

Her du efirandin jî bi kurmançiya delal, xweş û dewlemend hatine nivîsandin. Zarava yê Serhedê ye, bi curê şirovekirina gelêrî hatiye pêkanîn, çawa çîrokbêjên kurd çîrokan dibêjin.

Gerekê wisa jî bê gotin ku peyvên biyanî, hevokên axaftina herêmî di nav nivîsaran de pir in. Kîjan, bi texmîna min ew qas ne kêmasiyên nivîskar in, çiqas bi dereceya nivîsandina zimanê kurdî ya wê demê ve girêdayî ye. Li wira nivîsara kurdî nû gavên ewilîn davêt. Tecrûbe tune bû. Ew para kurdan ji bingeha xwe, ji welatê xwe qetiyayî bû. Dîsa gerekê bi erênî bê nîrxandin ku nivîskar ziman û zargotina gelêrî rind zanibûye ku karibûye di aliyê zimên de bi ser bikeve.

Qehremanê van efirandinan, navên mirovan, bûyer, cî û war, bawerkî û hîmlî yê dîrokî û rastî ne. Nivîskar nakokiyên di navbera li aliyekî axa, beg, dewletî, li aliyê din gundiyên kesib de kiriye hîm û di wê çarçoveyê de nivîsarên xwe ava kiriye... Li cem wî axa, beg, serekeşîr, dîndarên êlan tev zulimkar, talanker, neheq, merivkuj û bê wîjdan in, gundî, pale, kesib û belengaz jî evdine pozîtîv in. Helbet di nav axa û began de merivên neheq ên xerab hebûne, lê der heqa tevan de xerab nivîsandin, qelsiyeke van nivîsaran e. Ewî rind dizanibû ku di nav navên ŞIVANÊ KURD de bi xerabî daye navê wisa hene ku êlên xwe ji qirê xilas kirine, anîne gihandine Ermenistanê. Wan jî mîna her kesî zehmetî, belengazî kişandine... Heta niha jî navê hinekan di nav êzidiyên Ermenistanê de bûye efsane, kilam avêtine ser wan û bi keder tîrên bîranîn ku di salên Sovyetê yê ewilîn de komunîstan û komsomolan, ciyê vala çiqas neheqî li wan kirine...

Dema meriv bûyerên dîrokî û halê wê heremê yê siyasî, civakî tîne ber çavan dibîne nivîskar yekalî nêzikî qewimandinan bûye, gelek tiştên girîng “bîra” kiriye. Di şerê navbera Dewleta Rûs û Osmaniyê de (çiqas jî giran be) tenê şerê di navbera du împêratoriyan de nîn e. Ew bûyera mirin û jiyanê ye çawa seva bineliyê wê heremê yê xirîstîyan, wisan jî seva kurdan, xasma kurdên êzîdî ji aliyê hikûmata Rûsyayê ya nû; Sovyetê ve betalkirina şêr, çûyîna leşkerê Rûsyayê ji heremê, gelê wê deverê davêje devê zilma Osmaniyê û Alayiyên Hemîdiyê. Dewa peymana Sêvrê, ku Rûsya gotî xweyî lê derketa bêxweyî ma... ji ruyê Şoreşa Oktobirê ve komunîstan dewa kurdan pêşkêşî Tirkiyeyê kir. Helbet, dem û bûyerên wî wedeyî cuda bûn û ji qeweta nivîskarê me der bû ku bigihîşt a kûrahiya wan pirsan.

Ji ruyê sirgûniyê ve navbereke mezin dikeve nava jiyana wî ya efirandariyê. Wê sirgûniya Erebe Şemo bi rastî jî di nav pêşdaçûyîna edebiyata kurdên Sovyetê de valahiyek çêkir, xasma di warê nivîsara vekirî de. Ji romana “Şivanê Kurd” tê zanîn ku wê demê di meydana edebiyata kurdî de nivîskarekî xwe yê bi qeleta adan û bi şûret sekinî bûye.


Ew bi edebiyat û zimanê rûsan hatibû perwerdekirin, zargotin û zimanê dê rind dizanibû, ji ziman, deb, erf û adet, pîrsgirêkên gelên cînar re jî nas bû, ji navevdên herî bindest derketibû, telî û tengiyên jiyanê, nakokiyên di navbera sinifan de, zilma hikumdarên, rev û beza gelên wê navçeyê bi çavê xwe dîtibû, tevî şerê Rûs û Tirkên û şerkariya Şoreşa Oktobirê bûbû, ciyê xwe di nav jiyana hikumdariya nû de girtibû, bi giliyekî hazir bû seva nivîsara karên edebiyatê yê mezin û bingeîn. Eger ew ji nav civaka wî nehata dûrxistin û ji mecalên efirandinê bêpar nema, wê berhemên pir giranbuha ji gelê xwe re bihişt a.

Bawerkî du dehsal şûn de ew ji wan diwariyên sirgûniyê yê zalim xilas dibe û dîsa vedigere jiyana efirandariyê. 22, 23 sal di pey “Şivanê Kurd” re sala 1958’an li Yêrîvanê romana xwe ya “Berbang” lê salek şûnde “Jiyana Bextewar” diweşîne.

Di nav romanên Erebe Şemo de ya herî berfireh û balkêş; romana JIYANA BEXTEWAR e. Naveroka romanê nivîskar ji jiyana êleke kurdan ya Sîpka hildaye. Bûyerên dîrokî yê devedevî sed salan ji xwe re kiriye hîm û li ser wê fonê wan guhestinên bingeîn nîşan dide yê ku di jiyana

Kurdên wê heremê de qewimî bûn. Qehremanê romanê yê herî sereke Emerîk e û bûyerên sereke li dora qedera malbata wî û kurdên wê heremê pêk tên, xasma êla Sîpkan... Nîvê sedsala nozdehan nakokiyên olî, civakî dikevin navbera evdên vê êlê. Zilm û zora dewleta Osmaniyê ji zêde dibe. Malbata Emerîkê û Sîpkîyên êzîdî tev, mecbûr, cî û warên kal û bavên xwe, milk û malên xwe dihêlin, direvin qezaya Qersê, kîjan wê demê di bin bandora dewleta Rûs de bû. Koçberiya ber bi warekî nû bi xwe re dijiwarîyên nû tîne. Rast e hikumdariya rûsan ew qas ne heq, bê wîjdan û zalim nîn bû çiqas ya Osmanîyan, li cem wan hinek qewl û qanûnên civakî hebûn ku evdên sade ji ji zilma neheqan xweyî dikin, lê li vira ji rastî tune bû, li vira ji evdên kesîb, belengaz, xebatçî dihatin pelçiqandin. Li vira ji hukumdari li aliyê axa, beg û zengînan bû. Li vira ji nakokiyên li nav civakê li dijî evdên feqîr û xebatçî dihatin bikaranîn.

Dest bi şerê cihanê yê yekemîn dibe. Dinya dîsa li hev dikeve. Ew herem dibe meydana bûyerên ne qenc. Jiyana xelkê serûbinî hev dibe. Di nav Rûsan û Tirkên de dest bi şer dibe. Dengê Şoreşê ji rûsyayê tê digihîje wir. Dîsa xelq çîşihî dibin. Di wê heremê de hikumdari ji qewetê derbazî qeweteke din dibe. Tek di pey



demezirandina qeydê Sovyetê de rastî û aramî tî herêmê.

Nivîskar bi zarekî kurmançî yî xweş û hostatî wênayên jiyana kurdên wê herêmê yên wê demê raxistiye li ber çavên xwendevanan.

Di pey ji herêmê çûyîna leşkerên Rûs de bêqanûnî, talançîtî, cerdevanî, rev û bez xelkê dikin devê qetil û zilmê. Emerîk û kurdên êzîdî yê qezaya Qersê mecbûr vê carê ji çemê Erpeçayê derbaz dibin koçberî nav kurdên pala çiyayê Elegezê dibin. Lê ev koçberî ji koçberiya derbazbûyî zalimtir e, ewa rev e ji xezeva roma reş, ji kokbirkirinê, ji kuştinê. Dema revê koka evdan tê. Dê ewladê xwe davêje. Xelayî, nexweşî, tirs, xof mîna şûrê dudev evda dibirin. Dûtîretî, nakokî û bêtifaqî di nav êl û eşîrên kurdan de bêtir xurt dibin. Yên mîna Teyo Beg, bi dewleta Tirk re dibin alîkar û ziyana mezin didin xelkên wê deverê. Dewleta ermeniya ya nûavabûyî bê taqet e ku xelkê ji hicûmkirinên Tirkên biparêze. Leşkerên tirkên, tevî Hemîdiyan bi xwîn û zilm tên digihîjine gundên kurdan ên navçeya Axbaranê, pala çiyayê Elegezê. Koka xelkên van gundan tê. Gelek zilaman hêşîr digirin û berê wan didine kûrahiya Tirkîyeyê. Emerîkê ji tevî wan hêşîran dibin. Ew bi rê ve bi curekî direve, di pey gelek dijiwarîyan û zehmetîyan re tê digihîje mala xwe. Li vira ji qewlê jiyane tune ne. Mecbûr jinê di gund de dihêle, Şehîdê xwe hildide û diçe bajarê Tilbîsê xebatê. Xelq bi hesreta demên hikumdariya rûsan û leşkerên rûs ên rem ên ji welatê wan çûne bi bîr tînin.

Damezirandina qeydê Sovyetê edlayê û aramiyê tînine Komarên Kavkasê: Ermenîstanê, Gurcîstanê, Azerbêcanê. Ji kurdên wir re ji rojên xweş tên. Çawa ji tevan re wisan ji ji lawê Emerîkê Şehîd re ji mecalên xwendinê, pêşdeçûyîne vedibin. Ew berê di mekteba bajarê Tilbîsê de dixwîne, kîjan seva zarokên kurd vebûbû, paşê dişînine Lêningradê (Pêtrograd) xwendina bilind. Di pey xwendinê de vedigere gundê Sengerê cem malbata xwe. Di kolxoza gund de dixebite, di mektebê de dersdariyê dike, di dereceyên serketinê de bilind dibe, digihîje dereceya serokatiya nehiyê. Tê bijartin çawa Sêkrêtarê ewilîn yê Partiya Komûnîst ê nehiya Axbaranê.

Dîsa Şehîd dişînine xwendinê. Vê carê diçe paytextê welêt; Moskovayê. Hema wê demê ji herba Cihanê ya duyemîn dest pê dibe. Almaniyaya Hitlerî davêje ser welatê Sovyetê...

Şehîd dide sîlihê û diçe pêşeniya şêr. Bi mêrxasî şer dike, dibe serleşkerekî şareza, digihîje ritbeya leşkeriyê ya bilind û ji bo mêrxasiya wî navê MÊRXASÊ YEKÎTIYA SOVYETÊ didinê. Ji serokatîya leşkeriyê ya herî bilind ji Emerîkê û Rihana dê re nema razîbûn û pîrozbahiyê tê... Bi wê nameyê jî roman bi dawî dibe.

Helbet ev bûyerên ku di romanê de hatine dayîn ji aliyê nivîskar ve çêkirî, yanê berhemên fikirandina wî nîn in, ew tev ji emrê kurdên Sovyetê hatine hildan. Ew bûyer pêk hatine. Qehremanê wisan hebûne. Nivîskar bi xwe jî (Misto) ne tenê şahidê, lê şerkarekî aktîv yê wan bûyeran bûye.

Bûyerên romanê ji Entaba Sîpka dest pê dibin, heta diçin digihîjine qezaya Qersê, navçeya Elegezê, bajarên Tilbîsê, Lenîngradê, Moskovayê, herba Almanya û Rûsyayê... Behsa bi dehan qehremanên nêgativ û pozîtîv, bûyerên biçûk û mezin tînin kirin. Gelek erf û edet, eyd, şîn, şayî bi hûrgilî hatine nivîsandin... Mesele dema der heqa mirina Xudêda de dinivîse, wisan bi hostatî derbazkirina şîna wî û hildana cinyaz siro dike, tê bibêjî şîn li ber çavên xwendevan tê kirin... Çawa li ser cinyaz distirên, kotelê çawa girê didin, jin guliyên xwe dibirin didin ser cinyaz, hewarî çawa tînin û wan çî cureyî pêşniyaz dikin, xêrê çawa didin. Wisan jî qelenbirîn, dawet, bindarûka ciwanan, eyda Beranberdanê, Berodan, eyda li nav gund gera Kosegeliya. Evan tiştên êtnografî û debiyên wisan in ku niha gelek hatine jîbîrkirin...

Zimanê romanê paqij e, zelal û dewlemend e, akîla gilîkirina wî rast wek ya çîrokbêjan e. Dema xwendina romanê meriv nikare ji şîrovekirina bûyerên hewaskar biqete. Tebîyet di bin qelama wî de tê bibêjî hişyar dibe, reng û rewşên bedew e nedîtî xwe dike û xwendevan heyr dihêle. Dîdemên ciwanên delal, ên xwezaya çîya û baniyên Serhedê di romanê de pir in. Dema dixwîni her demsala wî welatî bi bedewî, xêr û bîr û dijiwariyên xwe tînin ber çavan.

Bi tomerî ev roman bi bûyeran dagirtî û kûr e, jiyana gelê kurd ya wê demê ya dîrokî, pir dijiwar û bi guhestinên bingeîn tije destnîşan dike, li ser wan destanîn û pêşdaçûyînan disekine, kîjan hikumdariya bolşevîkan de ne wê para kurdan.

Nivîskar bi tebiyên realîzma sosyalistiyê nêzîkî bûyeran û qehremanên xwe dibe, di nivîsara xwe de bi temamî siyasî ye, rind tê dîtin ku ew


komunîst e... Dicedîne nîşan bide ku qehremanên wî yê pozîtîv tim serketî û pozîtîv bin. Ewan ji aliyê xeysiyetê ve bê qisûr in, rem in, xebatçî û paqij in, zana ne. Ji bo heqiyê, pêşdaçûyîna, edlayê, dostaniya gelên bindest şerkariyê dikin. Bi fikra wî serketin û pêşketina civakê tenê bi riya siyasiya komunîst dikare miyaser bibe. Ew bawar e ku tek bi baweriyên marksîzm û lenînîzmê, riya sosyalîzmê gelên wek kurdan, ên bindest, dikarin azad bibin...

Qelsî û kêmaniyên romanê jî hene:

- Roman, tê bibêjî ku cêrga bûyerên li pey hev rêzkirî ne. Rêyeke ji aliyê nivîskar ve kivşkirî, yan pilankirî, ji kîjanê re gotî bûyer pêş de herin û xwendevan li pey xwe bibin, naxuyê.

- Carna bûyerên ne pêwîst tînin dikevin nav romanê û xwendina wê giran û zehmet dikin. Eger bûyerên wisan û wan bi wan ve girêdayî hinek par û perçe ji romanê bên derketin, bi texmîna min nivîsar tu ziyane navîne.

- Di nav zimanê romanê yê delal de, carna



hevokên şaş ên ne kurmancî tîn dîtîn, tê bibêjî ji zimanê ermenî yan rûsî xerab wergerandine.

Romana Erebe Şemo JIYANA BEXTEWAR bi zimanê rûsî û ermenî hatiye wergerandin. (Rûsî: werger M. Dêmîdova û M. Çêçanovskî, li Moskovayê sala 1965'an hatiye weşandin, bi zimanê ermenî: werger V. Girigoryan, li Yêrîvanê bi du cildan hatiye çapkirin. Cilda ewilîn sala 1961'an, ya duduyan 1964'an).

Romana HOPO berdewama romana JIYANA BEXTEWAR e. Naveroka wê jiyana gundê kurdan a kolxozvaniyê ye. Emerîk û gundiyan din di kolxozê de bi hev re, bi kolêktîvî dixebitin, Sehîd ji serokatiya nehiyê pêş de dikişînin xebata partiyê ya bilind li Yêrîvanê. Ciwanên gundên kurdan êdî diçine xwendina bilind, diqedînin, dibin pêşekzan, vedigerin karê kolxozê xwe. Emerîk kal dimire.

Nivîskar dixwaze li dor jiyana û evîndariya Zînê û Hesên û yên ku xwendin xilas kirine hatine di wan kolxozên gundên kurdan de çawa pêşekzanê malhebûna gundîtiyê dixebitin, konfilîkta ji bo damezirandina romanê çêbike, lê nayê stendin... Bûyerên romanê kûr nîn in. Gelekî sade û seran in, sar in...Tê dîtîn ku nivîskar gelekî ji civakê, ji pîrsgirêkan, ji jiyana dûr ketiye... Parên romanê, şirovekirina bûyeran, gotarên di rojnameya RIYA TEZE de weşandî yên ne ew qas serketî tînine bîra mirov. Di kîjanan de tenê pesin û destanîn dihate nîşandayîn. Lê çi bi rastî di gund de diqewimî nedihate gotin.

Sala 1965'an li Yêrîvanê romana wî ya bi sernivîsa DIMDIM hate weşandin. Weşandina vê romanê bûyereke berbiçev bû di nav edebiyata kurdên Sovyetê de. Ew yek ji wan nivîsên bedewtiyê ya dirokî ya ewilîn e, ne ku bi tenê di nav edebiyata kurdên Sovyetê lê di ya temamiya kurdan de.

Ji bo romanê çawa hîm destan, beyt û serhatiya zargotina gelê kurd a bi nav û deng KELA DIMDIM hatiye hildan.

Ev beyt û serhatiya di nav zargotina kurdên Sovyetê de pîr hizkirî ye, li odeyan, di nav civakan da tim dihate gotin. Çîrokbêjan him bi stran, him bi cureyê şîrovekirinê digotin.

Gelek varyantên wê ji aliyê kurdzan ve ji nav gel hatine nivîsandin û çapkirin. Hinek helbestvanên

kurdên Sovyetê wiha gotine; ew veçêkirine û ji xwe re kirine poem û destan. Lê gerekê bi heqî bê gotin qîmetê wan nivîsarên ku li ser naveroka beyt û serhatiyên gelêrî (Ne ku tenê DIMDIM wisan jî yên din) ji aliyê nivîskarên kurdên Sovyetê ve hatine nivîsandin (veçêkirin) pîr nizm e. Bawerkî ji her aliyê efirandariyê ve ew ji yên gelêrî dadixin.

Ev destana ji aliyê helbestvanê eyan Fêrîkê Ûsiv ve çawa radyokompozîsyaya hatiye amadekirin û bi radyoya Yêrîvanê salên dirêj hatiye dayîn. (Ez nîzanim ew radyokompozîsyaya berî weşena romana Erebe Şemo pêk hatiye yan pey re). Ew radyokompozîsyaya efradineke giranbiha ya serketî ye.

Gerekê bi rastî bê gotin romana Erebe Şemo ji wan cuda dibe... Mezmezka destana gelêrî di romanê de hatiye xweyîkirin. Bûyer, nexs, ewaz tev dora wê mezmezka hûnandiye, xemleke kurmancî ya bi dilê xwe lê kiriyê û heykelekî edebî yî nemir ji gelê xwe re efrandiye.

Serketin û qewetbûna xweyê kela Dimdimê, Xanê Kurda, Xanoyê Çengzêrîn li Şahê Îranê xweş nayê. Kela Dimdimê bûye dergekî pola, ciyê tifaq û yekîtiya kurdan. Berê berê de serleşkerê cêribandî dişîne ser kela Xanê Çengzêrîn, kurd leşkerên dagirkerên neheq dipelçiqînin, serleşker serşikestî, sekisiz, paş de direvin cem xweyê xwe, tek bi xayîntiya Mehmûdê Merekanî kela Dimdimê dikeve.

Roman-nivîs ew çîrokên xiyalî, fantastîk, ku di destana gelêrî de hene der heqa dîtina zêra, çêkirina kelê, li dor navê peyva "çengzêrîn" û bûyerên din, yên nayêne biharkirin daye aliyekî, ji romanê derxistiye, naverokeke hewaskar a realîst efrandî ye.

Di romanê de kela Dimdimê bi çarsû, bazar, dikan, qawexane, hostexane, kuçe û meydanên xwe mîna dîdemekî zîndî tîne ber çavên xwendevanan. Nivîskar ew wisan nitirandine ku tê bibêjî bajarekî hasê yî bedew î biçûk e. Li dorê gund û eşîrên kurdan e. Xelkê xebatêz bi kar û barên xwe ve mijûl e. Sira mezinayî û serketina Xanê Çengzêrîn ew e ku ew li aliye heqiyê û qenciye ye. Xwestina wî edlayî û aramiya welatê wî ye. Yekîti û tifaqê xelkê kurd kirine mîna kulmeke pola. Kurd xeynî ji biratiyê, wekheviyê û jiyana e' dil tu tiştî ji kesî naxwazin û nahêlin tu qewet azadiya wan ji wan bistîne. Lê...

Aliyek kela Dimdima azadîhez e, aliyê din di Tehrana rengin de Şahê ecemê devxwînî bi qetil û qan e... Daweta Şah e... Xwedê dizane daweta wî ya çendan e. Bûk keçeke çardesalî ye... Di dawetê de jî Şah û neyarên kurdan der heqê wêrankirina kela Dimdimê de difikirin... Şênbûn û azadiya wî warê kurdan tirs û kîn kirine dilê Tehranê. Bi riya cesûsan, dek û fenan, zorê, kuştinê, hevkarîya tevî Sultanê Romê... Her mecal tê cêribandin ku kurdan di nav xwînê de bipelçiqîn. Nivîskar bi nimûneyan xwendevanan dide bawer kirin ku eger tifaq di nav kurdan de hebe, kurd piştî hev bigirin, xweyî li hev derkevin kes bi wan nikare...

Di romanê de xeynî Xanoyê Çengzêrîn xwendevan rastî gelek qehremanên hizkîrî tîn yên mîna Hemze Çawîş, Xaçoyê Ermenî ku topan çêdike, Koçoyê Kal, Mîr Sadiq, Şêx Zade, Cewzo, Sêvdînê lawê Xano, Zadîna jina Posto, Dîlber û gelekên din... Wisan jî li ber xwendevanan tê bibêji derê dîwana Şahê Ecem: Şah Ebas vedibe. Li wir jî tirs û xofê, qelpîtiyê, kînê, neyartiyê bi dizî ve ya dijî hev e.

Eger jî nivîskar re mecal hebûna biçûya ciyê kela Dimdimê, ew ciyê bûyerên dîrokî qewimîne bi çavên xwe bidîta, dokumentên dîrokî biketana dest, lêkolîna pêwîst bikira, ez bawer im roman wê bi cureyekî din binivîsiya û wê qîmeta romanê bilindtir bibûya. Lê wê demê kê ew bext dabû nivîskarê kurd ku bikaribe jî hidûdên Sovyetê yên pola derkeve, bigihîje wan warên Kurdistanê...

Romana DIMDIM bi zimanê rûsî, ermenî û gelek zimanên din hatiye wergerandin û weşandin..

Erebê Şemo xeynî jî van roman û nivîsaran wisan jî seva zarokan çîrok nivîsîne, bi miqale, gotaran, bîranînan di rojneme û kovarên komarên Ermenistanê û Rûsyayê de pêş de hatiye. Bi senaryoya wî filmekî dokumentar bi navê KURDÊN ERMENISTANÊ hatiye kişandin.

Çiqas jî film pesin û piropaganda jiyana Sovyetê ye, dîsa ew jî wan degme dokumentan e, jî kê derê ewled dikarin gelek rewşenbîrên kurd ên wê demê bi zindî bibînin.

Emekê Erebe Şemo pir e di warê pêşxistina kultura kurdên Sovyetê de. Ew evdekî xweyê zanebûnên kûr û kultura bilind bû. Pêşewitekî gelê xwe bû. Bi zarokan re zarok bû, bi mezinan

re mezin. Tim di civat û êvariyên nivîskar û xwendevanên kurdên Ermenistanê de hazir bû, bi şewrên qenc alîkarî dida efradarên gênc.

Derê wî miqîm li ber teva vekirî bû. Ji gundan, bajaran kurdên karker, gundî, xwendevan dihatin cem. Alîkariya teva dikir.

Çawa li Ermenistanê wisan jî li temamiya welatê Sovyetê qedrekî mezin didane wî. Navê xebatçiyê kulturayî yê emekdar yê Ermenistana Sovyetê dabûnê. Wê demê navê wiha didane rewşenbîrên Ermenistanê yên herî binavûdeng, xweyê emekên mezin. Ji bo kar û berhemên giranbuha ew jî aliyê dewleta Sovyetê ve hêjayî du ordênên welêtî herî bilind; Dostaniya Gelan û Ala Sor bûye.

Di pey mirina wî re hikûmata Ermenistanê xelata lîteraturî ya li ser navê wî kivş kir. Ew xelat didane wan nivîskaran ên ku berhemên kurdî yên giranbuha efrandibûn û weşandibûn. Xelata pêşîn nivîskar Wezîrê Eşo stend...

Havîna sala 1978'an bû.

Li serayeke bajarê Yêrîvanê ya mezin û dora wê xelk kimkimî bû. Bawerkî temamiya serkarên Ermenistanê hatibûn wir. Nivîskarên Ermenistanê tev û serokatiya yekîtiya nivîskarên komarê li wir bûn. Ji gund û bajarên Ermenistanê, Gurcistanê, Adirbêcanê kurd hatibûn. Ji

dest xelkê cî tune bû. Cara ewilîn ew qas xelkê kurd li ciyekî top dibû. Jora tabûta wî di nav kulîlkan de pêçayî bû. Te yê bigota nivîskar di tabûtê de raza ye. Jinên kurdan bi kincên mîletiyê li rex cinyaz rûniştibûn, şîn dikirin, dinivandin.

Di wê rojê de jî li pantîona Goristana Yêrîvanê ya Sovêtaşênê, li kê derê merivên komarê yên bi nav û deng defîn dikirin, me EREBÊ ŞEMO teslîmî axê kir.

Nivîskarê kurdî mezin wisan hate dinê û çû...

** 26 Îlon Sala 1990'î di KURDISTAN PIRÊS de çap bûye. Sala 2004'an di heyva Sibatê de careke din nû kiriye. 29. 02.2004.*

Miletek

Di Heyra Wî De

Bû^(*)

Xelîlê ÇAÇAN

Di pey mirina nivîskar û rojnamevanê binavûdeng, serokê radyoya kurdî (ji sala 1957'an heta sala 1981'an) Xelîlê Çaçan Mûradov re di arşîva wî de gelek gotar, helbest, destan, piyes, stran û efîrandinên mayîn ên çapnekirî mabûn, ku ewî nivîsîne, berhev kirine û veçêkirine. Yek ji wan gotaran ya bi sernivîsara "Miletek di heyra wî da bû" der heqê bingehevane edebiyata kurdî Erebe Şemo Şamîlov de bû, ku ewî di sala 1979'an da nivîsiye. Em ewê gotarê wek jînenîgariya Erebe Şemo li jêr raberî we dikin.

Gelek caran wisa diqewime ku di pey mirina merivekî binavûdeng re em teze bi ser hisehisan dikevin ku me camêr û maqûlekî çawa wîda kir. Lê Erebe Şemo merivekî wisa bû ku di dema saxiya wî de ji gişkan qedrê wî digirtin, keda wî dişêkirandin, bi wî serbilind bûn. Wek dibêjin, miletek di heyra wî de bû.

Ew bi her serketin û destanîneke gelê xwe ve şa dibû. Ew tu caran ji kîsî miletê xwe nejiye, lê timî tiştê kiriyê kîsê milet. Lewma gelê kurd her deman hewceyê nûr û nêdera wî, qelema wî ya bi adan bû.

Salek ji tune ku ewî xatirê xwe ji gelê xwe xwest, çavên xwe heta bi hetayê girtin, serê xwe danî ax û berên sar. Lê meriv dibê qey duh bû ku derê rêdaksiyona radyoya kurdî vedikir, dihat, şêwr û temiyên kêrhatî dida me, bi xebata me re can û heyran bû, gotar û efîrandinên xwe dianîn, carna bi xwe bi radyoyê xeber dida. Kîjanî bibêjim?! Heyfa te camêrî! Lê sed cara heyf ku gelê kurd wê îdî guhdariya dengê te neke, efîrandinên te yên teze nexwîne, şîretên te nebihê û beşera te ya xweş, dêmê te yê bi ken nebîne...

Erebê Şemo sala 1897'an li gundê kurdan Sûsîzê, li qezaya Qersê, herêma Dîgorê, di maleke kesîb de ji diya xwe bûye. Mala wana ji mînanî gelek malên kurdan ji dest Roma reş, ji dest xelayiyê û zelûliyê telî û tengasî dîtiye, mihacir bûye. Wek ku ew bi xwe çend salan şûnde di nava romana xwe ya "Şivanê kurd" de dinivîse... "şivan û gavanê berê îro di welatê azad de gihîştîye hurmet û siyanetê".

Di salên xortaniyê de ew mecbûr dibe bixebite, alîkariya malê bike. Bû şivanê axa û began. Gava hinekî mezin bû, dest pê kir di dibistaneke qezaya Qersê ya bi zimanê rûsî de wek qerewil (dergevan) xebitî. Mamosteyên wê dibistanê zên û zîrekiya wî texmîn kirin û ew hîne herfan, xwendinê kirin.

Sala 1913'an, gava ew hela 16 salî bû, wek dibêjin, xêr û şerê cihanê ji hev cuda dikir, li ber çavên xwe dît, ku çawa gelê belengaz di destê milkedaran de tê zêrandinê. Bona wê yekê ji ew li çîna kedxur dike eynat û piştê gelê xebatkar disekine, bi şoreşgerên wê çaxî re dibe nas û bi wana re tevayî dixebite, sipartinên wana pêk tîne.

Di şerê hemcihanê yê yekê de Erebe Şemo îdî dibistanê temam kiribû û di qezaya Qersê de, li alaya kazakan ya ordiya rûsan de dibe wergervanê tirkî û rûsî.

Sala 1917'an ew tevî eskerên rûs ji Qersê vedigere tê Rûsyayê û di devera Stavropolê de bi Gvardiya Sor re tevayî tevî şerê bajarvaniyê dibe. Sala 1918'an ew dibe endamê Partiya Komunîstiyê. Ew çend salan li Bekûyê, Moskovayê, Tibîlîsiyê dixebite, xebatên cabdar dike û sala 1924'an tê Ermenîstanê û li Komîtêya Navbendî ya PK Ermenîstanê dixebite heta sala 1931'an. Lê ji wê şûnde diçe Lînîngradê, di aspirantûrayê de tê qebûlîkirin, bi kurdzanên navdar Îosîf Orbêlî, Îsahak Sûkêrman û şagirtê wan Qanatê Kurdo re dibe nas, bi wan re li ser pirsên kurdzaniyê kar dike. Ew di nav çend salan de gelek berhemên zanyarî dinivîse, li Înstîtûta Lînîngradê ya felsefeyê, edebiyatê û dîrokê de dersên zimanê kurdî dide. Paşê careke din vedigere Ermenîstanê.

Keda Erebe Şemo pir e di karê amadekirina kadroyên kurdan de. Ew di wan salan de gelek xort û keçên kurd bona xwendinê dişîne Moskovayê û Lînîngradê. Ew bi Î. Morogûlov re bi tevayî tevî çekirina elîfbaya kurdî ya bi tîpên latînî dibe. Sala 1930'an, gava li bajarê Yêrîvanê zanîngeha Pişkavkazê ya kurdî tê vekirin, ew dibe serokê wê û xebateke mezin dike bona amadekirina mamosteyên ziman û edebiyata kurdî. Ew tevî wî

karî jî dibe, ku bona vekirina dibistanan, pirtûkxaneyan di gundên kurdan de dest pê bûbû.


Di salên 30'î de pirtûkên wî yên giranbuha, wek "Jiyana Lênîn", "Tarîxa Şoreşa Oktobirê", "Der Heqê Pirsê Fêodalîzmê di Nav Kurdan de" û yên mayîn çap dibin. Dû re pirtûkên wî yên edebî çap dibin, wek "Jiyana Bextewar", "Berbang", "Berevok", "Kurdên Elegezê", "Dimdim" û yên din.

Pirtûkên wî "Şivanê Kurd" û "Hikayetên Cimaeta Kurda" çend cara bi zimanên rûsî, ermenî, almanî, tirkî, azirî, gurcî, erebî, farisî, fransî, îngilîzî, macarî hatine çapkirin. Erebe Şemo hetanî 7, 8 zimanan

dizanibû. Sala 1959'an bi sênaryoya wî filma "Kurdên Ermenîstanê" tê kişandinê.

Erebê Şemo bi ordênên "Beyraqa Sor" û "Dostiya Gelan" hatiye xelatkirin, ew hêjayî navê karmendê Kulturê yê emekdar bûye, hatibû hilbijartinê wek endamê akadêmiya kurdan a zanyarî li Bexdayê. Li ser xaniyê wî li navenda bajarê Yêrîvanê heta niha jî li ser kevîrê mermer nivîseke wiha heye: "Di vê malê de jiye nivîskarê kurdan yê binavûdeng, karmendê Kulturê yê mezin Erebe Şemo Şamîlov".

** Ji arşîva Xelîlê Çaçan Mûradov (1957-1981)*



Di salên 30'î de pirtûkên Erebe yên giranbuha, wek "Jiyana Lênîn", "Tarîxa Şoreşa Oktobirê", "Der Heqê Pirsê Fêodalîzmê di Nav Kurdan de" û yên mayîn çap dibin, dû re pirtûkên wî yên edebî çap dibin, wek "Jiyana Bextewar", "Berbang", "Berevok", "Kurdên Elegezê", "Dimdim" û yên din

Erebê Şemo

Rûspîtiya

Gelê Kurd

Têmûrê XELÎL

Di nav kurdên me de mirovên wisan hebûn ku nav û dengê wan ne tenê li Ermenîstanê hebû, lê her wiha li Sovyetistana berê jî belav bûbû. Wek nimûne, nivîskar Keremê Reş niha cîgirê Yekîtiya Nivîskarên Rûsyayê ye. Akademîk Îvan Farîzov, xwedanê “Ferhenga Rûsî-Kurdî”, eva çendik û çend sal e profesore Înstîtûta Welatên Asyayê û Afrîkayê ye (Ew Înstîtût a Ûnîversîteta Moskovayê ya ser navê Lomonosov e). Artîstê sîrka Moskovayê Ezîzê Esker van dawîyan bû artîstê Rûsyayê yê dewletê. Lê di nava kurdên Sovyetistana berê de yê ku li ber dilê her kurdekî pir ezîz e, ew hîmdarê edebiyata kurdan Erebe Şemo ye.

Ji bo min him diwar e der heqê Erebe Şemo de binivîsim, him jî hêsa ye. Hêsa ye, ji ber ku kar û bar û jînenîgariya Erebe Şemo ji her kurdekî welatparêz re nas e. Lê diwar e, ji ber ku ez ne bawer im ku ez ê bikaribim kar û barê wî li gorî qîmetên wan raxime ber we.

Erebê Şemo çend romanên giranbûha ji me re hişt: “Şivanê Kurd”, “Jiyana Bextewar”, “Hopo”, “Dimdim” û yên din. Ev hemû jî di wextê xwe de bi gelek zimanan derketine. Bi saya serê romanên wî gelek millet bi gelê kurd hesiyan.

Erebê Şemo gelekî mezin e û gorî mezinahiya wî jî gerekê qedr û qîmeta wî bê zanîn. Çima ez van gotinan dibêjim? Ji ber ku tê bîra min gelek kes hatin mezinkirin lê 100 saliya Erebe Şemo bi bîr neanîn. (.....)

Der heqê Erebe Şemo de ez çî jî binivîsim, wek kurd dibêjin “Li bejna siyarê min tê”. Baştir e, ez li jêr çend malûmatên kurt der heqê wî de raberî we bikim:

- Erebe Şemo gava gelek salan di hebsên Sîbiryayê de maye, xwe bi xwe re çîrokên kurdî gotine, ku zimanê dayika xwe ji bîr neke.

- Gava ji kurdekî feqîr re alîkariya ji bo xwendina li Ûnîversîtetê an jî alîkariyeke din pêwîst bibûya, wî hemû nîşan û madalyayên xwe bi pêşîra xwe ve dikir, berê xwe dida ber bi serokên komara Ermenîstanê û yekser pirs hel dibû.

- Ewî gelek ji kibaban hiz dikir. Bi çêkirina tu kesî qayîl nedibû, bi xwe çêdikir û bi qedeheke konyaka Ermenîstanê dixwar.

- Erebe Şemo 7 ziman bê kêmasî dizanibû: kurdî, ermenkî, tirkîya osmanî, rûsî, gurgî, almanî û azîrî.

- Gava piştî 17 salan ji hebsê derket û hate efûkirin, pê hesiya ku kurdekî bi navê Elîxan Ş....nov bi xayîntî giliyê wî li ber hikûmatê kiribû. Lê Erebe Şemo ew neda mehkemê. Digot, bîra nebêjin ku kurd şikyata hev dikan.

- Piştî mirina wî ji aliyê hikûmata Ermenîstanê ve “Xelata lîteratûryayê ya li ser navê Erebe Şemo” hate kivşkirin.

- Bîra wî digihîşte dereceya fantastîkiyê. Çaxê bi yekî re xeber dida, heta çend bavê wî nas dikir û yê hember bi wan zanebûnan şaş û metel dihişt.

- Li ser diwarê xaniyê ku Erebe Şemo lê dima, li ser kevirê mermer bi rûsî wiha hatiye nivîsandin. “Di vê malê de nivîskarê kurd, bolşevîkê kevn, xebatkarê civatiyê yê binavûdeng Erebe Şemo Şamîlov jiyaye”. Mala wî li navbenda bajarê Yêrîvanê (Kuçeya Abovyan, 7) ye û ev nivîs niha jî li wir e.

- Pirtûka wî “Şivanê Kurd” cara pêşîn sala 1931’an li Moskovayê bi zimanê rûsî ronayî dîtiye, lê paşê li bi dehan zimanên cihanê hatiye wergerandin û çap bûye.

- Têma doktora keça Erebe Şemo, Zînê, der heqê jiyana û karkirina wî de bû.

- Erebe Şemo endamê Akademiya Kurdî ya Bexdayê bû.

- Ew ji mala şêxan bû û dikaribû şêxîtiya xwe ji bona kara xwe bi kar baniya, lê di temamiya jiyana û xebata xwe de li dijî wan kesan derdiket ku dîn kiribûn bingeh û dest davêtine kîsê millet.

- Erebe Şemo û V.Î.Lênîn hev dîtibûn û li ser rewşa

kurdan bi hev re peyivîbûn.


Pirtûkxaneya wî ya malê pir dewlemend bû. Gava pirtûkeke siyasî dixwend û didît ku miletan çawa serxwebûna xwe stendine, ew cî bi qelemeke sor îşaret dikir û li ber jî dinivîsî: “Kurd gerekê çav bidine wana”, “Kurd gerekê dostên wiha ji xwe re peyda bikin”, “Ji bo kurdan riya tek û tenê ev e...” û yên din.

Erebê Şemo li pantêona dewletê ya Rewanê hatiye binaxkirin. Gelek kesên binavûdeng çûne goristana wî, keda wî şêkirandine, li ber heykelê wî temene

bûne, pante dane.

Gelek caran em dibêjin: “Xwezî... Me çima ne kir, me ji bo çî pê re negihand...”. Lê, wek dibêjin, meriv ji nivî rê jî vegere, ne poşman e. Tiştê herî ecêb jî ew e ku pirtûkeke wî “Alav”, heta niha jî çapnekirî maye ji bo meseleya aborî.

Tê bîra min, Erebe Şemo di daweta min de ketibû sergovendiyê û govend dikişand. Xwezî bi wan deman û ne xwezî bi wî hişî, ku di fikra me re derbas nebû, ku me li ser vîdeoyê bikişanda...



Nivîskarê kurdan
yê mezin Erebe Şemo
gava guh dida
sazbendiya Xelîlê
Evdile û Şamilê Beko,
digot:

“Gava Xelîlê Evdile li
meyê dixê, mar di
kêleka te re derbas
bibin, li te naxin. Lê
gava Şamilê Beko li fîqê
dixê, hetanî dûpişk jî
direqîsin.”

Hevpeyvîna Bi Erebê Şemo Re Ya Berî 25 salan

Bavê NAZÊ

Isal, (li gorî dîroka ku ev nivîs tê de hatiye nivîsandin de) sala sed û pênc saliya nivîskarê kurd, Erebê Şemo ye. Ji bo bîranîna wî, gerek em çî bikin? Bi darxistina şevan? Wê baş bûya. Bi belavkirina nivîsên wî? Wê baş û baş bûya. Lê ku hemû bi hev re, êdî ev dibû xwesteka herî bi nîrx û hêja. Helbet, ev jî bi kirin û derfetên me ve girêdayî ne. De em ê xwe bê hêvî nekin û em ê bibêjin, li gora ku bê xwestin, em ê sedsaliya nivîskarê xwe li gora meqamê wî pîroz bikin. Ev jî gerek baweriyek be...

Bi xwe xwendevanên me pê dizanin ku nivîskarê kurd Erebê Şemo sala 1897'an ji dayika xwe bûbû. Û sala 1978'an çûbû ser heqîya xwe... Hîn berî wefata wî, bi çend salan (sala 1972'an) min bi komek hevalên xwe re, ew li Lênîngradê dît. Vêga ew bi firehî li ser xebata xwe ya edebî, civakî û siyasî axivî. Û bi taybetî li ser girtina xwe...

Weke nas e, di heyamê Stalîn de, di salên sihî de, gelek Bolşevîk hatin girtin û kuştin. Yek ji wan jî Erebê Şemo bû. Ew ji sala 1937'an heya 1953'an, li Sibîryayê demekê, di zindanê de bû û sirgûn kirî bû. Li gora gotina Erebê Şemo, sebeba nemirina wî, bedena wî ya bi hêz bû. Em pê dizanin ku Erebê Şemo, di wexta girtina xwe de, pelpelûka xwe ya herî bilind ji temenê xwe yê berhemî derbas dikir. Em pê nizanin, heger ew nehata girtin, wê çî berhemên din pêşkêşî me bihatina kirin. Di vir de gerek ez bibêjim ku di wê rûniştina me ya pê re de, wî got wekî ewî bîranîna xwe nivîsandiye û bi firehî li ser jiyana xwe ya li sirgûnê û ya di zindanê de, rawestiyaye. Li gora gotina wî, ew bîranîn di arşîvên Partiya Komunîstên Ermenîstanê de veşartî ne...

Tê bîra min, vêga yekî ji me, ji Erebê Şemo pirsî:

*** Mamoste, di pirtûka we de hatiye**

nivîsandin ku we Lenîn ditiye. Çawa û kengî?

Erebê Şemo, bi firehî, bersiva vê pirsê da mixabin, wê wextê min bersiva wî nenivîsî. Lê piştî vê pirsê min bi xwe çend pirs jê kir û di eynî wextê de, di deftera xwe de nivîsand. Hezîrana sala 1978'an, dema nivîskarê me çû ser heqîya xwe, min ev hevpeyvîna jêrîn, ku sala 1972'an pê re çêkiribû, di kovara "Rêber" de, bi zimanê erebî, hate belavkirin. Niha jî cara pêşîn, bi zimanê kurdî, pêşkêşî xwendevanên "Axîna Welat" dikim.

Vêga min pirsên xwe bi kurtahî jê pirsî, ewî jî bi kurtahî bersiva min da.

*** Mamoste we kengî dest bi nivîsê kir?**

* Ji ber hoyên diwar ên ku welat tê de derbas dibû û ji ber çewisandina netewî û stemkariya çînî, min bi derengî dest bi nivîsê kir. Yanî piştî sih salî ji temenê xwe.


*** Hûn bi kîjan zimanî dinivîsînin?**

* Bi zimanê kurdî û ez bi xwe jî werdigerînim ji bo zimanê rûsî. Carna jî, ez ji tercimanan re dibim alîkar.

*** Hûn çawa fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bûn?**

* Hûn pê dizanin ku gelê me ji hemû mafên xwe mehrûm bû. Loma jî, min bi zimanê xwe nexwend. Lê piştî Şoreşa Oktoberê, bi alîkariya hinin hevalan, ez fêrî zimanê xwe bûm. Û dû re, min bi

Rêbaza min
a edebî,
riyalîzma
sosyalîzmê
ye, lê çima?
Ji ber ku ez
bi xwe
riyalîst û
sosyalîst im,
û di nêrîna
min de, ev
rêbaz dikare
hemû aliyên
jiyanê ronî
bike.



xwe jî, elîfbaya kurdî ya bi tîpên kîrîlî danî.

*** Gelo, ji berhemên we yên edebî kîjan ya pêşî bû?**

* “Riya Şoreşa Oktoberê” ya pêşî bû, min ew di sala 1930’an de nivîsîbû.

*** Ji berhemên we, kîjan ya herî şêrîn, li ber dilê we ye?**

* “Riya Bextiyariyê” (Dimdim), li ber dilê min şêrîn e, lê ya rast jê bêtir “Şivanê Kurd”. Lê belê, ji ber ku ew li ser jiyana min e, ez çêlê nakim.

*** Gelo, hûn helbestan dinivîsînin?**

* Erê, lê ji bo xwe.

*** Rêbaza we ya edebî jiyana e û çima?**

* Rêbaza min a edebî, riyalîzma sosyalîzmê ye. Lê çima? Ji ber ku ez bi xwe riyalîst û sosyalîst im. Û di nêrîna min de, ev rêbaz dikare hemû aliyên jiyana ronî bike. (Di vir de ew bişirî û berdewam kir) Hûn rexnegir, ji nivîskaran bêtir dikarin li ser vê yekê biaxivin, cirîd cirîda we ye.

*** Nêrîna we li ser edeba kurdî çi ye?**

* Edeba kurdî, edebeke xwedî nirx e, lê mixabin wenda ye. Ew jî, wek mirovê kurd li welatê xwe rê

li ber tê girtin. Lê belê, wê rojek bê ku edeba kurdî geşbûyî be.

*** Hûn dikarin, hejmara berhemên xwe ji me re bibêjin?**

* Min heft roman, çend kurteçîrok û hinin şano nivîsandîye.

*** Niha, çi planê we û nivîsandinê hene?**


* Îsal (sala 1972’an), min “Çirûskên Şoreşa Oktoberê” xelas kir û nêzik wê bê weşandin. Û niha jî min dest bi romana “Şerê Tarîlka” kiriye. Ev roman dîrokî ye, bûyerên wê li Kurdistanê Tirkîyeyê diqewimin.

*** Qewetiya we ji bo nivîskarê nûhatî çi ye?**

* Xwendin, dîsa xwendin û ez careke din dubare dikim xwendin...

Bi kurtî, vêga min ew tişt nivîsîbû û niha jî pêşkêşî we dikim. Û hûn pê dizanin ku Erebê Şemo ji mêmî ve ji nav me bar kiriye. Lê ya baş, ez vê nivîsê bi gotina wî bi xwe bibim serî: “Ew kesê ku jiyana xwe, ji bo gelê xwe derbas dike, ew ê tu carî neyê jibîrkirin.”


Têbînî: Ji rojnameya "Axîna Welat" hejmar; 53 (1997 Moskova) hatiye girtin...



*Du berhemên
Erebê Şemo:*

HOPO
Weşanên Lîs -
2007
(Li aliyê çepê)

ŞIVANÊ KURD
Weşanên Aram
- 2005
(Li aliyê rastê)



Nivîskarê Kurd, Suxrevan û Kedkarê Wêjeya Kurdî Erebê Şemo

Zeynel Abidin ZINAR

Nivîskarê kurd, suxrevan û kedkarê wêjeya kurdî, her weha leheng û mêrxasê bizava neteweya kurd, gorbihîştê nemir Erebe Şemo di sala 1897'an de li gundê Azadê yê parêzgeha Qersê hatiye dinyayê û di 1978'an de jî li Yêrîvanê çûye ber dilovaniya Xwedê.

Erebê Şemo navê bavê xwe ji xwe re kiriye paşnav. Şemo çendî ku ji eşîra Hesenan û bi nasnavê şêxantiyê hatiye nasîn, lê mixabin ji ber dest-tengiya aborî li qezaya Surmeliyê gavantî kiriye. Piştî ku jina wî jî miriye, hîn bêtir tûşî nava xizanî û belengaziya bûye, îcar nikaribûye debara xwe bike, her du kurên xwe Derwêşê dusalî û Biroyê sêsalî hildaye û çûye... Şêx Şemo gava çûye, her du kurên xwe yên piçûk hilgirtiye; yek daniye qoqlîka xwe û yek daye ber hemêza xwe, ha wisa çûye heta ku xwe gihandiye Qersê û li gundê Azadê bi cih bûye.

Şêx Şemo li Azadê bûye rênçerê Todorê Horum. Pişt re jî li wir bi jineke Kurd re zewiciye û jê re du qîz û kurek çêbûne, navê kurê xwe daniye Erebe, navê qîzekê daniye Çîçek û navê ya din jî daniye Gogê. Piştî çend salan, Şêx Şemo ji gundê Azadê çûye gundê Aleksandrovsckêya ku bi kurdî jê re digotin Komesor.

Erebê Şemo hêj di zaroktiya xwe de pir zîrek, zana, bîrewer û têgihîştî bûye. Dema bavê wî digel her du kurên xwe yên mezin gavanî û şivanti kiriye, Erebe jî bi wan re çûye çolê û navên gil û giyayên cuda cuda fêr bûye û cureyên pincara ku tê xwarin nasiye. Pişt re jî wî her du kekên xwe fêrî wan navan kiriye û texlîten pincara ku tê xwarin bi wan daye nişandan.

Erebê Şemo hêj zarokekî piçûk bûye, di 1908'an de

li gundê Meleganê bûye xulamê mala Visilyayê dewlemend. Pişt re bûye xulamê dibistana gundê Meleganê û mehê 3 manat mûçe stendiye. Lê bala wî pir ketiye ser xwendinê, xasma jî dava nexşeya dinyayê li diwarê dibistanê dîtiye, zêdetir li welatê xwe sêwiriye û parzemîn û herêm rind nasiye. Pişt re sal 1914 di eynî dibistanê de dest bi xwendinê kiriye. Lê mixabin ji ber ku Erebe Şemo kurê gavanê gund bûye û wî bi xwe jî golikvanî kiriye, zarokên gund nehiştine ku ew li kêleka wan rûnê. Îcar mamosteya Rûsî kursiyekî taybet jê re daniye û li serê daye rûniştandin.

Li dibistanê Marusyaya qîza mamoste xanimê, mola xwe daye ser Erebe Şemo û ew fêrî nivîsandina tîpan, ya bêje û hevokan kiriye. Ji ber wê yekê Erebe zû fêrî axaftina bi zimanê rûsî bûye û her xwendiyê heta ku pola pêncan kuta kiriye. Pişt re Erebe ciwan ji wir çûye gundê Axdaşê yê kurdan û dişa xulamtiya dewlemendan kiriye.

Gava Şerê Cihanê yê Pêşîn dest pê kiriye, Erebe Şemo bi Artêşa Rûs re wek tercûman hatiye û li gelek herêmên Bakurê Kurdistanê geriyaye. Ji ber ku bi gelek zimanên cuda zanibûye, di 1914'an de qumandarekî Kazak ew kiriye tercûmanê xwe û mûçe mehê 25 manat dayê.

Erebê Şemo çend caran ketiye nava şerê Artêşa Rûs û Osmanî. Lê di dema çûnehata leşkerî de çend caran xelkê riya şaş jê re gotiye, gava wî ew rê gotiye qumandaran û pişt re rê ne asê û xelet derketine pêşberê wan, lê ketine gumanê ku Erebe casûs e û lêxistine, perê wî nedanê û ew jî ba xwe qewirandine.

Pişt re Erebe Şemo çûye gundê Qizneferê li mala Şêx Sefoyê mêrê meta xwe bûye mêvan. Li wir bûye evîndarê Karêya qîza meta xwe. Ji ber ku wî rind bi zimanê rûsî dizanibû, heman dem bûye tercûmanê leşkerê rûsan û li vir jî mehê 25 manat dane wî.

Şêx Sefo qîza xwe Karê bi 150 manat pere, hespek û tivingekê daye Erebe Şemo. Lê piştî ku qelenê xwe stendiye, poşman bûye û Karê nedaye wî. Erebe û xezûrê xwe Şêx Sefo minaqeşe kirine, Şêx Sefo rabûye ku li Erebe bixe, lê Erebe jî tivinga xwe paşepêşkî daniye ser milê xwe û ji berê reviyaye. Şêx Sefo jî daye ser piştî wî û destê xwe ji paş ve avêtiye lûleya tivingê û kişandiye. Hingê tiving teqiyaye û Şêx Sefo ketiye erdê û miriye.

Gava leşker hatine Erebe Şemo girtine û birine barîgehê, gundî tev çûne û rûdana meselê bi rastî

gotine leşkeran. Erebe Şemo serbest hatiye berdan û dîsa çûye ser karê xwe. Lê belê êdî dergistiya xwe Karê ji guh avêtiye û bi leşker re çûye Çiyayê Sîpanê Xelatê.

Piştî demeke dirêj, Erebe şemo xwestiye ku ji Artêşa Rûs derkeve, lê serdarê wî destûr nedaye. Erebe gotiye ku Çar kurd ji çûna şer bêrî kiriye, hingê destûr dane û Erebe çûye Sîneka Hesenîyan mala kurê mamê xwe Kelê Biro. Piştî demekê jî, ji wir çûye mala xwe, li Qersê gundê Sûsîzê.

Dema zivistanê dest pê kiriye, Erebe û Şemoyê bavê xwe her şev çûne oda mala Kinoyê maqûlê gund. Bêzêya jina Kino hîn ji Kino camêrtir bûye û pir guh daye Erebe ciwan. Erebe li civatê her şev çîrokên kurdî gotine û serpêhatiya xwe ya wan salên di şer de wek çîrok gotiye.

Piştî demekê dîsa malbata Erebe ketiye rewşeke xirab. Îcar Erebe vê carê bi xûta ku bişixule di 1916'an de çûye Sarîqamîşê û dîsa wek tercûman di nava leşkerên Rûs de şixuliye. Hingê riya hesinî ya ku diçe Erzeromê çêdikirin û li ser wê rêyê bi hezaran karkerên kurd, ermen û ji neteweyên din hebûne.

Li wir çend zanayên rûs kesên wek Klimov, Mixaylov, Popov, Aleksandir Kopnîv têkilî bi Erebe Şemo re danîne û pirtûkên zanistiyê dane wî da ku bixwîne. Bi xwendina wan pirtûkan, dinyaya di mêjiyê Erebe Şemo de hatiye guhartin û pê hisiyaye ku ev şerê di navbera Rûs û Osmaniyan de, ji bo qezenca polperestan e, her weha wê demê pê hisiyaye jî ku Lenin li Ewropayê dijî. Ji van guhartinan zêdetir, Erebe Şemo li wir hisa zixta nijada kurdî jî li ser xwe wek deman ditiye.

Her ku çûye Erebe Şemo ketiye nava komunistan û gelek caran beşdarî civata “podpoli” yê bûye. Lê temînî lê pir hatiye kirin ku ew nihênîyan ji kesî re nebêje.

Erebe Şemo cara pêşî jî bo xebata fikrî, ketiye nava karkerên kurd, horum, ermen, rûs û hin neteweyên din û pêşiyê gotiye wan ku destmiza wan hindik e, bila doza pereyê zêde bikin. Piştî ku karkeran desmizeke zêdetir wergirtiye, rûmeta Erebe Şemo jî zêdetir bûye û heman dem Partiya Bolşevîk ew kiriye endam û cihekî girîng danê.

Erebe şemo giraniya xebata xwe ya siyasî di nava kurdan de kiriye û ew bi rêxistinî kirine. Kurdekî bi navê Erifê kurê Qelender jê re bûye desteka herî mezin.

Di wê demê de Çarê Rûs jî ser text hatiye avêtin, lê kes pê nehisiyaye. Erebe Şemo belavokên şoreşê bi awayekî wisa nepenî di nava leşkerên rûs de belav kiriye ku kes pê nehisiyaye. Piştî demekê Bolşevîkan biryar dane ku her kesên li wir kar dikin, bi alaya xwe derkevin xwepêşandanê. Erebe Şemo jî li wir alayek jî bo karkerên kurd çêkiriye û bi serê misasekê ve kiriye, daye destên Reşîdê Kurd ê jî gundê Çetelpoxara Qersê.

Gava xelkê dîtiye ku vaye kurd jî bi alaya xwe ketin qada mitîngê, bala pir kesên biyanî ketiye ser wan û hin kesên ji neteweyên din jî aciziya xwe dane xuyakirin.

Piştî encama mitînga li Sarîqamîşê ya li dijî Çarê Rûs, Erebe Şemo jî aliyê leşkerên Çar ve hatiye girtin û gelek roj îşkence lê kirine. Dema ew hatiye berdan, Erebe daye rê û çûye gundê Sûsîzê ku mala bavê wî li wir bûye.

Li gund Erebe Şemo gundiyan xwe kom kiriye û ji wan re gotiye ku Li Rûsyayê çarîtî rabûye. Lê belê kesî jê bawer nekiriye û heta hin kalemêran gotine wî: “Te ev gotin li vir got, lê belê li deverêke din nebêje. Wê çermê piştê te wek zihêl bikin.”

Piştî demekê Erebe Şemo ketiye nêv Artêşa Sor. Lê belê li gelek deveran, hêj Artêşa Rûs a Çar xurt bûye û bi artêşa Sor re şerine dijwar kiriye. Ji vê artêşa Çar re Leşkerên Spî jî dihate gotin ku piraniya wan Qazax bûne. Erebe Şemo sê caran di şerê navbera van her du Artêşan de birîndar bûye. Piştî birîndariyê îcar Erebe Şemo ketiye nava pencên nexweşîya Tîfoyê.

Dema ku Erebe Şemo ketiye nexweşxaneyê, Leşkerên Spî hatine û ew li nexweşxaneyê îşkence kirine ku ango ew cihû ye. Lê dema fêhm kirine ku Erebe Şemo kurd e, dest jê berdane û çûne. Îcar Erebe jî nexweşxaneyê reviyaye û çûye mala dostekî xwe yê ermenî da ku xwe li wir veşêre. Lê dostê wî Xaço û jina xwe ew qewirandine û nehiştine ku Erebe li mala wan bimîne. Erebe Şemo jî wir çûye bajarê Qizlerê û bûye xulamê ermeniyekî dewlemend.

Dema Erebe Şemo bihîstiye ku partîzanên Bolşevîk li nêzê bajêr di nava qamîş de bi cih bûne. Gotiye axayê xwe ku ew ditirse ku şevêkê partîzan werin û wî di nava rez de bikujin. Axê gotiye ku dewleta wan xurt e û Leşkerên Spî pir in, kes nikare têkilî wî bibe.

Şevêkê Axayê Erebe Şemo çend qumandarên

Leşkerên Spî vexwendine nava rezê xwe û xwarinên pirtexlît ji wan re daye çêkirin, her weha kûpên bade û meyê jî pêşkêşî wan kiriye. Piştî xwarin û vexwarinê, tevek serxweş bûne, hema Erebe Şemo jî rabûye tivinga yekî hildaye, qayîşa kutilkê fişekan bi kêrê jî piştî wî qetandîye û çûye nava qamîş, li partîzanan geriyaye, lê belê ew du rojan maye, kesekî partîzan nedîtîye. Îcar pirî ku Erebe westiyaye, her weha gelek jî poşman bûye ku hatiye, hema li ber tûmekê di xew re çûye. Ha ku dîtîye, tiştê ketîye ser wî. Gava çavên xwe vekirine, dîtîye ku sê partîzan in û ew dîl kirine, rakirine birine ba serdarê xwe. Gava Serdar Erebe Şemo daye xeberdan, fêhmî kiriye ku ew jî hevalê wan e û wek partîzan bi xwe re hiştine.

Sal gava bûye 1919, êdî xelkê jî ber cewra Leşkerên Spî hedan nekiriye û her roj bi qefleyan kes çûne ketine nava partîzanan.

Şerê Partîzanan û yê Leşkerên Spî, xwe jî çol û pesaran berdaye nava bajaran. Her ku çûye Leşkerên Spî qels bûne û desteka wan jî xelkê kêmbûyê, lê Leşkerên Sor jî xurtir bûne û desteka wan a jî xelkê xurtir bûye. Lê belê şer her di bajaran de dom kiriye.

Sal gihaye 1924'an, êdî Partiya Komunîst dest pê kiribû û rêxistina xwe ya di nava xelkê de xurtir dikir. Ji ber hindê Partiyê, Erebe Şemo hinartîye Ermenistanê, da ew li nava kurdan bixebite û wan bi rêxistin bike.

Erebê Şemo dest bi honandina rêxistinê kiriye û bi serkeftîneke mezin kurd li dora Partiyê dane komkirin. Di wê navê re pîrsa dê û bavê xwe jî kiriye, lê salixê wan hîlnedaye ku ew li ku derê ne.

Piştî re Erebe bihîstîye ku pir kes jî eşîra Sîpkan jî ber cewra Osmaniyan reviyane û çûne Axbaranê. Şemoyê bavê wî jî di nava wan de bûye. Lê belê rojekê leşkerên Tirk Şemo girtine û birine Karwanserê, çend roj şûnde jî cenazeyê Şemo tevî yê çend kurdên din li perê bajêr hatine dîtin. Diya Erebe jî reviyaye û çûye Elegezê ba xwişka xwe, lê di xelayê de ew jî ji birçîna miriye.

Piştî ku desthelatî bi temamî ketîye destên Partiya Komunîst, bihna kurdan derketîye û dest pê kirine dibistan û xwendegêh ji kurdan re jî vekirine, rojname û pirtûk bi zimanê kurdî hatine weşandin, her weha enstîtu û xwendegêhên teknîkî jî li Ermenistan û Lenîngradê vebûne.

Erebê Şemo her di 1924'an de, li Yêrîvanê dev bi xwendina Enstîtuya Lazerevskî kiriye û bûye pisporê Rojhilatnasîyê. 1931'an doktoraya xwe li Akademiya Zanistî beşa Asyayê ya bajarê Lenîngradê daye.

Erebê Şemo di nava derd û kulan de jiyaye, ji ber hindê gelek rind gelîş û sergêjîyên civata kurd jî zanibûye. Wî hinek jî wan tiştên ku bi çavên xwe dîtine û bi guhên xwe bihîstine, daxistîye nivîsê û kiriye malê mêjûyê.

Erê rast e ku dibêjin, "Dîtin û gotin nabin yek". Gava mirov behsa jiyana Erebe Şemo jî binivîse, serpehatiya wî bi meqaleyên wisa kurtik û mirtik nayê zanîn. Hêja ye ku Zanîngeheke kurdî li ser vî rewşenbîrê hêja lêkolîneke pir fireh bide destpêkirin û senaryoya jiyana wî bê nivîsandin, li berê jî film digel dokumanan bêtin amadekirin.

Bi rastî jî hin deqerên serpehatîyên Erebe Şemo hene ku pileya mêjîyê mirov nikare bipejirîne ku vî kurdê hanê çawa karibûye xwe li ber hew qas zext û êrîşên merc û rûdanên giran biparêze. Wek mînak, Erebe Şemo hew qas jî bo Partiya Komunîst fedekariyên pir hêja kirine jî, jiyana xwe tev di wê rêyê de bihurandîye, lê sîstema Sovyetê ew bi tawanbariya ku têkiliya wî bi kurdên derve re heye, 17 sal di girtûgehê de hiştîye.

Tiştê ku ji aliyê min ve hatiye peyîtandin, heta niha berhemên Erebe Şemo yên ku çap bûne û pêşkêşê Raya Giştî bûne, ev in:

- 1930 Şivanê Kurd.

- 1959 Jiyana Bextewer.

- 1966 Kela Dimdimê li Yêrîvanê bi tîpên kirîlî, 1974 li Moskovayê bi tercûmeya rûsî, 1975 li Bexdayê bi zaravayê soranî û 1983 jî li Stockholmê bi kurmanciya latînî hatiye weşandin.


- 1969 Hopo.

- 1988 Berbang.

Erebê Şemo di rastiya xwe de perestîngeheke kurdewarî bûye, lê mixabin ji aliyê kurdan ve rind nehatiye nasîn.

Stockholm 05 06 2007

e-mail: pencinar@bredband.net



“Ew kesê ku
jiyana xwe, ji
bo gelê xwe
derbas dike, ew
ê tu carî neyê
jibîrkin.”

Erebê Şemo

Ji Aliyê Teknîka Romanê Ve “Dimdim” û Erebe Şemo

Edîp POLAT

Erebê Şemo Şamîlov bi navê Erebe Şemo an Erebe Şemo pirtûk nivisandîye û berhemên xwe weke roman afirandîye. Di dema wî de, bi taybetî roman-nûsên kurd hindik bûn, lê wî her roman nivîsiye: Hopo, Jiyana Bextewar, Şivanê Kurd, Kela Dimdimê, hin ji romanên wî ne. Min demek berê romana wî ya bi navê Kela Dimdimê wergerandibû tirkî û ew cara yekem di nav weşanên Evrenselê de hatibû çapkirin. Beriya wê, min romana wî ya Jiyana Bextewar xwendibû.

Erebê kurê Şemo romanên xwe bi terzekî realist nivisandîye, bûyerên ku ji bo berhemên xwe hîlbijartîye ya beşek ji jiyana wî ne, an serpêhatiyên kesên din in ku ew ji wan re bûye şahid. Di romanên wî de surrealîzm tune ye, lê bawerî heye, îdealîzm her li pêş e. Mîna romanên klasîk yê sed sala bîstî, ew qehremanên xwe ji nava rastiya jiyanê diafirîne, bûyeran derdixe pêş, kesayetiyên stero nîşan dide, di nava bûyer, rastlêhatin û trajedîyan de romanê peyv bi peyv dihone, xwendevan hinekî li hev şaş dixe, tiştê balkêş û nedîtî û nebînayî derdixe pêşberî mirov û di encamê de ji tiştên nelibendê rê mirov dide. Her wiha di vê herikbariyê de ji fikreke bingeîn derdixe holê ku ev fikir armanca nivîskêr e. Mirov tê digihîje ku nivîskar berhema xwe bi mebesta gotina wê makefîkrê peyv bi peyv honaye. Lê mixabin peyvên wî yê wê dewrê ne ku mirov li gor kurmançiya niha carna jê fam nake, tewer gelek caran wateya wan peyvên jî bi hêsanî nayê dîtîn. Gramer û nivîsîna peyvên wê demê di nava kurdên Sovyeta berê de gelekî cihê bû. Di romanê de peyv çawa hatine gotin wisan hatine nivîsîn. Dema me Kela Dimdimê wergerande tirkî, me

wateya gelek peyvên jî Prof. Celîlê Celîl pirsî. Hin ji wan bi eslê xwe ji zimanê Farişî hatibûn, hin ji wan jî tirkî bûn. Hin îdyom hebûn ku li herêma Serhedê dihatin bikaranîn.

Bêjeyên ku bingeha xwe ji tirkî digirin, di kurmançiya Erebe Şemo de hatine xerakirin. Bûyer bi zimanê gel, bi awayekî sade, zelal û hêsan têne zimên. Bi gelemperî bi teswîrkirina xwezayê romanên wî dest pê dikin. Jixwe wî bi xwe jî gelekî ji çol û çiya û gul û giyayan hez kiriye, raçaviya guhertina xwezayê ya li gor demsalan nivîsiye. Dema mirov vegotina wî ya der barê xwezayê de dixwîne, ew li pêş çavê mirov dibe nivîskarekî gerdûnî û natûrel. Avên çeman, keriyên pez, helîna berfa berpalkan û bi tevayî jiyana gundan dibe mijara derbirîna wî. Kela Dimdimê romaneke dîrokî ye û welê tê zanîn ku piştî lêkolîneke dûr û dirêj ji pênuşa wî herikiye. Çimkî ew ji bûyerê re, ji destpêkê heta dawiyê serdest e. Qehremanê sereke Xan Dimdim an Xanoyê Çengzêrîn baş dinase. Pîrsgirêka kurdan, êş û elema vî gelî, carna li derveyî prensîbên romanê, weke têgehên siyasî tîne zimên. Nexasim di dawiya Kela Dimdimê de weke Epîlog vê yekê wiha dibêje: “Ew cenga cansîperane ya Xanoyê Çengzêrîn li her cihên ku kurd lê dijîn nîfş bi nîfş belav bû. Dengbêjan kilam gotin, helbestvanan ew destana bi azamet ya cenga

Dema mirov bi çavê romanên nûjen li vê berhemê binihêre, helbet dê kêmasiyên wê hebin. Her çiqas kitkityên romanê bi hûrgilî ji hev hatibin veçirandin jî, diyalog kêman in.

ku kurd ji bo azadiya xwe ketibûn navê nivîsîn. Belê, ew têkoşîn bi avê de neçû, di demeke kurt de şerê azadiyê yê kurdan dîsa dest pê kir...”

Mehmûdê Merikanî, mîna Bekoyê Ewan ê Mem û Zînê mirovekî xayin e, giliyê cihê cuhên ava Kela Dimdimê dike. Her wiha evîndariyek heye, ya Şebab û Dîlberê ye. Hest û têkiliyên wan, digel kelemên mîna Xurşît ji hebin, renekî xweş dide romanê. Têkiliya Posto û Zadîne Xanimê ji evîneke tekane ye. Jixwe di romanê de berxwedana jinên kurd mîna spot her tim tete ber çav. Ew bi mîr û kurên xwe re diçin eniya cengê. Di 15, 20 rûpelên ewil de, danasîna Kelê bala mirov dikişîne. Erebe Şemo yekê hêdî hêdî li nav danasîn û bûyeran reşandîye, lewma digel danasîna sirûştê û kesan ev yek xweş li hev tê. Evîna Xurşît ya ji bo Dîlberê, weke agirekî bêdomahîk alav dide û ji ber ku dilê keçikê di Şebab de ye bersiv nabîne. Helbet ji bo danasîna kesayetiyên romanê yê mîna Xano, Posto, Cewzo, Hemze Çawîş, Dîlber, Mehmûdê

Merekanî, Şebab, Xurşî û hwd. lêkolînek divê, gelo Erebe Şemo ew çend agahdarî çawa bi dest xistiye? Şertên jiyana kurdan ya wê demê çawa hîn kiriye û weke rastiyeke anîye zimên? Destana Xanê Dimdim, an Xanoyê Lepzêrîn (Çengzêrîn) ji mêj ve ye beşek ji edebiyata devkî ya kurdan e û di civatan de tête gotin. Kilamên li ser Xano jî li ser zimanê dengbêjên kurdan her dem hebûne. Lê weke romaneke dîrokî, Erebe Şemo bi awayekî serketî ev bûyera dîrokî ku di nav tixubê Kurdîstana Îranê de qewimiye xweş li hev anîye û kiriye para dîroka kurdan a nivîskî.

Şahê Îranê Şah Ebas, ji bo hêza kurdan ya leşkerî ku di kelê de bi cih bûbûn hîn bike, komek dewrêş dişîne. Lê ew dewrêş berî ku agahdariyan bicivînin, ji aliyê Xano ve tîr girtin. Li gor romanê artêşa Îranê sê çar çaran êrîş anîye ser kelê, lê heta êrîşa dawîn a Serdar Xan bi ser neketiye. Mehmûdê Merekanî cuhên ava ku diçe kelê ji Serdar Xan re negotibûya, belkî têkçûna kurdan pêk nehata. Mehmûdê Merekanî ji ber hin sûcan, ji aliyê Xano ve hatiye cezakirin, hemû zeviyên wî jê hatine stendin. Ew jî li pey heyfa xwe digere, kî û xerezê ji bîr nake. Lewma cihê cuha avê ji Serdar Xan re dibêje.

Xanoyê Çengzêrîn di wê demê de alîkariya Mîrên Şemzînan jî dike û di bin serokatiya Hemze Çawîş de du hezar çekdarên xwe ji wan re dişîne. Hemze Çawîş beriya wê demê, di nava artêşa Osmanîyan de cih digire, pişt re ji wir firar dike û tê Kela Dimdimê cem Xano.

Qulîxan, Huseyîn Xan û Serdar Xan... Her sê bi dor, artêşên xwe dibin ser Kela Dimdimê. Balkêş e ku Huseyîn Xan mirovekî bi navê Sûto Beg ji xwe re dike rêber. Lê belê Sûto, Xan û artêşa wî di riyên fetlanok de digerin, naxwaze wan bi lez bigihîne Kela Dimdimê û berdêla vê alîkariya ku ji kurdan re dike, bi canê xwe dide.

Bi tevayî gava zimanê romanê bête nixrandin, mirov dibîne ku gelekî herikbar û hêsan e û lewma jî peroşa dilê mirov digihîne asteke herî bilind. Bûyer bi hev ve xweş hatine honandin û lewma

miraqa mirov her diçe zêde dibe. Evîndarî, vegotina xwezayê, hestên welatperwerî romanê xweş dinexşînin û bûyeran jîndar dikin, weke sahnayên sînemayê tevgeran tînin pêş çavê xwendevan. (Mînak çekdarên Xano seriyên leşkerên Îranî jê dikin û di kaş û kendalan de gendîr dikin!) Her wiha balkêş e ku di vê romanê de Erebe Şemo gelek kilam û helbest jî bi kar anîye. Di van helbestan de hestên qehremanan tîr zimên,

di stranan de evîndarî vedije û her wisan, şer û qehremanî, trajedî, şikestina berxwedana Kelê, şewitandina xan û malên kurdan, xwekuştina qehremanan tête zimên. Bi vî awayî Erebe Şemo terzê romaneke nûjen derdixe holê û bi alîkariya helbestê nahêle ku xwendekar aciz bibe û herikbariya berhemê bişikê. Weke tête zanîn roman û çîrokên kurdan ji bin bandora edebiyata devkî derneketine, lewma mirov dikare vê berhema Şemo jî weke çîrokek rasteqînî an destaneke serpêhatî qebûl bike ku ew dikare li civatan ji gel re bête gotin.

Dema mirov bi çavê romanên nûjen li vê berhema binihêre, helbet dê kêmasiyên wê hebin.

Her çiqas kitkityên romanê bi hûrgilî ji hev hatibin veçirandin jî, diyalog kê mî. Bûyer zêde ne, lê dema pijandina wan gelekî kurt e, ev jî rengê serpêhatiyê dide berhemê. Afirandina kesayetîyan pir hêsan pêk tê. Di dawiya romanê de cesedê keçikeye xweşik ji aliyê Serdar Xan ve tête dîtin, ew bi darê ve daleqandî ye, diyar e ku xwe xeniqandiye, zêr di destê wê de ne, hemî xweşikahiya giyana wê di rûyê wê de eşkere bûye, bedewiya wê bala Serdar Xan dikişîne, lê belê ew gav leşkerekî Îranî dixwaze zêrên wê ji xwe re bibe, Serdar Xan nahêle. Di romanê de nayê gotin ku ew keçik kî ye, lê eşkere dibe ku ew ji bilî Dîlber ne kesek din e. Ji dêvla ku têkeve destê dijmin, rîya xwekuştinê bijartîye.

e-mail: edipolat@superonline.com



Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr

Cîhan ROJ

Guhdarên ezîz, Yêrîvan xeber dide... Lê lê dayikê..." Xwendevanên ezîz, çendî car e dest pê dikim nivîsê lê bikim lê ew cîhana zaroktî, cîhana welatên dût, dengên dût, xemên kûr li ser dilê min dibe lehiya biharê; zivistana ker û lal bû, asîman çiksayî, berfa sipî nedihîşt tarî bi ser çiyayan de dakeve. Nexweşiya sorikê rojê çend zarok dikuşt. Her kes guhdarê radyoyê bû. Piştî kilam guhdarî dikirin ji devê mezinên me ev gotin derdîçûn: "Lanet bê li dinyayê, me çi xêr ji xwe dît..." Ew deng ji ku de dihat, ew însan li ku bûn, welatê wan jî gelo bi qasî welatên di çîrokan de ji me dût bû... Pirs bi ser pirsê de dihat.

Ez wexta vê nivîsê lê dikim çiqas bextewar im ew qas jî dixwazim fesîh bifikirim. Bextewar im lewre ev e ez ji nivîsên wan kesan, dengê wan, xemên wan, hêviyên wan, êş û kulên wan hîn dibim; der barê wan de nivîsê lê dikim... Ku diltenikî reng bide nivîseke wanî dibe ku ne li cî be lê ev rastiyeke e, lewre min xwest beriya her tiştî ya di dil de, halê aniha tê de me bi we re par ve bikim.

Wexta lijneya kovarê wek babet "Bandora Erebe Şemo ya li ser nîfşên nû" bi rê kir tu tiştî di hişê min de xwe neda der; ji nîfşên nû mebest çi bû, gelo mebest jê wêjeya bakur bû...? Mebest çi be jî em ê nîfşê nû yê bakur li ber çav bigirin. Gelo çi bandora Erebe Şemo li ser nîfşên nû heye? Wê ev nivîs rasterast nebe bersiva vê pirsê; dê ev pirs bibe sedem da em bi gelemperî bandora toreyê, bandora keda rabirdûyê ya li ser nîfşê nû bifikirin. Ji bo em pêvajoya bandorê an jî nebûna bandorê fam bikin me divê em hinekî dêhn û bala xwe bidin awayê pêkhatina wêjeya nivîskî ya kurmançî.

Wek tê zanîn sê awayên herikîna wêjeya kurmançî hene. Ger em her sê awayan nebînin em ê nikaribin wêjeya kurmançî û meseleya bandorê baş têbigihîjin; ger ev her sê rastî bêtin gengêşîn ji derî babeta me wê sedemên hin pirsgrêkan jî xwe bidin der.

1- Herikîna normal; bi awayekî ji awayên normal (şertên derveyî ne tê de) bi hemd herikî ye; her ku carna pir şikestîbin jî em meşînekê dibînin.

Ehmedê Xanî xwe li keda beriya xwe girtiye, bi nîrxandina toreyê riyek herî berfireh û nû li riyên beriya xwe zêde kiriye. Dû re kesên din, Hawar, Cîgerxwîn...

2- Awa û pêvajoya pêkhatina wêjeya kurmançî ya li Qafqasyayê ye ku em dikarin bibêjin di bin îzolasyoneke reş de mûmên xwe pêxistine. Bi jiyana bi xwe re birine, bi ziman, çanda bi xwe re birine, bi cîhana bi xwe re birine di zikê welatan de welatên piçûk afirandine. Wan xwe afirandiye. Ji ber mercên kambax ew nikaribûne li ser rîya beriya xwe bimeşin. Ew derfet di dest wan de tune bûye wêjeya xwe ya rabirdûyê ya nivîskî bikin bingeh:⁽¹⁾

"Haya kurdên Ermenîstanê bi giştî û ya ronakbîrên wan, ku nû rabûn, gihîştin ji wê edebiyata kurdî qet nîn bû, ya ku sedsalên navîn û nû li Kurdistanê çêbûbû. Belkî wana navê yên weke Ehmedê Xanî û Meleyê Cizîrî jî nebihîstibûn, êdî li kê derê ma zanîna ser naveroka berhemên wan.

Ji ber vê yekê jî edebiyata kurdî li Ermenîstanê weke ya milî (netewî) li ciyekî vala, xik û xalî bingeh girt. Ew bi vê fikrê edebiyateke bi temamî, xwerû ya nû bû."⁽²⁾

3- Ji bo pêkhatina pêvajoya wêjeya kurmançî ya li Ewropa û li welêt em dikarin behsa îzolasyona gewr bikin. Her ku gelek cudahiyên din hebin jî di navbera van pêkhatinan de (ya li welat, a li Ewropa), ji aliyê mantelîteya afirandinê û nêzîktêdayîna li keda rabirdûyê û toreyê ve di her du şibakeyan de jî em heman tiştî dibînin; ked û wêjeya rabirdûyê bêtir ji bo wan bûye moral, ji ajîteyê wêdetir neçû ye. Ev qeyranek e. Bingeha heyî û derfetên rabirdûyê ji xwe re nekirine xem. Her tim xwestine bi xwe bibin bingeh⁽³⁾ (Hin kesan wexta jiyana gundê xwe nivîsîne bi awayekî derfetên ziman bi kar anîne, bandora zargotinê xwe daye der lê vê ne wek nêzîktêdayîn xwe daye der. Tiştê ku em dibêjin ev e ku gere di berhemên modern de ziman bi hemû awayan bijiya, vejîya, rê li xwe û derbirîne vebikira) Ev jî bûye sedem pêşî li afirîneriyê bête girtin; xem ne afirînerî bûye, bi piranî "peyame" esas bûye; xwestine peyamê bidin "ê din" da ew jî edebiyatê dikin, berhemên diafirînin. Hiç nebe di destpêkan de ev wanî bûye. Sedemên vê derûniyê gelek in û gelek jê jî ji kesan xwe nadin der. Lê rastiyeke bûye.

Li bakur nîfşê nû jî bi awayekî xwe bi xwe îzole kir; vê jî bandora wêjeya kurmançî ya Ewropa, ji leza bidestxistina wêjeya modern, ji bergeha întelektuelî ya kêmbêr û ji negengêşiyê xwe dida

der. Xwe dida der dibêjim lewre ew mantelîteyên neyînî em dikarin bibêjin edî neman. Dîsa ji ber ku xwendevan tune bû kes di nav rehawetekê de bûn. Nivîskar û berhem xwe bi xwe bûn; ne xwendevan ne jî cîhana wêjeyê ya derve di nav meseleyê de bû!

Jê re dem diviya. Piştî pazdeh sal derbas bûn îro ro nîfşê nû di nav qeyraneke edebî de ye û ev qeyran pozîtîf e; li derfetan digere, li xwe û kêmaniyên xwe mukir tê. Xwedî armancên dût û kûr in, bi rik in. Ji gotinên ên din ên sayakî bêtir dixwaze bi xwe gotinan bibêje, vebêje. Hewlên lêkolînerî xwe didin der. Welhasil rastî hate dîtin ku bi meqseda 'peyam'ê bi tenê meş bê îmkân e. Êdî xemeke wan a hunerî û edebî heye. Ji bo vê jî li bingehên wêjeya xwe, li derfetên derbirînan digerin.⁽⁴⁾ Ev lêgerîn jî di berhemana de bi awayekî dibe riyên berfireh. Ger li van sê çar salên dawîn bête nihêrîn ji gotaran bigire heya berhemana asteke edebî xwe dide der. Nîfşê nû xwedîtî li xwe û li bingehên wêjeyê dike. Ka em dîsa gotinên Wezîrê Eşo bi bîr binin: "Eynî nivîskarên kurd yên salên 30'î êdî yên berê nîn bûn. Ewana xwe bi xwe perwerde dikirin, xwe gihandin, guherîbûn, kurdiya xwe xurt kiribûn û bi ser da jî bûbûn pisporên edebiyata bedew. Ewana şûna helbestên betreng, yên weke slogan, yên tamsarkî, şûna çîrok, novêlên wek gotaran basît, ne xwezayî, dest bi nivîsandina helbest, destan û romanên bi naveroka kurdî, bi ruhê kurdî dagirî yên bi zimanê gorî fikirandina xwerû kurdî kirin û

berhemên hêja, vê carê bi sêwiya hunerî û bedewiya bilind dane xwendevanên xwe."

Ev rastî xwe dubare dike. Ger em li babetê bizivîrîn em dikarin bibêjin bi tenê ne bandora Erebe Şemo bi gelemperî nîfşê nû ji derfetên rabirdûyê bêpar ma, xwe bêpar hişt. Îro ro bi gavên herî fesîh ber bi vî rastiyê ve dimeşin; bi dû ketine bi her awayî rabirdûyê, derfetên rabirdûyê têbigihîjin. Ev jî ji her hêlî ve tê kirin; di helbestê de bingehên çandinî xwe didin der, kovar di nav lêkolînên berfireh de ne, weşanxane hewl didin bi dehan klasîkan biweşînin, dîsa weşanxane hewl didin berhemên wekî çîrokên hezar û şevekê bi kurmançî werbigerînin...

Ez dê pirsek herî berfireh li vir bi cî bikim; ji bilî bandora kesên binavûdeng, ji bilî bandora zargotin û derfetên derbirîne yên bi kurdî gelo çi bandora çand û keda Mezopotamya li ser wêjeya kurdan heye? Gelo, anihî, li dinyayê kîjan wêje hewl dide careke din rê bide wan çavkaniyan? Gotineke têra xwe bi bar e, rast e, lê ger em şibakeyê ev qas berfireh li ber xwe vebikin wê çaxê em ê bikaribin dengekî, renekî, riyekê li wêjeya cîhanê zêde bikin. Belkî ji heya niha dosyeya sereke ya bihata gengêşin gere ya bi navê "Mîrateya Çandên Mezopotamya" bûya. Em hê di destpêkê de ne.

e-mail: cihanroj@hotmail.com

Têbînî:

⁽¹⁾ Ger em bi çavêkî din binihêrin belkî ev weke encam şensek e; lewre ew neçar mane folklorê xwe bikin bingeh. Di serî de Erebe Şemo bi tevahî wêjeya Qafqasya ya salên siyî folklor e, jiyana folklorîk e. Ji bo têkiliyê di navbera wê û Erebe Şemo de pêk bê, we divê hûn bi derfetên folklorê xwe ne biyan bin. Mixabin biyanbûneke mezin heye)

⁽²⁾ Wezîrê Eşo, çend dîtin li ser edebiyata kurdî li Ermenîstanê, kitêbxaneya kurdî.

⁽³⁾ Li vir pêwistî pê heye têkiliya tore û modernîzmê jî neyê jîbîrkirin. Hiç nebe wêjeya rabirdûyê ya kurmançî bi çi çavî li toreya nihêriye gere bête gengêşin. Lê bi tevî hemû sedemên jî nîfşê nû jî heya niha bi gelemperî nezikîtdayîna xwe ya li toreya zelal nekiriye; heta, bi navê modernîzmê tore red dikir û bi vî awayî di hewlên avakirina wêjeyê modern de pîrsgirêkan xwe da der. Ger nîfşê nû toreya bigengêşiya, têbigihîşt, rexne li toreya bigirta wê bingehê rexnegiriyê jî xwe bida der, dîsa wê hewlên avakirina berhemên modern jî bêtir bi ser biketa.

⁽⁴⁾ Di wê pêvajoyê de, wexta kesane xwe bi awayekî îzole kir bêtir ji derfetên derbirîne bêpar man. A rast carna ev bi qestî dihat kirin lewre xwendevan bi mantiqê kurmançî û derbirîna kurmançî biyan bû. Ku nivîsek bi mantiqê tirkî bihata nivîsin bêtir li xweşiya xwendevan diçû! Sedemêkê din jî ev bû ku nivîskar bi dû derfetên derbirîne nediketin. Ev jî sedemêk bû têkiliyê di navbera wan û toreya de, berhemên rabirdûyê ve pêk nedihat. Ev minaka ha hem vî rastiyê hem jî gelek rastî û tiştên din der dike:

"ÇAVREŞ GELİYOR!... Birbirinden özel kapak dosyaları, Renkli söyleşiler, çarpıcı makaleler, Magazin, kültür-sanat, edebiyat ve Daha fazlası ÇAVREŞ'te..."

ÇAVREŞ TÊ!... Dosyayên bergan ên ji hev taybetitir, Hevpeyvînên rengîn, gotarên balkêş, Magazin, çand-huner, edebiyat û hê Zêdetir, di ÇAVREŞê de..." (Kovara Esmer, Kewçer, 2006)

Rastiya ha راستiya gelek berhemên bi kurmançî ye; helbet ne mimkun bû da derbirîna kurmançî mohra xwe li berhemana bida lê pîrî berhemana bi kurmançî nedihat fikirîn, bi zimanê biyan dihat fikirîn û li kurmançî dihat wergerandin. Mesela ev tekstê vegotîna an jî agahdarî bi kurmançî

bihata fikirîn wê bi vî awayî nehatibûya nivîsin. Ev minakek bû ji ber ku sedemên gelek problemên derbirîne bi vî rastiyê ve girêdayî bûn me bihart. راستiya me hemiya n e bi awayekî.

Nîşe:

Wexta ez ji bo babetê bi dû materyalan ketim, ji nû ve min nivîsên derbarê wêjeya Qafqasyayê de xwend, hin tişt û nişeyan xwe di dil û hiş de da der. Ev nîşe bi mijara me ve ne girêdayî ne û ihtimal e di nav nivîsên din ên dosyayê de cî bigirin. Bi awayekî kurt ez ê lê bikim.

Beriya vî ez ê behsa filimekî bikim. Leheng kurdek an jî kurdên êzîdî ne. Di nav êş û xwînê de tîrîngî kirin. Diçin welatekî. Li wî welatî jî dikevin şer. Dimirin. Zarokên wan di sêwixaneyan de mezin dibin. Ew zarokên di sêwixaneyan de mezin dibin dest pê dikin deriyekî li wêjeya xwe vedikin. "Bavê Miletan"! Bi tevî hemî insanetiya xwe, wan jî sirgûnê careke din sirgûn kiriyê, şandiyê Sibiryayê! Bi rik, ev kesên bi xeyal li ser piyan man. Piştî mirîna "Bavê Miletan"! Ew dîsa bi ser rîya wêjeya xwe ketine. Ev şîrid jî şîridên filimekî nekişandî ye.

1. Karapetê Xaço gotiye (Ji hevpeyvîna bi Mehmet Aktaş re): "Em pîrgî hev dihatin, ez dibirim xwaringehê. Ji her kesî re digot hevalê min Karapet jî welat hatiye. Wexta hatiye jî hemû dengên welatê min kiriyê bîrîka xwe û aniye. Erebe her tim jî min dixwest ez Derwêşê Evdî bibêjim."

2. Bavê Nazê di sala 1972'an de hevpeyvînekê pê re kiriyê. Ji hevpeyvîne: Bavê Nazê: Qewetiya we ji bo nivîskarên nûhatî çi ye? Erebe Şemo: Xwendin, dîsa xwendin û ez careke din dubare dikim; xwendin.

3. Ji nivîseke Temûrê Xelîl: Nivîskarê kurd yê mezin Erebe Şemo gava guh dida sazbandiya Xelîlê Evdîlê û Şamilê Bêko, digot:

"Gava Xelîlê Evdîlê li meyê dixê, mar li kêleka te der baz bibin, li te naxin. Lê gava Şamilê Bêko li fiqê dixê, hetanî dûpişk jî direqisin."

Gelo hewceyî gotinê ye bê wexta însan jî hin berhem û keda beriya xwe bi dût bikeve xwe jî çi dike, ji çi bêpar dimîne. Û bi derbirîne kurdên Qafqasyayê, nîfşê nû wexta xwe hilda. Gul vedidin. Em dê rengên heya ber perê asîman bibînin...

Kesayetiya Edebî ya Erebe Şemo

Ayhan MERETOWAR

Ji bo ku em bi awayekî baş bi hunera edebî ya Erebe Şemo serwest bibin, divê em hinekî li jiyana wî, hevdemên wî û rewşa edebiyata rûs, edebiyata ermenîkî, edebiyata tirkî û edebiyata kurdî bikolin.

Heta xwezî me bi rewşa edebiyata gelê ermen a wê hingê jî bizanibûya. Bi zena min Erebe Şemo, ketiye bin bandora wê şêwaza romana ermenîkî. Em ji romanên edebiyata ermenîkî ku li tirkî û kurdî hatine wergerandin, pê dihisin ku jiyana gundî û rêncberan, bûye mijara romana wan.

Lewre nivîskarê kurd ê ku cara ewil romana kurdî nivîsandîye, digel kurdî hem bi zimanê rûsî hem bi zimanê ermenîkî hem jî bi zimanê tirkî dizanibûye.

1897; Salên ji bo gelê kurd qerisî û bajarê Qersê. Erebe Şemo hîna nû çavê xwe li dinyaya gewrik vedike. Qernê nozdehan li ber qedîne ye. Sedsala şer û dehşetê dest pê dike. Herba Mezin a Dinyayê û salên 1913'an. Erebe Şemo yê gundî, di bihara jiyana xwe de, bi ber ba, bahoz û gêdûka kirinên emperyalistan ketiye, bi erdê re kaş û berkaş bûye; hatiye di kar û barê rêya hesinî de dixebite. Sal 1916 e, ev ciwanê gundî, 19 salî ye. Di kelekela xortaniyê de, fikrên bolşevîkan li dilê wî bar dibe. Pey re hebs û girtin; eskerîti û têkoşîn, dor li hişê wî digirin. Dikeve nava Artêşa Sor. Di nav toz û dûmana herbê de, bere bere agirê edebiyatê jî di hinava wî de pê dikeve û mij û morana rizgariyê, serî lê gêj dike. Ku tehsîla dibistana bilind, li ciyekî mîna Moskovayê dibe nesîbê Erebe Şemo, ji êtûna herbê difilite. Piştî ku rê li ber vedibe û sala 1924'an li Ermenistan û çar salan pişt re li Lenîngradê, di Enstîtuya Rojhilat de dixebite, êdî çik ji ber pênûsa wî diçin. Tevî Îsak Marogulov û H. A. Orbelî dixebite, sala 1929'an, elfabeya latînî ya kurmançî amade dike. Salek pişt re (1930) êdî rojnameya

Riya Teze derdixin. Çawan ku bi navê "Dîroka Şoreşa Oktobirê" û "Jînameya Lenîn", çend berhemên wî yên bîrdozî derdikevin, hema tavilê dest bi edebiyata kurdî dike. Ji bo gundiyan jî, pirtûkên mîna "Kolxoz û Kara Wê Ji Gundiyan Re" çap dike.

Ew û Qanatê Kurdo ku paleyekî xîretkêş ê kurdî ye, mîl didin hev û din li ser rêzimanîya kurdî dixebitin. Haya wan ji edebiyata rûs, edebiyata cîhanê û rewşa edebiyata bêxwedî ya kurdî baş heye. Hema hema hemû çêsnên edebiyatê, gur û geş bûne. Tenê bêwana edebiyata kurdî beyar e.

1935 e. Salên xer û xalî yên edebiyata kurdî. Serdema sirgûna mezin a dildarên edebiyata kurdî... Di edebiyata kurdî de, çêsnê romanê, cara pêşîn derdikeve hemberî kurmançan:

Şivanê Kurd...

Çawan ku em edebiyata kurdî bidin ber edebiyata cîhanê, divê em romana kurdî jî bidin ber romana cîhanê.

Cara pêşîn, bîngeha çêsnê romanê, heyama Ronesansê, li welatê Îspanyayê, ji aliyê Migel de Cervantes (1547-1616) ve, bi berhema bi navê Don Kîşot hatiye hilberîn.

Em zêde li ser edebiyata rûs nasekinin; lê belê ji ber ku ji berê ve, piraniya gelê kurd, di nav gelê tirk de bûye, em dikarin romana kurdî (bi taybetî romana Erebe Şemo) bidin ber romana tirkî.

Zimanê tirkî, zimanê dewletê ye; zimanê kurdî jî di heyama xwe de, digel zimanê erebî, zimanê jiyana rojane û zimanê medreseyê ye. Sedsala nozdehan, weke gelek zimanên gelek neteweyan, ketiye ber pêl û mewcan. Serdema Tenzîmatê, çawan ku di hêla siyasî de gelek guherîn pêk anîn, di hêla edebiyatê de jî, guherînên dîrokî çêkin.

Romana tirkî, piştî salên 1860'î dest pê dike. Serê ewil, romana frensî li tirkî hatiye wergerandin. Romana pêşîn ya ku ji edebiyata frensîzan li zimanê tirkî hatiye wergerandin, "Macerayên Telemahos" e. Nivîskarê vê romanê, François Fénelon e. Ev roman, sala 1699'an hatiye weşandin. Bi qasî du sedsalan paşê çêsnê romanê dikeve edebiyata tirkî. Yûsûf Kamil Paşa, sala 1862'an ev li tirkî wergerandiye. Lê belê weke romana edebî ya pêşîn, romana Namik Kemal a bi navê 'Întîbah' hatiye qebûlkin.

Hêjayî meraqê ye bê ka gelo romana pêşî ku li



Cudahiya edîbên me ji edîbên cîhanê heye ku ew jî, bê bandorbûyina wan a ser siyaseta neteweyî ye. Edîbên gelan, wisan kirin ku siyaseta neteweyî jî, li ser bingeha rizgariya neteweyî ser û guhê xwe bide hev û yekîtiya milî pêk bîne.

kurdî hatiye wergerandin, çi roman e, romana kîjan edebiyatê ye û kê li kurdî wergerandiye?

Ji bo ku em bi hunera edebî ya vî nûserê xwe serwest bibin, em dê ji van hêlan ve li berhemên wî binihêrin:

Zihniyeta romana wî, binesaziya berhemên wî, mijar, tema, ziman, vegotin, kevneşopiya berhemên wî û jiyana nivîskêr.

Aliyê zihniyeta berheman, li ser rewşa jiyana olî, siyasî, civakî, aborî, medenî/sivîl û eskerî ya serdema nivîsandina berhemê ava dibe. Zihniyet, di jiyana civakê de, wextê serdema berhemê çi be, rasterast dadiwerive berhemê. Em di berhemên nivîskarî de, rastî liberxwedana etnîkî tînin. Çanda neteweyî ya gelê kurd, bi awayekî xurt mora xwe li zihniyeta berhemên wî daye. Zarotî, xortanî û navseretiya wî, bi awayekî dilkovanî werivîye berheman. Koçerên kurd ên Qafqasê, li dora bîranînên dewra zarotî û xortaniya nivîskar, bi

hosteyî weke berr û mafêreke rengîn li ber çavê xwendevanan hatiye raxistin. Di beşên dawîn ên romana xwe de jî nivîskarî, behsa bûyerên dema şoreşa 1917'an, şerê li dijî emperyalîstan û şerê navxweyî jî dike. Her wiha roman, zehmetî û dijiwariyên parastina destketiyên piştî şoreşê jî dike û bi awayekî serketî wêneyê demê teswîr dike.

Zimanê wî, heta mirov bibêje bes rewan, henûn û zelal e. Em ku bala xwe didin çavnihêrîna wî, bi rehetî em dibînin bê wî, çiqas dil bi jiyana gelê xwe şewitandiye. Hem bi hesreta gelê xwe diqilqile hem awayê entîke yê jiyana gelê xwe dide hem jî wer dixuyê ku wî qet navê ku ev kevneşopiya wan wenda bibe. Weke parêzvanekî vê kelepura ku li cîhanê, li nav gel û dewletan bê pişt û bê al maye, pê kutaye erdê, zor daye xwe da rengîniya jiyana xwe digel jiyana gel bixe bin banê edebiyatê.

Bêguman haya E. Şemo ji kurdîperwerên dewra wî heye. Serdema wî, serdemeke wisan e ku êdî tu hêvî û bendewariyeke gelê kurd bi rizgarî û dewletbûnê nemaye. Di serî de Mala Bedirxaniyan, Mala Eliyê Ūnis, Mala Şêx Seîdê Paloyê, Cemîl Paşayê Diyarbekirê, Seyîd Rizayê Dêrsimî û esilzadeyên din, destvala ji serhildanan derketine û weke çareyeke dawîn, bi her du lepan bi ziman, edebiyat û zargotina kurdî girtine. Erebe Şemo jî zor daye vê hêlê. Ev serdem, bi awayekî ji awayan, weke "kevneşopiyeke edebî ya sedsala nozdehan e di sedsala nozdehan de. Edîbên bi navûdeng ên ji welat ajotî (sirgûnkirî) yê mîna Xelîl Xeyalîyê Motkî, Evdirehman Rehmiyê Hekarî, Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrîcan û Cegerxwîn, nûnerên vê serdemê ne.

Kevneşopiya gelperweriyê ku ji nav welatên Ewropayê za, çawan ku bandora xwe li gelên din ên cîhanê kir, wisan jî li zana û welatparêzên me jî kir. Ev neteweparêzî, di nav edîbên kurd de jî wê hingê bûye kevneşopiyeke bingehxurt.

Cihêrengiyeke edîbên me ji edîbên cîhanê heye ku ew jî, bê bandorbûyina wan a ser siyaseta neteweyî ye. Edîbên gelan, ji xeynî gelê kurd, wisan kirin ku siyaseta neteweyî jî, li ser bingeha rizgariya neteweyî ser û guhê xwe bide hev û yekîtiya milî pêk bîne. Mixabin di nav gelê kurd de ev pêk nehat. Piştî çendakî edebiyata kurdî jî, ji ber bêpiştgiriya welatparêzan, li aziyê ma û neçar bû ku bê deng bimîne. Xewn û xeyalên edîbên mîna Xelîl Xeyalîyê Motkî, Evdirehman Rehmiyê Hekarî, Mîr Celadet Bedirxan û E. Şemo jî, bi hatina Stalîne sirgûnkar, bi avê de çû.

Her Ew Hesret û Ew Xwezî

Serwet DENÎZ

Wek her nivîskarî/ê Erebe Şemo ji şahidê dewr û dema xwe ye. Gava ku mirov berhemên wî dixwîne gelek bûyerên wê demê tê de dibîne. Ji gelek hêlan ve rewşa civakî ya wê demê girtiye dest û ragihandiye xwendevanan. Tenê rewş tespît nekiriye her wisa sedemên pîrsgirêkan jî gotiye û riya çareseriyê jî nîşan daye. Em ji jîyan û berhemên wî dizanin ku ji bo çareserkirina pîrsgirêkan jî ji dil û can xebitiye. Lê di hêlekê tenê de na, di gelek hêlan de. Ji politikayê bigire heta perwerdehiyê, ji weşangeriyê bigire heta nivîskariyê her tim wek serkêşekî xebitiye.

Ji bo ku mirov rewşa civakî ya di romanên wî de binirxîne divê mirov rewşa welat a wê sedsalê binirxîne. Her kesê/a ku bûyerên dirokî hinekî vekolabe dizane ku di sedsala nozdemîn de li seranserê welat serhildan û berxwedan hene. Dewleta Osmanî dixwaze pergaleke nû ava bike ji bo ku vê pergaleke ava bike ji divê mîrnîşîniyên kurdan ên mayî jî (heta wê gavê êdî gelek dever bi destê walî û qeymeqamên Osmanî dihatin birêvebirin. Mîrekên kurdan ji ser axa xwe hatibûn derekirin.) ji holê rake û astengiyan li pêşiya xwe nehêle. Di vê sedsalê de civaka kurd bi her awayî serobino dibe. Tu kes li ser av û axa xwe namîne. Her hozek, her bavikek, her malbatek bi aliyekî ve direve. Hinek jê jî ji welat tên derekirin. Nexweşîn, birçîtî û belengazî li her derê serdest e. Heta wê sedsalê kurd di bin nîrê osmanî û îraniyan de dijîn. Di serê sedsalê de êdî ûris jî dest davêje Kurdistanê û gelek caran herêma Serhedê dest diguhêre. Di dawiya sedsalê de di navbera kurd û ermenan de jî nakokî derdikevin. Di nav vê deryaya aloziyan de malmezînen kurd carê xwe bi serdestekî ve digirin û feqîr û belengaz jî her di bin lingan de dipêçiqin. Erebe Şemo jî ev rewş raxistiye ber çavan. “mexlûqat birçî bû, ji birçîbûna nizanibûn çî bikirana, ku da biçûna. Hema wan salan xolor (kolera, kulemar, navêş) ketibû nav cimaetê merî dimirin. Malê kesiba tune bû ew mal, wekî wê zivistana çûyî merî jê nemirana, yê (bi) biharê

ketibûn, ew jî bi koka gûnî û pincara hişkîrî ji dest xwe diçûn.” (Jiyana Bextewar) Lê divê em vê yekê jî ji bîr nekin; heta wê gavê wekhevî û azadî tune be jî hilberîneke bi pergal heye. Hinek hoz bi çandiniyê hinek jî bi xwedîkirina pez û dewaran debara xwe dikin. Bajarên wek Erzerom û Amedê di nav aboriya Dewleta Osmanî de xwediyê cihekî girîng in. Çolangiya Amedê navdar e. Gelek ber û berhemên çandinî û pezxwedîkirinê tên firotin. Ji ber şer û aloziyan pergala aborî jî hildiweşe. Berhemên ewropiyan ên ku di dezgehên nûjen de tên hilberandin welat dagir dikin. Dezgehên heyî têk diçin. Jixwe em gelek agahiyên ji bazirganên wê demê yên ku hûr û mûr anîne li van deran firotine hîn dibin. Di nava şer û pevçûnan de ne pêkan bû ku hilberîneke rast û durist pêk were. Kesên ku dê çerxa hilberînê bigerandina ya biribûn leşkeriyê ya jî ji ber nîrê leşkeriyê reviyabûn li serê gaz û bêlana rêbirî dikirin, rêwî dişêlandin.

Nivê pêşîn ê sedsala 20'î hê ji sedsala 19'î jî kambaxtir e. Şerê cihanê yê yekemîn dest pê dike. Herêma û civaka ku Erebe Şemo girtiye dest bixwe jî eniyeke şer pêk tîne. Piştî şer jî eniyeke şoreşê ye. Aloziyên şerê yekemîn û şoreşê hê neqediyane, şerê cihanê yê duyemîn jî digire ser. Mirov dikare bibêje di wê heyama ku Erebe Şemo girtiye dest de jiyaneke civakî ya asayî tune ye. Her rewşa awarte ye. Pergala heyî hilweşiyaye, pergaleke nû ava nebûye, guherîneke bi lez û bez heye. Hinek vê guherînê dixwazin û zû hîn dibinê û hinek jî li ber xwe didin da ku tu tişt neguhêre û wek xwe bimîne. Carê pêlek dertê ser. Di nivê sedsala 19'emîn yê paşîn û nivê sedala 20'ê yê pêşîn de rewşa giştî ev rewş e. Serdema ku bûye mijara berhemên Erebe Şemo jî ev serdem e. Dimdim ne tê de.

Li gor ku em ji berhemên Erebe Şemo fêhm dikin, dewletên serdest di ser her kes û her tiştî re ne. Çi bixwazin didin kirin. Carna ew bi xwe dikin, carna jî bi xulamên xwe didin kirin. Çi bac û xeracê bavêjin ser gel mecbûr e ku bê dayîn. Ku neyê dayîn pêkutî û dagirkerî dest pê dike. Di vê hevbirinûanînê de hoza ku serî rakiriye, nêzî sînora be direve derveyî sînora ku nêzî çiya be xwe davêje bextê çiyayan. Ku her du derfet jî nebin demekê li ber xwe didin û paşiyê radestî dewletê dibin. Dewlet jî bi çamika stûyê wan digire davêje herêmeke dinê. Hoz li aliyekî tê avêtin serokê hozê li aliyekî din. Bi kinasî raya her tiştî di destê dewletên serdest de ye. Li gor berhemên Erebe Şemo dewletên ku li ser civaka kurd desthilatdarî kirine; Rom (Osmanî), Îranî, Împeratoriya Îris, Ermenîstan (Dema desthilatdariya Partiya

Taşnakan), Gurcistan (Dema desthilatdariya Menşevîkan), Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetî, Tîrkiye. Ji wan berjêrtir begên kurd hene ku di kedxwariyê de ji dewletan ne kêmtir in. Her yek xwediyê çend gundan e. Çend kerî pezê wan heye. Heta ku olama wan hebe gundî nikarin tu karê xwe bikin. Karê wan ê navmalê jî ji aliyê jin û qîzên gundiyan ve tê kirin. Mafê tu kesî tune ku devê xwe li ber wan qul bike û bibêje ‘pit’. Ku yek bê hemdê xwe be jî çewtiyekê bike çermê piştê wî bi daran ve radiibe. Ew dikarin bi dek û dolaban heqê şivanan nedin, bi ser de wan deyndar derxin û ji çend salan carekê kulavekî nû ji wan re nestînin. Di zivistanên xedar de ew şivanên nîvtazî ji sermana nexweş dikevin û dimirin. Lê dîsa jî deyndarê beg in. Lewre wî şivantiya xwe nebiriye serî û mafê wî yê mirinê tune ye. Ku deyndar bimire wê ew deyn ji can û cesedê jin û zarokên wî bê derxistin.

Silêman Beg û Evdila Beg ên bira ku du lehengên romana ‘Jiyana Bextewar’ in kedxwarên herî har in û kî desthilat be ew xulamên wî ne. Bi hêza ku ji dewletan digirin gel diçewisînin. Gel dişêlînin. Hem bertîla xwe distînin hem jî ya rayedarên dewletê. Pariya nan ji gewriya xizanan derdixin ji siltanê romê an jî leşkerên taşnakan re dişînin. Ew torin in ango tov rind in. Qaşo tove wan û bav û kalên wan ji tove gel rindtir e. Lê tu li rastiye binihêrî tove herî bi zîwan û xurî ye wan e. Ku tove wan neriziyabûya, gava ku ji birçîna dest û lingên mirovan diwerimîn û dimiriyan û neşartî diman wan dawet li dar nedixist û nan û avên giran nedidan malmezînen wek xwe. Erebe Şemo rewşa wan wiha daye xuyakirin; “Gava ku ji ber derê Resûl Axa bîna nanê petî û qeliyê kete nava gund, çend kesib, jin û zarê birçî temûl nekirin, hatine ber mala wî. Ciyê qelî diqelandin dûr va sekinîbûn stûyê xwe xwar kiribûn lê dinihêrîn. Waxtê te (li)wan meriyê birçî dinêhêrî, ewe pirçûkirî bûn, çavê wan çûbûne kort, dest pê wan werimîbûn. Dûr va meriv tirê xurt bûne, hema ku meriv nêzikî wan dibû, dihate xwanekirinê wekî ewana werimîne.”

Taybetiyeke din a van began jî ew e ku di dibistanên dewletên serdest de xwendine, ji aliyê serdestan ve hatine perwerdekirin û bi hişê xwe bi dewletê ve hatine girêdan. Mekteba Eşîretan û Alayiyên Hemîdî mînakên herî ber bi çav in. Di berhemên Erebe Şemo de hindik be jî qala van dezgehan tê kirin. Li aliyê Êris jî dezgeheke ku torina wek serbaz digihîne heye. Ji ber ku beg di dezgehên dewletê de tên perwerdekirin tîkiliyên wan ên bi dewletê re xurt in. Ku kesekî/ê bikujin jî kes dengê xwe ji wan re nake. Tenê ji bo rojekê bi mêvanî diçin bajêr, bi qeymeqam

û milaziman re têr dixwin û vedixwin û paşê vedigerin tîn mala xwe. Di destê mexdûran de jî tenê dimîne nifir ku ew jî alaveke ko ye, tiştêkî nabire. Di romana ‘Jiyana Bextewar’ de beşa ‘Seyrana Belengaz’ ji bo van kirinan mînak e. Tenê begên kurd vê yekê nakin. Yên ji gelên din jî bi heman awayî tevdiagerin. Wek Molokan ên ku Erebe Şemo bixwe demekê li ba wan şivantiyê dike. Piştî began dewlemend (Hempa) tên. Ew bixwe ne tovrind in. Lê bi bazirganî û selexuriyê dewlemend bûne. Di tengasiyên wek şer, nangiranî û xelayê de xelkê dipertînin. Ne xişrekî, ne cileke nû, ne jî tiştêkî din nahêlin, tevî bi erzanî, bergîdana loqek nan berhev dikin. Şer ji bo xizanan birçîbûn û mirin e lê ji bo wan derfeta zêdekirina mal û milk e. Ew çikûs in, çavbirçî ne, pintî ne, ji malê xwe têr naxwin. Bi jin û zarokên xwe jî nadin xwarin. Her tim bi began re radibin û rûdinên. Ji wan hêzê digirin. Ew hempayê wan in. Ji dewlemendan berjêrtir pî (xweşhal) hene. Wek ku ji navê wan xuya ye rewşa wan a aborî baş e. Bêyî ku mihtacî hinekên din bibin debara xwe dikin. Lê nikarin mal û hebûnê berhev bikin. Ji aliyê civakî ve bi hempa û xizanan re di tîkiliyê de ne. Di tevgerên xwe de di bin bandora her du hêlan de jî dimînin. Kî di guriyê de be ew li ba wî ne.

Li qata herî jêr feqîr (ciwêlek) hene. Di civakê de yên ku herî zêde tên çewisandin û keda wan tê xwarin ew in. Tevahiya nexweşîn, birçîtî û tazîtî para wan e. Di civakê de yên ku hejmara wan herî zêde ye ew in lê ji her tiştî bêpar in. Bac û xeracên herî zêde ew didin. Di şer de pêşiyê ew tên kuştin. Dîmenek ji şerê cîhanê yê yekem; “Li gundê kurda da wan roja gele mala da şîn û girîn bû, çimku meriyê wan ji olamê venegeriyabûn, bê ser û berate unda bûbûn...” (J.B.) di domana şer de rewşên hîn kambaxtir dertên holê. Tenê yên ku diçin şer namirin, ên mayî di halekî xerabtir de ne. Ne dikarin miriyên xwe veşêrin ne jî dikarin şîna xwe bikin. “.... Lê îcar merî ku dimirin, şîn nedikirin, merî wisa bêqewet bûbûn, wekî nikaribûn merîkî bibin çal kin. Hine mirî çend roja diman neçalkirî. Hesenê Qaso ew çend roj bûn miribû. Kesek tune bû çal kira.” (J.B.)

Rewşa xizanan her tim wiha ye piştî şoresê hinekî diguhere, baş dibe, bîna mirovan dertê wek gelên din kurd jî ji bo pêşveçûnê gelek xebatan dikin. Bingeha civakeke nû datînin. Gelek tiştên ku gihîştine roja me berhemên van xebatan in. Bi taybetî jî xebatên di hêla perwerdehiyê de. Lê ev dem jî zêde najo şerê cîhanê yê duyemîn digire ser. Dîsa hinek diçin û venagerin mala xwe. Zarokên wan sêwî dimînin. Wek ku tê zanîn piştî şoresê êdî



Di Salên 1950'yî De Rewşa
Kurdên Ermenîstanê

beg û hempa namînin. Rez û pez tev dibin ên gundiyan. Pergala kolxozvaniyê li gundan serdest e.

Li gor berhemên Erebe Şemo di nav kurdan de du awayên hilberînê hene. Yek jê çandinî ye ya din jî sewalvanî ye. Ji derveyî van karan hemalî li pêş e û dema ku ûris riya hesinî çêdike hinek kurd tê de wek karker dixebitin. Ji derveyî van karan ên din pir kêr in.

Hozên koçer pez xwedî dikin. Havînê diçin zozanan, payîzê vedigerin germiyanan. Debara xwe bi berên pez dikin. Payîzê gava ji zozanan vedigerin rûn, hirî, toraq û hwd. û pezê zêde dibin li bajêr difiroşin û pêdiviyên zivistanê distînin. Di jiyana koçeriyê de rojên girîng ên ku wek cejnê tîn pîrozkirin hene. Wek beranberdanê. Di koçeriyê de tiştê herî balkêş jiyana şivanan e. Ew mirovên xizan in ji bo debara xwe havînê şivaniyê dikin, zivistanê jî diçin bajêr dixebitin. Li zozanan carna bi mehan çavên wan bi kesî nakeve. Bi hesreta xwarineke germ in. "... di hatina me ji deştê ber bi zozanan ve, di ser kevir û zinaran re em pêxas gihaştibûn jor. Ji dirih û daran, cilên me diqetiyên û em bi kincê zezilî diman... diviyabû ku xwarina germ tu car neyê bîra me. ... her du sê hefte carek min dikarî serîkî bidim mal ... bav û birayên min... ewan bi mehan rûyê malê nedidît". (Şivanê Kurd) Ku xwediyê kerî bi însaf be desturê dide ku tevahiya havînê pezekî serjêbikin, wekî din çi kêr bibê ji heqê şivan tê birîn. Carna şivan tazî vedigerin ser mala xwe. Tu hêza wan a ku li hember zilma began li ber xwe bidin tune ye.

Hozên ku bi çandiniyê re mijûl in bi piranî di gundan de niştecih in. Ligel çandiniyê pez û

dewaran jî xwedî dikin. Erdê ajotinê yê beg û maldaran e. Yên xizan, xulam û olam in. Cotê beg û maldaran dikin debir û giyayê wan diçinin. Bejê serê zinaran ya para wan dikeve yan jî nakeve. Ji zivistanê tim bi fikar in. Tîrsa wê her tim di dilê xizanan de ye. Wekî din jî her tim xelayî û nangiranî ye. Kesên ku wê hilberînê bikin di şeran de dimirin. Hêza hilberînê ji holê radibe, civak bi paş ve diçe. Ji bo ku mirov rewşê baş fêr bike ev mînak girîng e; hê dema dawiya

sedsala nozdemîn genim tê çandin û mirov nanê genimî dixwin. Lê ji ber paşveçûna hilberînê, piştî şerê cihanê yê duyemîn jî hîna hinek gund nanê ceynî dixwin.

Hinek bac û xeracên ku tîn stendin; pêşkêş, teşîr, maledû, bêgar, diş kîrasi (gava ku karmendekî osmanî tê li mala yekî nan dixwe kirêya diranê xwe ji xwediyê malê distîne.), xûgî, xerca begitiyê, beşa dextlê, beşa koçeriyê, suxre, qemçûr, "Nav kurmanca da edetêd kevne hila li welatê romê hebûn, besa xeberê, kê qîza xwe dida mêr, gerekê ji wî qelenê bavê keçikê ku distend erhede hinek bigihîştê beg, xortê ku dizewicî, ewî jî pêşkêşek dida beg, wekî malxê malê bimira, mîrata wî gerekê du par bigihîştê beg. Lê meriyê mînanî Evdila Begê, qet tiştê nedihîşt zarê wî meriyê mirî ra." (JB)

Gelên ku navê wan di berhemên Erebe Şemo de hene û li herêma ku bûyer lê diqewimin dijîn; Kurd, Tirk, Ecem, Ermen, Êris, Gurcî, Rûm, ev bi hev re li ser heman axê dijîn. Di navbera wan de dostanî heye. Lê bi şer re ev dostanî ji aliyê serdestan ve tê xerakirin.

Qada ku bûye mijara romanên Erebe Şemo; bi giranî herêma serhedê ye. Bûyer bi piranî li vî herêmê diqewimin lê paşê ev qad fire dibe. Digihîje heta Moskovayê, Sibîryayê, Ûkraynayê û Belarûsê. Mirov dikare bibêje ev qad ji Sîpanê Xelatê heta Sibîryayê ye. Kurd li Ermenîstan û Gurcîstanê niştecih in û Erebe Şemo jî bi piranî jiyana kurdên Ermenîstanê ji xwe re kiriye mijar. Firehbûna qada jiyana bi xwe re firehbûna têkilîyên civakî jî tîne û ev yek bivê nevwê bandorê li jiyana dike û bi xwe re guherîna tîne.

Têkiliyên navbera hozan; li hember hev çavnebariyê dikin. Hev talan û tajan dikin. Digirin ser gundên hev. Ev kirinên nepak tev bi destê zilamên began tên kirin.

Me digot qey hinek tişt tenê li Tirkîyeyê hene û tenê li Tirkîyeyê bi wî çavî li kurdan tê nihêrîn lê em dibînin ku ne wisan e. Li derên din jî bi wî çavî li kurdan dinihêrin. Kurd tenê wek hemal, dergevan û xulam tên dîtin. Ev axaftina li jêr vê yekê diçespîne. “Rokê Sehîd merema xwe ji axê xwe ra got, wekî ew dixwaze bixwîne. Axê wî gure bû, xweyê pastaxanê bû, bi hêrs li Sehîd nehêrî got: wekî tu bixwînî, lê kê bixebite? Ancax pera qezenc kî xwe xweyî kî. Perê bavê te hene, wekî te bide ber xwendinê? Ji wê şûnda kurd gişk hemal in, xulam in û dergevan in, çi te, çi xwendin e.”(J.B.) Dema ku Erebe Şemo li Qersê di mîtinga Bolşevîkan de diaxive jî heman tişt tên gotin. Nayê bawerkirin ku wê kurdek bibe Bolşevîk.

Lê divê em bizanibin ka çima ev yek wiha ye. Kurdên ku li gundan dijîn sewalvanî û çandiniyê dikin. Bi pîranî jî yên xizan ji karên wekî din fêmanakin. Gava ku mecbûr dimînin diçin bajaran (di sedsala 19'emîn de ji ber rewşa ku me di serî de qal kiribû cîguherîneke zêde heye) ji neçarî çî kar bi destê wan bikeve wî karî dikin û ew jî karên herî zehmet û bê qîmet in. Ev yek dike ku kurd bi awayekî nebaş bîr naskirin. Lê sebeb tenê ne ev e jî; para serdestên kurdan di vê yekê de mezin e. Cîvakên ku bi xwe bawer bin zû bi zû serî danaynin û li hember zordariyê bi serhildêrî tevdigerin. Beg û axayan bi destê şêx û melayan gelek baweriyên çewt di nava gel de belav dikirin û ev bawerî di mêjiyê mirovan de bi cî dibûn. Ên ku ev bawerî di hiş de bi cî bûbûya êdî serî ranedikir û beg û axayan jî bi hêsayî desthilatiya xwe didomandin. Lê bi naskirina der û dorê re ev bawerî hildiweşin. Û bavê Sehîd wiha dibêje; “tereqê me jî dibêjin: ‘xwendin ji me re gune ye’ nizam çima hemû mîletan re ne gune ye, her me re gune ye?” (J.B.)

Kurdên ku piştî şoreşê dest bi xwendinê dikin xwe û dinyayê tev nas dikin û dixwazin ku ji gelên cîran paş de nemînin dest bi xebateke baş dikin û di demeke kin de digihîjin hevalên xwe. Ev yek jî bi saya xîretkêşên wek Erebe Şemo pêk tê. Yek ji lehengên romana ‘Jiyana Bextewar’ Misto (Erebe Şemo bi xwe ye) wiha dibêje; “Adirbêcana, Tatara, Ûzbêka û mîletêd mayin bi saya partiya komunîsta û diwana sovêtê elîfbayê latînî seva zîmanê xwe çêkirine. Mekteb vekirine, zarêd wan bi zîmanê xwe dixwînin; gazete û kitêva neşir dikin, çima kul me ketiye, em jî nikarin wisa çêkin.....”(J.B.)Gava ku

mirov romana bi navê “Hopo” dixwîne mirov guherîna di nav civakê de bi awayekî berbiçav dibîne. Pergaleke nû ava bûye. Mercên jiyana hêsa bûne. Gundî bi xwe dikin û bi xwe dixwin. Ji xaniyên bin erdê derketine. Teknîka herî pêşketî di hilberînê de dixebitînin. Zarok tev dixwînin. Ji bo zarokên ku hîna naçin dibistanê baxçeyên zarokan hatine avakirin. Her wisa têkiliyên nav malbatê guherîne jin xwedî maf û rayê ne. Lehenga bi navê Zînê mînaka guherîn û pêşveçûna jinê ye. Ew keçeke sêwî ye, xwendiyê bûye endazyara çandiniyê û ji bo pêşveçûna gelê xwe bi dil û can dixebite.

Erebê Şemo jiyana civakî bi kitekit girtiye dest. Ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîn û şahîyan qala her tiştî kiriye. Roj û adetên girîng yek bi yek di berhemên xwe de tomar kiriye. Mirov dibêje qey ku nexwestiye bîr jibîrkirin. Ji mirina Xwedêda wiha qal dike; “Li çelayê, gundê ermeniya, tabût dabûne çêkirinê. Waxtê Xwedêda kirine tabûtê bîst û neh gulî ser jina jêkiribûn, anîn danîne ser tabûta wî. Xort ketne bin tabûtê ber bi gorê çûn.” Yên ku van rêzikan bixwînin wê bizanibin ku “kezîkur, porkur, serê (porê) min meqes û dûzan kirino!” ji bo rewşên çawa tên gotin û çima ev peyv ketine nav zîmanê me. Ji ber ku kurd li welatên cihê dijîn û asta wan a civakî cihê cihê ye mirov dibêje qey niha gelek cudahî ketiye navbera wan. Lê bi qasî ku em ji berhemên Erebe Şemo hîn dibin ne wisa ye. Gava ku mêvanê malekê tê ji bo ku cîran hîn bibin ka mêvanê malê kî ye her yek bi hincetekê diçe wê malê hinek diçin xwê, hinek diçin nan, ên hinekan jî arvanê wan diqede. Vî adetê ku di romana “Hopo” de ji xwe re cî dîtiye hîna jî diji.

Minakeke din jî der barê bertekên li hember guherînê ne; “.... Ez ku niha li cahilan dinihêrim, dibînim cahilînen din in, ne mîna wexta me ne. Kê dikaribû tûriş bikira, wekî bûk li kêleka xesiya xwe rûnên, devên xwe vekin, nan û kevçî bibe gebola xwe û tevî wê nêr bixwe û bê bi ser de jî, pê re xeber bide. Niha êdî eyb hatiye hildanê û kesek ji kesekî şerm nake. Wekî mezinên me ji gorê rabûna û ev yek bidîtana, wê bi dest xwe re ziravqetî bibûna, dîsa têketana gorê.” (Hopo) Ev her du mînak hîna jî bi awayekî xurt dijîn. Ev çend mînak bûn ji berhemên wî. Ji bo fêmkirineke giştî divê roman yeko yeko bîr xwendin. Wek gotina dawîn; **Xwezî û daxwaza Erebe Şemo her ew xwezî û daxwaz e; jiyanêke bextewar. Wek ku mafê her mirov û gelî ye.**

e-mail: xunav2121@hotmail.com

Ji Şivantiyê Ber Bi Zanyariyê Ve

Abdurahman BAQIR

Dîrokek bê pergal û gelekî çanda wî, şîn û şahiyên wî û welatê wî hatiye talankirin. Him jî bi sedan salan e bi vî awayî dijî. Jiyîna rewşenbîr û wêjevanên kurd beriya salên 1600'î niximandî maye. An jî der barê jiyîn û berhemên wan de kesên biyan nivîsandine. Her çiqas der barê wan de kêmagahî hebe jî em baş bi wan serwest nîn in. Sedem jî ew agahî bi hest û hizrên kesên bi çanda kurd nejiyane hatine nivîsandin e. Tê zanîn xweseriyên her çandekê an jî dîrokekê hene. Ev xweserî bes kesên wê çandê û wê dîrokê dijîn dikarin hê zêde fehm bikin. Ji bo vê yekê zana û nivîskarên biyan çi gotine û çi nivîsandine em bêgavî qîma xwe bi wan tînin. Îro şert û merc guherîne. Divê êdî ji îro pê ve kurdek derbarê jiyan û berhemên rewşenbîr û nivîskarê xwe yê dîtir de binivîse. Ev agahî ji pêşerojê re wê bibe çavkanî. Zanîna dîrokê û lêxwedîderketina wê, ji nîfşê dûajoya me re mîsogerî ye û wê rê li ber wan vebike. Aniha em dîrok û serpêhatiyên xwe di pitûkxaneyên welatên biyan de, wek Moskova, London, Qahîre, Tehran, Bexda û nîzanim li kîjan bajarê din dibînin. Yên ku nivîsandine gelo çiqas rastiya me vegotine, ew jî ne diyar e. Der barê Feqiyê Teyran de, Melaye Batê û hemsalê wan de agahiyên sererast û teveka jiyana wan de nîn e. Tenê em bi agahiyên devkî dizanin. Piçekî jî agahiyên zanayên biyanî ragihandine em jê haydar in. Li gorî van agahiyên devkî van kesên navborî gelek berhemên hêja û jiyana wê demê nivîsandine. Lê mixabin teveka wan berheman bi nivîskî negihîştine vê demê.

Her wiha tê zanîn ku her tim nivîsandina dîrokê, berhemên wêjeyî, yên çandî û yên civakî bi destê desthilatdaran hatine nivîsandin. Piraniya van agahdariyan jî hatine berovajîkirin. Yên ku em jê sûd werdigirin û li ser gotinekê dibêjin jî di sa ev

agahiyên berovajîkirî ne. Ew berhemên hanê zêdetir derdikevin pêş. Lewra ev belge û berhem bi destê desthilatdaran jî raya giştî re tînin pêşkêşkirin. Mînakên herî berbiçav di dema ola îslamê de ne. Di heyama berfirehbûna ola îslamê de wêjevan û hunermendên kurd li hember zimanê erebî serî hildane. Paşê nivîskar û wêjekarên kurd îcarê li ser pîrozweriya olê û xwedênasiyê nivîsandine. Jixwe yên ku serhildêr bûn bi awayekî hovane yan dar ve kirine yan jî ew kesana di zîندان de li benda mirina xwe mane. Li aliyê din bi desthilatdariya ereban nijadperestî jî bi pêş ketiye. Ev rastî jî di serdariya Emewî û Ebasiyan de berbiçav e. Nasnavê wan hunermendên kurd an şêx e yan jî mela ye. Ji navê wêjekar û rewşenbîrên wê demê jî tê fehmkirin. Wek Melayê Cizîrî, Melayê Batê, Şêx Îsayê Berzencî, Şêx Hesenê Hekarî û hwd. Wan rêzdarên ji bo zimanê kurdî berhemên hêja afirandine. Ji wan ên ku doza netewa kurd dişopandin kevir li wan dibariyan. Tiştên nemayî dihatin serê wan. Berhemên ku tê de qala doz û çanda kurd an jî farisan hebûya ew jî holê radikirin û nedihîştin ew li ser bîr û baweriyên xwe binivîsin. Tenê dikaribûn destûra pesnê nijada ereb û ola îslamê bidana.

Çima min qala vê dîroka serdema ola îslamê û ereban kir? Sedem ew bû ku Erebe Şemo jî di jiyîna xwe de êş û azarên desthilatdariya Osmaniyan dîtîye û jiyaye. Jiyana ku tê de jiyaye, jê tê fehmkirin ku, her desthilatdarî dixwaze civaka ku bi rêve bibe, li gorî daxwazên xwe bide meşandin.

Bi rastî ên ku di destpêka sedsala bîstan de hatine koçberkirin, ên li ser çanda xwe hûr bûne û ji ya xwe nemane bûn. Ji ber zilma Osmaniyan û koçberiya ji welêt, kurdan ji bêgavî xwe avêtine nav tixûbên Sovyetê. Kurdan çand û kevneşopiyên xwe li welatê Sovyetê jî berdewam kirine. Lehengî û mîrxasiya wan, şeweyê debar û jiyana wan li wir jî domiyaye. Erebe Şemo, ew serpêhatiyên kurdan di van berhemên xwe de xweş destnîşan kiriye.

Di çanda kurdan de şarezayî jixwe berbiçav e. Her çiqas nakokiyên kurdan hebin jî, aliyê wan ê pêşverû jî heye. Yek jê keç û xortên kurd, piştî hevnasîne ji hev hez dikin û dizewicin. Di berhema gorbihuşt Erebe Şemo de jî hevnasîna keç û xortên kurd di ger û geştan de pêk tê. Li wir hevûdin diecibînin. Li wan ger û geştan bi hev re govendê digerin, lîstikên din bi hev re dikin. Li hember vê yekê hin kevneşopiyên ku mafê jiyanê bînpê dikin jî hene. Wek keçek 15, 16 salî dikarin bidin kalekî 70, 80 salî jî.

Karê çandiniyê û sewalxwedikirinê ji mêj ve çanda kurdan e. Karê çolê jin û mêrên kurd bi hev re dikin. Dibe ku ji erdnigariya wan be, an jî ev kar ji xwe re kiribin kevneşopî. Lê kînga rê û derfetên jiyaneke hemdem dîtine xwe lê girtine.

Lê ya herî balkêş mîr û begên kurdan li wir jî xwestine mîrîtiya xwe bidomînin. Domandine jî. Li wir jî îxanetên wek îro pêk hatine. Aliyên mîrîtiyê yên baş jî hene. Wek kesekî belengaz xwe bispêre wan, mîrîti an jî eşîr wan bi her awayî diparêze. Hinek kesan bi niştecihên (Taşnak) wir re li hev kirine û zilm li gelê xwe kirine. Pîraniya kurdên koçber di destpêkê de bi tevgera azadiyê ya Sovyetê re bûn. Ji bo azadiyê û kedê bi pergala nû re tevgeriyane û di avakirina pergala nû de para kurdan berbiçav e. Erebe Şemo di berhemên xwe de li ser jiyana, çand, êş û azarên kurdan xweş hûr bûye û baş vekolaye.

Ji bo vê yekê minaka herî li pêş yek jê nemir Erebe Şemo ye. Wek vî nivîskarê navdar gelek kesên din jî bi vî awayî xwe bi xwe têgihandine û ji civaka xwe re bûne minakên baş. Jiyana Erebe Şemo ya nû, dema di dibistanê de dest bi dergewantiyê dike dest pê dike. Ewîl hînî zimanê rûsî, ermenî û xwendinê dibe. Di destpêka şerê cihanê yê yekem de di riya hesin de karkeriyê dike. Li wir bi bolşevîkan re têkiliyê datine, bolşevîkan nas dike û piştî şoreşê dibe endamê Partiya Komunîst. Di van deman de dê û bavên wî jî ji ber xizaniyê û neçariyê dimirin. Erebe Şemo kesekî jêhatî bû. Piştî şoreşê Şemo di sala 1920'an de li Rûsyayê enstîtuyê dixwîne. Êdî wî dixwest ji gelê xwe û yên bindest re bibe alîkar. Wisan jî kir. Piştî xwendina enstîtuyê vedigere nav gel - Ermenîstanê- û ji bo xwendina ciwanên kurd têdikoşe. Ji ciwanan komekê ji bo xwendinê dişîne Lenîngradê. Ew bi xwe jî di nav wan xebatan de cî digire. Erebe Şemo bi kurdolog Orbelî re amadekariyên alfabeya kurdî dike. Dîsa di nav kurdên Kafkasê de ji bo zimanê kurdî pêşve biçê û qadroyên nû têbigihîne, enstîtuyan û dibistanên partiye ava dike. Erebe Şemo bandoreke xurt li civakê kiriye. Piştî wî, gelek kes li ser zimanê kurdî hûr bûne û di nav gel de hişmendiya ziman û netewegirî belav dibe.

Erebe Şemo ji çapemeniya kurd re jî xebateke hêja

kiriye. Di avakirina Rojnameya Riya Teze de kedeke bêhempa daye û rojnameyê di sala 1930'î de dest bi weşanê kiriye û hê jî weşana wê berdewam e.

Berhemên Erebe Şemo jê çend ev in: Emrê Lenîn, Terîqa Revulûsiya Oktobirê, Kolxoz û Kara Wan ji Gundîyan re ne. Wekî din romanên wî ev in: Şivanê Kurd, Dimdim, Jiyana Bextewar û Hopo ne. Romana wî ya bi navê "Hopo" hatiye weşandin an jî nehatiye weşandin ez pê nizanîm.^(*) Lê ev her sê romanên din hatine weşandin. Ev berhemên wî bi rûsî li Moskovayê, bi tîpên erebî û bi soranî li Bexdayê, bi latînî jî li Stockholmê hatine weşandin. Bêyî van berheman senaryoyeke bi navê "Kurdên Ermenîstanê" û lêkolîneke bi navê "Derwêşên Kurd" jî heye.

Romanên Erebe Şemo ji aliyê wêjeyê ve bi şeweyekî realist hatiye nivîsandin. Zimanekî xwerû û herikbar bi kar aniye. Ji xwe ku mirov jiyana kurdan bişopîne û fehm bike, serdanpê wêjeyî ye. Nemir Erebe Şemo ev rewş baş kifş kiriye û rastiya jiyana kurd jî bi wê xweseriyê nivîsandiye û xweş honaye.

Bi rastî ziman, zimanê gel e. Gel çawa diaxive wisan jî nivîsiye. Mirov dikare bibêje bejeyên ku bi kar anîne ji her herêmê hîlbijartine. Heta ku ji kurmanciya jêrîn jî bêje di berhemên wî de tînin. Wek peyvên "kurmacêd, jinêd, kilamêd" û hwd. Lê devoka Serhedê serkêş e.

Di warê rêzimanê de gelek kêmanî hene. Dibe ku weşanxaneyan ev berhem weşandine şaşî ji wê bin. Di peyvسازیyê de jî ji rêzê derketiye. Wek ku bibêje "herin nêçîrê" gotiye "herne nêçîrê". Di dewsa "kaniyên çiyê" de gotiye "kanine çiyê." Daçek bi kar neanîne. Di sazkirina hevokan de jî çewtî hene. Wek: "Eskerê sor tijî gund bûye." Mebest ev e: "Gund tijî ekserê sor bûye." Di hevokê de jî mebest: "Sertîp zû zûka kincê xwe xwekir." Di vê hevokê de jî mebest: "Sertîp zû zûka kincên xwe li xwe kirin" e. Tevî van kêmanî û şaşiyên piçûk mirov dikare ji gorbihûst Erebe Şemo re ji bo wê têkoşîna wî û ev mirateyên ji me re hiştine em spasîyên xwe jê re pêşkêş dikin û bejna xwe li ber ditewînin..

e-mail: mamoste_medi@hotmail.com

(*) Hopo ji aliyê Weşanên Lîsê ve di Gulana 2007'an de hatiye weşandin. (Editor)

‘Helbest Mar e, Devê Wî Li Ber Dilê Min e’

Gulîzer, helbesteke narîn û dengêkî zîz e. Helbest Gulîzer e, hestên wê bayê zozanan, dilê wê rûyê Nêrgîzê ye. Gulîzer, xwedîya van rêzikên mirovayî, jinîti û kurdewarî ye: “Min bi heft zimanan/ ji heft jinên di tengasiya zayînê de/ Duayan berhev kir/ Ji bo hatina te/ Nizanim xwedê bi kêjan zimanî dizane?... Ma hûn dixwazin bêtir helbestvana kurd Gulîzer xanim binasin? Fermo em bixwînin..

Hevpeyvîn: Fatma SAVCI

Fatma Savci: Gulîzer kê ye?

Gulîzer: Ez di sala 1979’an de li Amedê li gundê Elîparê hatime dinyayê. Min jiyana xwe ya perwerdehiyê li Amedê domand. Piştî ku min lîse qedand dest bi karê ebetiyê (pîrik) kir. Di ber re jî min li Zanîngeha Dicleyê beşa îngilîzî xwend. Piştî zanîngeh qediya ez derbasî karê mamostehiya îngilîzî bûm. Ev 10 sal e ku ez helbestên kurdî dinivîsim. “Keziyên Jinebî” (Avesta 2006) pirtûka min a pêşîn e.

F. Savci: Dema te “Keziyên Jinebî” da destê xwe te çi his kir?

Gulîzer: Dema min berhema xwe girt nav destên xwe ez pir hejyam. Ew gav di jiyana min de kêlikeke pir dijwar bû. Dîmena zayînê hat ber çavên min. Ez bêbiryar mam ku gava dê zaroka xwe digire hemêza xwe, gava zaroka xwe dide ber dilê xwe; digihîje wê an jê vediqete? Di dinyaya ku ew ji her kesî diparast û mezin dikir de bi wê re bû an gava bi destê xwe ew his dikir? Wexta ku min ew girt destê xwe ez tevlihev bûm. Lê bi min re dexisînek jî çêbû. Êdî min fam kiribû ku ez jî ji berhemê re xerîb im û mafên min ên li ser berhemê qasî yên her kesî ne. Wê gavê veqetandinek û gihîştineke bêhempa ye.

F. Savci: Di vê jiyana ku mîna leyistika çavçînkê (veşartok) ye de, wekî jinekê tu li çi digeriya? Çima te helbest hilbijart?

Gulîzer: Bi ya min helbestê ez hilbijartim ne ku min ew. (xêr û guneh ên wê ne...) Ku di destê min de bûya min ê xwe ji nivîsê dûr bixista. Helbest bi dilê xwe tê û dihere. Ew tim mêvaneke bêxeber e. Min tu car li ser maseyekê peyvek nenivîsiye. Ez bi tenê wê mêvanê dihewînim.

Lê ev bext e. Meriv nikare dûrî rihê xwe yan dûrî xwe tevbigerê. Nivîs jiyanekê ku tim zehmetiyê dide ber meriv e. Ez ji tîrsa vê zehmetiyê pirî caran li nivîsên xwe xwedî derneketime û min nenivîsandiye. Li gorî min, ev ne biryarek û ne bi tena serê xwe sedemek e jî. Rêyên ku meriv di jiyana xwe de dimeşe; meriv dike tiştekî/e ku haya meriv jê çênabe. Heta çend salên dawîn jî, bêtî ku haya kesî jê hebe min tenê ji deftera xwe re dinivîsand, ji xwe re. Ez ji helbestan bêhay bûm. Lê, ez ji berê ve berketiyê peyvan bûm. Di her bêçaretîya xwe de û di her kuçeyêke teng a jiyana xwe de, min xwe di hemêza helbestê de didît. Ez di jiyana rojane de jî, bi peyvan pir bawer im. Xwe pir davêjim bextê peyvan. Ez dibêjim qey, ev taybetmendiyêke merivên rojhilat e. Ji ber ku hîn peyv li Rojhilata Navîn pîroz in, hîna naverok an rihê peyvê tije ye. Ev jî bo nivîsê pir girîng e. Ji ber ku peyv; di jiyana pênuşê de birih nebe, nabe nivîs.

Di karê helbestê de tesîra hestedarbûyînê jî pir heye. Dilê zîz du pencereyên cuda li ber meriv vedikin.

Bi ya min, tiştên di ser dilê min re diçin an zêde tên,

ji çavên min re dibin hubir û dinuqitin ser kaxiz.

F. Savci: *Li gor te, ew qas zimanên helbestê hene ku bikaribe bi hemû zimanê birîn, xeyal, dewlemendî û kaosa dinyaya jinê vebêje? Ango têr dike?*

Gulîzer: Dinyaya xeyalan an hestan behreke bêbinî ye, û ji xwe peyv encax dikarin bibin siya wan an tiştêkî wek wan. Peyvên heyî jî, merivan pir neçar dihêlin ku ji bo bibin zimanê hestan.

Lê ziman tiştêkî aîdê jinê ye. Jin dikarin ziman zêdetir bêsînor bi kar bînin. Belkî jî ev tekiliyeke taybet e, di nav jin û ziman de. Çimkî, jin zêdetir bi pey hestan dikevin û ji bo hestan bînin ziman îcar zêdetir bi pey peyvyan dikevin.

Helbest şêwazeke cuda ye, di nav edebiyatê de. Hest bi şêwazên xwe, xwe didin der. Tiştên ku helbest têra wan neke, jixwe ew bi formeke din xwe diafirînin. Ji ber wê, helbest têra mijarên ku para wê dikevin dike.



F. Savci: *Hêmayên helbestên te, kitekita giyan, dil û heta bedena jinê gelek xweş tîne ziman, gelo rista pîşeya (hemşîretî) te di vê yekê de heye?*

Gulîzer: Ez bawer im gelek tesîr hene. Lê wê dema ku ez di nexweşxaneyê de xebitîm (7 sal) di jiyana min de xwedî taybetmendiyeke mezin e. Wê demê xwe di nivîsên min de da der. Ew dinya bixwe dinya jinê bû. Ez li wir bi şikeftên rihê jinê hesiyam (wek ku hezar şikeft bi hev ve girêdayî bin, lê her yek bi serê xwe be).

Di ber êşa zayinê de nifirên ku dikirin, ji tirsê hewiyekê ji bo Xwedê kurek bide wan diayên ku dikirin, naleta ku li jiyana dianîn, peyvên wan tev de di kerika guhê min de ne. Wekî din jî, keçên ku bêzewac zarokên tecawizê dianîn û piştî hefteyekê em bi xeberên kuştina wan dihesiyan, keçên ku bi civata mêran re dihatin kontrola keçbûnê û dîsa xeberên kuştinê....

Ev çîrok tev de êşên jinên vî welatî bûn ku hîna civatê vî birînê kûrtir dikole. Di nav vî xirecirê de pênuşa min nikaribû xwe dûrî wan mijaran bida... Helbet ev çîrok ji pênuşa min re bûn hubir. Belkî jî ez ê hew qala wan mijaran bikim, nizanîm. Ez wê demê rastî gelek çîrok, dîmen, birîn, nexweşî û gelek tiştên aîdê jinê hatim. Min bê haya xwe peyv û çîrokên wan berhev kirin. Ez dikarim bibêjim min her halê pîrekiyê an her halê pîrekên vî welatî dît. Ev bû êşeke mezin an deqeke mezin di jiyana min de. Helbet di helbesta min de tesîra wan çîrokan pir e.

F. Savci: *Tu helbest û nivîsan didomînin ne? Dosyayên te yê li ber çapê hene gelo?*

Gulîzer: Nivîs parçeyekî mezin e jiyana min e. Ez bawer dikim ku wê bidome. Dosyayeke nû li ber destê min heye, her roj tiştên nû, ji nêrînên nû diwêlîdin û lê zêde dibin. Ev rê li ku dest pê kir û wê li ku biqede, ez nizanîm. Lê ez hêvîdar im ku wê helbest her û her di jiyana min de hebe.

Helbest wek marekî ye û devê wî tim li ber dilê min e. Jahra ji dilê min diherike vedixwe û xwe pê xwedî dike. Lê meriv çiqas ji mar ditirse, ez jî bi wê tirsê van hestan dihevinim.

e-mail: fsavci@hotmail.com

Mêrikê Lal

Sherwood ANDERSON

Çîrokek heye -ez nikarim vebêjim- gotinên min tune ne. Çîrokeke ku hema hema mirov ji bîr dike û carcaran tê bîra mirov.

Çîrok der barê sê zilamên ku li kolanekê di malekê de ne ye. Heger gotin ji devê min derên ez ê bikaribim çîrokê vebêjim. Ez ê di guhê jinikan de, yê dayikan de bikim pistepist. Ez ê bi kolanê de bazdim û bibêjim û bibilînim. Zimanê min ê dirêj bibe -ew ê di paş diranên min de bibe mîna xişîşkê.

Her sê zilam di odeyekê de ne li malê. Yek ji wan ciwan e û tewtewk e. Her dem bi hîkehîk e.

Yê duyem ji riha wî spî û dirêj e. Ew bi metirsîyan tîk çûbû, lê belê carna metirsîyên wî jê bi dûr diketin û ew bi xew ve diçû.

Yê sêyem ji yekî çavên wî yên xerabiyê bûn û di odeyê de bi awayekî hêrsokî bû û hema destên xwe di hev dida. Her sê mêrik disekinîn û disekinîn.

Li qata jorîn jinikekê di reştariyê de li ber pencereyê pişta xwe dabû dîwêr û li piya sekinî bû.

Ew bingeha çîroka min e û her tiştê ku ez ê qal bikim û her tiştê vê çîrokê ji wê biparzûnînim.

Tê bîra min ku mêrikê çaremîn ji hate malê, yekî bozik î bédeng bû. Her tişt mîna bédengiya deryayê ya şevê bû. Lingên wî li ser zemîna kevirîn ya ku her sê zilam lê deng dervedixistin bû.

Mêrikê ku çavên wî yên xerabiyê bûn, mîna ku şilemeniyek dikeland - û paş de reviya mîna ajaleke qefeskirî.

Mêrikê çaremîn - yê bozik- hilkişiya jor cem jinikê.

Ciyê ku jinik lê sekinîbû.

Mal çawa bédeng bû -çawa dengê tîk tîka saetên dîwêr ên cîranan dihat. Jinika li jor ji bo evînê can dida. Divê ew çîrok bûya. Bi hemû bedena xwe birçiya evînê bû. Xwest ku evînekê biafirîne. Gava mêrikê bozik î bédeng kete hundir ew pêş de piloz bû. Lêvên wê ji ser hev çûn. Kenek li ser lêvên wê bû.

Yê bozik tu tişt negot. Di çavên wî de tu azirandin, tu pirs tune bûn. Çavên wî mîna stêrkan ne takekesî bûn.

Li jêr yê ku çavxerab bû qîriya û paş de reviya û mîna kûçikekî wînda yê birçî bazda. Yê cûnik hewl da ku wî bişopîne lê belê zû westiya û li ser zemîna odeyê xwe ramedand da ku razê. Êdî ew ji xew şiyar nebû.

Mêrikê tewtewkî ji xwe li ser zemîna odeyê dirêj kir. Ew bi simbêlê xwe yê reş î kinik lîst.

Tu gotinên min nîn in ku ez bibêjim ka çi di çîroka min de qewimiye. Ez nikarim çîrokê vebêjim.

Yê bozik î bédeng dibe ku Mirin be.

Jinika bixwestek ku sekinîbû dibe ku Jiyan be.


Yê kal î rihspî û yê çavxerab ez behîandim. Ez her lê difikirim û difikirim lê belê di wan nagihîjim. Gelek caran her çawa be li wan nafikirim. Ez li yê tewtewkî difikirim ew ê ku her di hemû çîroka min de her dikir hîkehîk.

Heger min ji wî fêhm bikira min ê bikaribûya ji her tiştî fêhm bikira. Ez ê bikaribûma li dinyayê bigeriyama û çîrokeke newaze vegota. Ez ê zêde kerr nemama.

Çima min nikaribû gotinek bikira? Çima ez lal bûm?

Çîrokeke min a newaze heye, lê belê dizanim ku nikarim wê vebêjim.

(Wergera Ji Îngilîzî: Sîdar JÎR)



Pisîkên Adarê

Şêxmûs SEFFER

Ya delalê
Em benda hezkirinên pisîkên meha adarê ne
Em zarokên pozbîlîçik in û bi zendê xwe paqij dîkin hemû rabirdûyên xwe

Em çî ne û ne çî ne lê!!!

Em ne Çîn in û Maçîn in
Em ne Amed in
Wek Ehmed Huseynî
Ne jî Huseynîyê Ehmed in

Em xezaleke jibîrbûyî ne di nav daristaneke heybetî de
Em zarokekî xeyalî ne ku heyvên xwe difirotin etara bo şekirên qulqulî

Em ewrên li hev sarhatî ne li beriya qijqijî
Em ne Serhedî ne
Ne jî Eyûbiyê Selahedîn

Bi her lihevşabûneke zarokî
Gujguja baranê ye ji bedena me
Bedena Amedê bi helkhelek e
Qudus û Meke di bin lehiyê de dimîne bi şûrê kurdekî

Em çî ne û ne çî ne lê!!!

Derziyeke lihêfa têra hemû birînên me dike
Li zozanekî konek bê derî
Ji me re têra xwe dikare ji kêfa bigirî
Tenê gava tu derî vekî
Bi hêdî...

Agos

Kurmikek im

di hembêza axê de min çavên xwe vekir
diya min ax, şîrê min ax, pêçeka min ax,
kurmikek im ji betnê axê, xwarina min ax
ax axê ax, bi ku de biçim, li te vedigerim!

Agos⁽¹⁾

li beyarên Hezaza Rûtan⁽²⁾
li kendalên Keleha Zêrzewanê,⁽³⁾ li van derdoran
kulîlkek vedibe bi xecê re
bi lîlozê re, bi binefşê re
kulîlkek vedibe kulîlkek:
ta ta kirîv
bejn bejn nîsan!

“her geya li ser koka xwe” heyran
bi bîna xwe her kulîlk, her gul bi rengê xwe
ku vebin li bexçeyê dil, li milkê dil
û her stran ji devê endeliyekî, bi awaza xwe...

dîrok feqîrokek weqa-nûs e li vê keviyê
zêr dikire, şûr dibire, xame dinivîse:
nîsan qefle qefle, rê pêxwas
lêmişt qewmek bû li ber pêlên lehiyê!

ji kîjan pêlê tu filitî Etyen?⁽⁴⁾
tu Margosyan,⁽⁵⁾ Hrant tu
ji Mihela Gawiran î⁽⁶⁾ tu, an ji Qeraxa Golê?⁽⁷⁾
'bilêta Migirdîç birîn ber bi Stenbolê'
li Madenê pirsîn ji ya j'qirê filitî:
'Bêje Margos⁽⁸⁾, tu ji ku bû?'

ez ji ku bûm Hrant, tu ji ku bû?
Gerapêt⁽⁹⁾ ji ku bû, Dikran⁽¹⁰⁾ ji ku bû?
kalê min cîranê kalê te bû, ez kirîvê te
ne ji wir im li dû te, ez jî ne ji vir im.
li welatekî digirim, Jaklînê⁽¹¹⁾:
her kîşwer bihar, her heyv nîsan.
bi qasî min bêriya Usivê File dike, taxeke Nisêbînê!

Assam angos Oxir

di kefika koçanîkan de kuçek im
qîrînek tundrew im, dij dijber
li Şerîa Rojava, li sikakên Qoser
dil mindal, helbest narincok
mirinek kezîzer im, li dû zarokan!

Arjen ARÎ

Têbînî: _____

- ⁽¹⁾ Agos: Rojnameya ku bi ermenkî û tirkî li Stenbolê diweşe
- ⁽²⁾ Hezaza Rûtan: Li herêma Têrkan navê bireke dêrîn (kuffarî)
- ⁽³⁾ Keleha Zêzewan: Li jora Xanika Jêrîn keleheke dîrokî
- ⁽⁴⁾ Etyen: Etyen Mahcûpyan: Rojnameger, Nivîskar, Roşenbîrê Ermen
- ⁽⁵⁾ Margosyan: Migirdiç Margosyan : Çîroknûsê Ermen
- ⁽⁶⁾ Hrant: Hrant Dînk: Roşenbîrê Ermen, Sernûser û Gerînendeyê Giştî yê Rojnameya Agosê.
- ⁽⁷⁾ Gerapêt: Gerapêtê Xaço
- ⁽⁸⁾ Dîkran: Aramê Dîkran
- ⁽⁹⁾ Mihella Gawiran: Taxeke Bajarê Amedê
- ⁽¹⁰⁾ Bêje Margos tu ji ku yî: Navê berhema M. Margosyan
- ⁽¹¹⁾ Jaklîn: Jaklîn Çelik: Çîroknûsa Ermen

Muslum ASLAN

Sirgûna Çava

Çavê te
Dawiya xerîta xeyalê cîhanê
Destpênekirî ya jiyana min

Mirina spî tevî kenê jînê
Agirê ava bê guneh
Sirgûnbûna çava di geremola êşê de
Hilma hebûnê ye seranser esîr digre

Di “erê”, “na” yê de mame
Ewrê rengê mirêkeba bersiva li ser aqlê min
Barana kêfxweşiya gulanê
Nameyek şêrîn datîne ber pencere
Dest ji ber xwe vedibe
Çenga sirgûna çava
Tune dike
Dikuje

Talana bê siwar
Şûr li min vedigere
Şev pêşenîka xwe li ser tehtê kezebşewîti dinixumîne
Roj e eniya demê qelişi tîrik ji min re xelat
Ristek dilive bi lez û serxweş e
Ling tazî
Dil tazî, kolan, bajar li piştê bar
Zarokek beleban
Efsûna xewa qirna rûspî me
Radizem vediciniqim bi dengê te
Ji sirgûna çava

Rûheyv

Veqetîn...

Veqetîn...
Dema ku tu hatî
te veqetîn anî bi çavên xwe
dibe ku di pirtûka te de
tenê veqetîn hebû...
dema ku me hev nas kir
roj hebû
binevş û rûbar hebûn
lê veqetîn jî hebû...
Xewnerêşkeke dirêj em ji hev veqetandin
Û dûrî kete navbera me
tu li wê peravê mayî
ez li vê peravê...
Çima di çavên te de dûrî hebûn çima
Û çima terka hev kirin
rêyên me
çivîkên me?

Ku mij û morana bêbext
bigire ser mêrg û zozanên te
Û ziwa bibe kaniya dilê te
Û bimirin bilbilên te...
Xem neke!
Ez ê bibim Kurdistan ji te re...
Ku xewnên te birevin
şevên te dîn bibin
di nava agir de
ku bayek gur
perçeyên te li ba bike
û tu bê xwe jî bimînî
Xem neke
Ez ê bibim Kurdistan ji te re
Ku tu lal bûyî
di terk-kirina hemû gotin û pirtûkan de
Ku tu xeyîdî ji hemû dîrokan
Û mirî-mirî bi welatan re
Xem neke
Ez ê bibim Kurdistan ji te re
Ku dem bibe gêjgerînek li hember te
tu biçî biçî
lê bibî bizmarek li çarmixan
ku tu bibî havînek bê av
li çolên tenêtiyê
û bê ax bimînî li axistanê jî

Xem neke tu car
Ez Kurdistan im ji te re...
Ku tu bê sebir li xwe geriyayî
di nava miriyan de
di nava hemû saxan de
lê ku te xwe nedît
û ku tu di kolanên
hemû bajaran de
bûyî siyek revok jî
Xem neke
Ez ji te re
Kurdistan im...
Naçim û namirim
li tu demê... heps nabim
di tu gotin û sînoran de...
Ez Kurdistan im ji te re
Kurdistan...

Qey çî dibe
bila heyverona te
wenda nebe
di vê şeva qedîm de
bila pepûk nexwîne
û sar û kor nemîne van deran
qey çî dibe?

Ez karwanek im
tim ji xwe koç dikim
Çîrokek im ku tenê
bela serê xwe ye
Guleyek im
ku tim xwe dikuje
Stranek im
ku bê xwe tê gotin
Û koçberiyek im
ku ji xwe direve
Û ji xwe re dibe dûrî...
Dibe ku ez
pirtûkek qedexê me jî
qedexê û li ser avê nivîsandî
heywax û heywax!
Ez kî me
û li ku me?

Gernas RODERÎN

Hin Rêzikên Evîniyê

Zêrevanê Abadîniyê
Dil dikim şevêkê li ber çavên te zêrevan bim
Heta destê sibê bê dorveger
Heke xafil bibim û razam
Tika û lava dikim ji te
Bila cezayê min
Zêrevaniya çavên te be
Bê xew û bê vehesîn
Heta abadîniyê.

Evînen me
Di dergûşa jiyanê de zarokek digirî
Lê tu kes tune zarokê bihejîn û bide mijîn
Birçî û sêwî dimîne zarok
Wek evînen me!

Zeytûnên reş
Min rojekê tiştin xweş xwaribû
Nizanim çi bû!
Sal bihurîn û min çavên şikûdar dîtîn
Hingê têgihîştim ku
Ji çavên te
Du lib zeytûnên reş bûn ew tişt.

Ken û nekenîna te
Kenê te nêrgizan dibişxivîne
Li ser latên çiyayê min
Baranan dibarîne
Li ser beyarê min
Dibe mizgînek jiyanî
Ji penceşêra laşê min re

Lê heke tu nekenî
Wê nêrgiz biçilmisin
Ax bifetise
Ez ê jî bimirim...!

Guldesteyek Ji Helbestên Fedwa Gêlanî

Fedwa GÊLANÎ

Derew

Tu derewek î
Çîroka evîneke ku min afirandî
Bi nîv hişê xwe
Û bi nîvê din min bawer kir
Tu û derew
Hûn giyyayê kesk
Di malzaroka biharê de dişewitînin
Û rastiye dikin xewneke serjêkirî

Dema ku şînî pêrgî hev dibin
Dilê min têk diçe
Tazî dibim
Ez xwe ji xwe dikim
Ji gavên xwe derdikevim
Bi hezarê (dûrahiyan)
Ez bi dûrahiyê avis dibim
Bi leylanê
Bi ronahiyê
Biyanî êrîşî min dike
Min perçe dike
Dadikevim
Mêxaneyên tunetiyê
Ez li ser şikestinên temenê xwe
Dişemitim
Seqayên tunebûnê pêk tînim
Ez di pexçiyên şeytan de
Wer dibim
Li ser werîsê agir xwe helal dikim
Da ku ji evîna te rizgar bibim
Û rûyê Xwedayê min eşkere dibe
Xweda ez giliyê xwe
Kul û melûliya xwe
ji te re dikim
melûlî û bê çaretîya xwe
ji te re dikim
Xwedayê min

Dizanim Tu Yê Vegerî

Dizanim tu yê vegerî
Tu yê xwe li ber kaniya min bişo
Tu yê bi ser çolistana min de bibarî
Rojê wiha ji min re got
Û tu yê bi ser kenarê çemê min de bibarî
Tu yê pîrozahiyên yekîtiyê pêk bînî
Li ser nexşeya siya min a ji hawhawketî
Bi hezarên helbestan
Kirinên te yên delal
Tu yê min qeyd bikî
Bi xelekên hevirmêşî
Tu yê bêdengiya min helal bikî
Tu yê tayên min bineqîşînî
Bi rengê dilbijokiya şîlanê
Di bilindahiya ezmanê te de
ez werdan dikişînim

Sibehên berbangê hest dikim
Ez ê maçekê ji bavikên gulan re biçînim
Ez ê te bi şewatê li ser tabloya xwe ya her demî
Bineqîşînim

Ez ê li ser dîwarên te yên mermer
werdan bikişînim
wekî refê qumriyan
û keriyê xezalan
ez ê dengê te himbêz bikim
ez ê ji kevokên bêdengiya xwe
rizgar bibim
û ji hilatina te
ez ê şîlanê himbêz bikim
êşa te min mest dike
û bi hezarên helbestan
hildigirin rêwîtiyên xwe

Ez Dê Bi Milyonên Behaneyan Ji Bo Dûrîtiya Te Biafirînim

Ez dê bi milyonên behaneyan ji bo dûrîtiya te biafirînim
Û ez dê di gotinên ku evîna min şîrove dikin de raman bibim
Û ez ê wan şevên xaçkirî
Bi agir û ewr
Di singa xwe de
Vegerînim

Dema ku goşiyên tavê
Bi paceya te ve daleqandîbûn
Rûyê bayê winda dikir
Û siya te bi mijangên xewna min ve dadleqandin
Bi ser rê de dibariya
Û ez mîna zuxurekî qûmê bûm di nava keçên bayê de
Ku di çavên te de dibû mîna Xwedaneke Mecûsî
Rûyê te yê di delaliyê de fetisî
Rohnî da stêrkên min
Bêrîkirina payîzê ji min dûr kir
perperîkên min serbest kirin
Ez kirim mîna perîkekî
Di hilatina bayê de
Ez bi keskesorê rengîn kirim
Ez ji hemû çekan kirim
Bişîşandina te ya li ser dîwarê min daleqandî
Bûn wekî bilûr û sirûdên peykerparêziyê
Xaçkirin û nimêj
Bêrîkirin min bi ser laqirdiyên bi te re dajo
Ew laqirdiyên bi fedî
Yên bi xwêdana xweşiya min û te
Hevîrkirî
Û ez serê xwe ji te dihejînim
Hêdî hêdî di bin çewtiyê de
Û tu bi ser laşê min de dibarî
Berdên we selamen (sarbûn û aştî)

Nexwezî Bi Dilê Te... Va Ye Hat

Xwîneke digirî
Kî dikare ziwa bike
Xwîneke şermiyê ye
Kî dikare rehmê li şerma wê bike
Bê awaz
Bê war
Ji tunekirinê natirse
Bi êşa jiyanê ketiye
Dê bibe siyek
Bibe pîrevoka şeva te
Lê çi şevê e

Nexwezî bi dilê te
Vaye tê
Heke sibe şevreş be
Dê berbanga me were
Tevî ku
Hêviyên me dardakirî ne
Dê berbanga sor jî were
Em zarokê agir in
Heke çemên me çikiyan jî
Dilê me bi sirûdên zerdeştî
zemîna bi xêr û bêr e

Dê kew bizên
dê xeberê belav bikin
û nêrgizan li ser zemînê belav bike

ey nêrgizên başûr

baskên min rengîn dibin
êzingên min ê birçî têr dîkin
hey ezmanê sirûdên pîroz
bila dengê me bilind bibe

ez birîneke vekirî me
çi birîneke kûr e
li kêlekên xwe li xwîna xwe digere
xwîna ku pijiqî
firiya
bi rê ket
bû kevokek
di birînên welatê nêrgizan de
yê têrkirî bi bîna tavê
û vaye
li beramberê qelebalixekê
daxuyanî dide

xwe ji hatiyan re dihejîne

(Ji Erebî Wergerandin: Rizoyê XERZÎ)

Sîpan XIZAN

Dilnaz

Her bilbil xemgîn ez im
Bo gula xwe xemgîn ez im
Dixwînim ez de û rojan
Gulîstanan nalîn ez im
 Ji bo gulê dilnaz ez im
 Evîna xwe daxwaz ez im
 Şev û rojan dinalim
 Ji bo wî evîndar ez im
Dilê xemgîn carek rabe
Jara gulê temaşa be
Ew î derxe ji zindanê
Bi azadî bi wî şabe
 Li seheran bilbil ez im
 Bi xwendin ax û zar ez im
 Evîndarim ji bo gulê
 Bi evînî bizan ez im
Li gulistan navdar ez im
Ji bo gulê xemdar ez im
Bi sed sond û sed bawerî
Ji bo wî fedakar ez im
 Ji bo gulê heyran ez im
 Talî bo wî mêvan ez im
 Gulîstanan her dibêjim
 Seyran bibit digel ez im
Demjimaran hişyar ez im
Bi dilîn û dildar ez im
Li seheran her dixwînim
Bo gulê bendewar ez im
 Dilo bizan bilbil ez im
 Bendewarê gulê ez im
 Li seheran bi nalîn im
 Ji bo wî girîftar ez im
Xeyala wî jiyan ez im
Bi axîn û gîryan ez im
Gul derkeve bendexanê
Demokrasi bawer ez im
 Li zozanan şivan ez im
 Digel wî bilûrvan ez im
 Bêrivan wan e dîlanê
 Bo wan ser şûşanî ez im
Xwedan xaka kesk her ezim
Xwediyê gula sor jî ez im
Dilê gulam her zela e
Zer li navê sîpan ez im.

28-02-2006

Ustadek û Berhemek: **Osman Esad Efendî û** **Mewlidê Ciyo Dimilî**

Prz. Mehmed Guzeler

Osman Esad Efendî serra 1852 di Sêwreg di amoyîna dinya. Lajê Hecî Eyyûb Efendî yo. Hecî Eyyûb Efendî Muftiyê Sêwregî bîyo. Osman Esad Efendî Babî o. Na eşîrî hewna Sêwreg di esta û aşîra gird a. Na eşîrî bi ziwandê Dimilî ya (Zazakî) qisey kena. Na eşîrî ra bol alîmî resayê.

Osman Esad Efendî badê tehsîldê xwî yê siftekênî (verênî), Muftîdê Sêwregî Zulfîqar Zuhtî Efendî het di wendo. Serra 1882 di îcazet giroto. Osmanî, Erebbî, Kirdasî û Dimilî zanaynê.

Destpêkerdeya memûretîya ey serra 1884 di bî. Û Sêwreg di Azayê Mahkemaya Bîdayetî bî. Serra 1905 di badê mergdê Muftiyê Sêwregî Zulfîqar Zuhtî Efendî di, Sêwreg di bîyo miftî. Serra 1929 di merdo, 25 serrî miftîyêyi kerda.

Serra 1917 di cirê rutbeyê mexracî diyayo ki, o rutbe îlim di rutbeyêdo gird û biqîmet bi.

Çirê ki bi sarixada kiho ya millet mîiyandi geyrayo Osman Esad Efendî rê Yeşîlbaş Osman Efendî vajîyayo. Ê wenden ra bol hez kerdo û bi wenden da xwî ya kar kerdo. Wezîfeyê xo bêkemaney ardo herûn. Labelê qandê ney zî millet cirê bol îtimat kerdo ew cira bol hez kerdo.

Osman Esad Efendî serra 1901 di Menga Remezanî di yew mewlîd nuşt. Mewlidê ci ziwandê dimilî yo. Alfabe ya ci jî erebbî ya. Vanê ki Hecî Üsîb Efendî bi Ziwandê Tirkî ya mewlidêk nuşt, mewlidê cira mileta Sêwregî bol hes kerdo. Ney sera Osman Esad Efendî menga rojeyî di heftêyêk teber nêvejîyayo. Nê heftî miyan di mewlidê dimilî nuşt. Ey vato ki : “Marîfet, çîyo ki çînê bo kes ey virazo, o çîyo ki her kes zano, kerdîşê ey marîfet niyo”. Osman Esad Efendî çaxo ki no mewlîd nuşt, mewlidê xwî neşr nêkerdo.

Heta ew ro destnuştêyê nê mewlidî, Sêwreg di wanîyeno. Bi wasitayê dê Mila Nezîrî Sêwregî jî serra 1933 di Şam di bi terefê Mîr Celaded Bedirxan bi name dê Bîyîşa Pêxemberî,

kitabxanayê Hawarî di neşr bîyo.

Mewlidî Osman Es'ad Efendî, bi ziwandê dimilî di kitabo siftekên (verên) o. Verdê ney bi Ziwandê Dimilî ya kitabêk nênuşîyayo, Qandê ci jî no mewlidê Osman Es'ad Efendî bol kiymetlî yo.

Osman Esad Efendî mewlidê xwî bi dimilîyê Sêwregî û fekdê eşîrda xwî ya nuşt ew ziwandê mewlidê ci jî bol pak o.

Tarîxzano Kirdas Mehmed Emîn Zekî Beg kitabê ciyo Meşhûrê Kurd û Kurdistan di qalê Osman Esad Efendî û mewlidê ci kerdo ew mewlidê Osman Esad Efendî bol bol metih kerdo.

Mewlidê Osman Esad Efendî nezdî ra Diyarbekir di Enstîtuyê Kurdî di do bi alfabe ya Latînî û Erebbî ya bivejîyo.

Mewlidê Osman Esad Efendî ra **Çend Beyîtî:**

Bi namey wahîrê no ard û azmênî
Kî ma dest kerdo no girwe do rengîn

Şima hemdê xwî Allay rê biyarîn
Şew û roj qapîdê ey di binalîn

Pêxemberî rê selawatî biwanîn
Tim û tim derdê cey verdi biqarîn

.....
Goşê xwî sernê cema'at Rebbêma
Kerdo xizna xwî miyan di eşkera

Kaf û nûnê ardo bi hed emrê kerd
Bî bî îcad ard û azmên germ û serd

Nûrdê xo ra ey girot nûrê nebî
Ey nûrî ra xelq kero Mûhemmedî

.....
Hem viraştî no kitabê xasekî
Lajê miftî dê kean dê Suregî

Yanî Osman Es'ad Efendî qijî
Lajê Hec Eyyub Efendî Babîjî

Eyyub lajê pîr û pîrbabê verî
Ef kerê û şad kerê ti ey Rebbî

O ki yazî kerdo no mewlidê ma
Cennetê ednî miyandi bi di ca

Kam ki adirî ra xelas xwî rê waşt
Wa resûlî rê biwanin es - salat

e-mail: avguzeler@hotmail.com